# Fêrbûna Xwendina Kurdî

PARIS
1968

KC 1013

Şev û rojan bixwînin, bibin serbest û zana ,
Tovê jînê biçînin ,ji bo dîl û nezana .
Cegerxwîn

## Pêşgotin

Eve nivîsarek bi zmanê me yê şîrîn .

Bêguman hon kurd hemî xweşî , spehîtî , çelengî , dewlemendî û mezinahiya zmanê xwe dizanin .

Lê , sernivişt ango qederê me rê ne daye ko piraniya me , mîna neteweyên dinyayê yên din hînî xwendin û nivîsandina zmanê xwe bibin .

Heye ko ev nivîsar , di vê babetê de , dê arîkariya we bike .

Hînî rastxwendin û rastnivîsandina zmanê xwe bibin û ji nexwendiyan re wî bidin zanîn .

Bêguman, dilê we diçewite û hon ji xwe re dibêjin : Zmanê min , tu çiqas li ber dilê min şîrîn î .

K.A.Bedir-Khan

B.X. Nivîsara diwemîn piştî du mehan dê bigehe destê we.

I. d a d a d a d a da da dada da da dada dada dada dada da da dada
dada dada da da da da dada dada dada

2. d a d e d a d a d a d e da da dada da de dade dade dade
dade dade dada d a d a d a d e d a d a da da da de dade

3. d a n e d a n e n a n e da ne dane na ne nane dane dane
nane nane dada ne da na de dade dade dada ne da da de
d a n e n a n e da ne dane na ne nane dane dane nane nane

4. n o n a d e no na de no na de no na de no na de na de na de
dade nane dade ne da ne ne da nane dada nane dada neda dane n o n a d e
no na de no na de no na de no ne da

5. d i d e n a d e di de dide na de na de dide dide na de na de
ne da dada na de nane no ne na ne no ne na ne no ne nane dane
nane na deo dide dane dide neda ne da no na de d i d e n a d e di de
dide na de na de dide dide nade na de nade

6. d a j o d i d e da jo dajo dide dajo dajo dide dide no na de
no nade ne da dide nade no ne na ne no ne nane no na de da de
dajo d a j o d i d e da jo dajo di de dide dajo dajo dide 1 1 1

7. n a b e d i b e na be di be na be na be d i b e dibe na be na be
dibe dibe dade dade dade ne da dide nade dide dajo na ne
no ne nane no nade bibe nabe no ne da no nabe bajo dibe bibe 1 1 2 2

8. d i n a l e di na le dinale di na le dinale nabe dinale dibe
dide dajo nade dada lo nade bila mebe dibe dane dide lo dajo na ne
no ne nane no nade dide dibe d i n a l e di na le dinale di na le
dinale dinale dinale dinale I I 2 2 3 3 4 4

9. li te da li te da li te da te da te ne da dada dide dibe dajo di
na le dinale dinale dajo lo lo lolo dide nabe dinale no ne nane
najo bajo dajo dida ne dida nede bide nabe ne nane ne na ne
ne na ne ne nan e nan e nan nabe bide dada dade nan e
no nade neda dide nade dajo nabe dibe di na le lolo e lo elo
elo nabe lolo e lo lolo elo bide lolo elo bide li te ne da li te
dide li te ne da li te da li te da li te ne da 1 1 2 2 3 3 4 4 5 5

10. b a r a n e ba ra ne barane barane ne ba ra ne rabe dade ma l a te
be re bere ber e nabe lolo bajo ne na ne ne nane ne na ne ne nan e
ne nane nan e nan ba ra ne baran e baran nane nan e nan di na le
dajo bajo ba te te ne da te da ne da te nane nan e nan e nan barane
baran e baran b a r a n e ba ra ne baran e baran nan baran nan baran
1 1 2 2 3 3 4 4 5 5 6 6 7 7

11. m a m e r a b e mame ra be ma me ra be mame rabe rabe mamo dane
date me da te da da te dada dane da te te da dide no nade
ne da nane nan e nan e nan mame mam e mam barane baran e baran e baran
mam e mam e mam e mam mame dane dide rabe dane no ne da dide nade
li te da li me da li te ne da lolo bajo bi te bibe bi te re bi mi re
nane nan e baran e baran e mame mam e mamo li me dide li te na de ra be
bajo deda min e min e deda min min min da te da me da min ne da mamo
m a m o r a b e ma mo ra be mamo rabe mamo rabe baran e baran e mamo
baran e baran e baran e min nan e nan e 1 1 2 2 3 3 4 4 5 5 6 6 7 7

12. m a l a t e a v a ma la te a va ma la te a va ma la te ava mala te ava
ma la te ma la me a va ava mala me mala te dada dide dane nade bide
nabe dibe dajo bajo dinale dide nale nane nan e barane baran e mame
mam e mine min e mala te ava mamo li me da m a l a t e a v a mamo da te
ne da te da me mamo da te mala te ava 1 1 2 2 3 3 4 4 5 5 6 6 7 7 8 8

13. y a m e  y e  y a  m e  y e ya me ye  ya te ye  ne ya me ye  ne ya te ye li ba te ye  li ba me ye  ba me  nabe  ba te  dibe  mala te ava mala te mala te ne ava ye  ya mine  ya min e ya mine  mala te ye  ya te ye ya mine ya min e  ya min e dada  dide  bide da ne  ne da ne  dajo  dinale dibare mebe ya me ye  y a m e y e  ya me ye  ya me ye  mala te ye  ya te ye mala me ye  ya me ye 1 1  2 2  3 3  4 4  5 5  6 6  7 7  8 8  9 9  10 10

14. b a v ê  m e t ê  b a v ê  m e t ê bavê me tê  bavê me tê  bavê te tê mêr e  nêr e  ba tê  ba radibe  manê me  tê  dê tê  mamo  nayê  dadê tê ya min e  ya min e  min e  min min  da  te  te da min  dayê  da  te da te te  da  me  me  ne da te  dada  dide  dare  dar e dar e dar e dar nam e man e man  baran e baran e baran  bavê  min e  bavê  min e bavê min e min ajotine  ajotine  ajotine  ajotine  ajotin  bavê me tê  bavê te tê  bav e

15. m a n o  t î n e  m a n o  t î n e  ma mo  tî ne  mano  tîne  bîne a nîne ne  anîne  a  nîne  anîne  dibîne  baran e  dibîne baran  dibîne baran e lolo  nan  nîne  av  nîne  av ne maye  nan ne maye  baran  ne  maye dada dade  dane  no  nade  dide  li me da  dajo  bajo  nabe  dinale dibêje tê dê  mê  nêr e  mêr e mêr e mêr nêre  nêr e ne nêr e  ne mêr e  mêr e mêr dîne  dîn e  dîn e  ne nîne  ne dîn e m a n o t î n e  mano tîne  tîne

16. n î n e  h e y e  n î n e  h e y e  nîne heye belê heye belê nanê  me heye lê ava me nîne  a va me ba te ye  ava me ba te ye  hayê te heye no hayê min  nîne  hayê me heye  nanê te heye  nan heye  ava te heye  ava me nîne erê ava te he ye  belê  berane  beran e  beranê  min e  beranê te ye min e nanê me ji te re  derî  dadayî  ye  manê te ye  mamo rabe baran e nîne heye

17. a v a  m e s a r e  ava me sar e  ava te sar e  nanê te heye ? nanê me nîne  ava me heye  here nan bîne  mala te ava be  ba tê  baran dibare mamê me te  hevalê me te  sibe ye  ba tê  êvar e êvar e êvar e bavê  te di  mala  me  de  ye  lê manê te ne hatiye  mamê te  brayê  te brayê  te  hatiye  navê te  bîne dane heye  nîne  nabe  here sibe dusibe sêsibe  ya  me  ye ya  te  ye  min  dîtî  dîtiye  te  dîtiye ava me sar e a v a  m e  s a r  e  ava  me sar e 11  12  13  14  15  16  17  18  19

18. k i r a s ê  t e y e  ki ra sê  te ye  kirasê te ye  kirasê min e ne kirasê  min e  belê  kirasê  min e  ava  kanîyê  sar e  kanî  kanî lêbelê  anî  danî  kanî  banî  bîne  dîne  dîn e  ne  hatiye  hatiye kirasê  te  heye  belê  kirasê  min  heye  ava  kanîyê sar e  av  sar e min da te  te ne da min  mano kirasên me  dide me  kirasê  me nîne dê bav bra  mam  mam  dê  bra  bav  min  anî  te  anî  ne anî  min dî  min dît ev e  ev e  ev  brayê min e  mamê  te ye  bavê  te  ye  brayê min e , k i r a s ê  t e  y e  ki ra sê  te ye  1 2 3 4 5 6 7 8 9 10

19. ç a v ê m e  h e n e  ça vê me he ne  çavê  me  hene  çavê min  heye çavê te heye  mamo  çima  tê  mamo  ne  hatiye  yeke  yek e  sê  ye çare  çar e  yek  çavê  min  têre  çavê  min  têr e  nanê  min  nîne min  nan  heye  heye  ko  bê nan  maye  meçe  diçe  here bîne  anî dide nade  kanî  min  nan  anî  da te  te nan anî da min  dada  dide dane dide  no nade  belê  dide  kê da  min da  min  ne  da  bavê te da min dê  nanê  te  anî  here kanîyê  çire ne hat ?? ç a v ê  t e h e y e heye

20. c e l a l e  ce la le  celal e  delale  delal e  delal e  delal  e cihê min  çak e  cihê  min  çak e  ne rahete  canê  te rahet e  canê te rahet e  ava me sar e  havîn germ e  min nan anî  lê av ne anî dranê min têşe  ava  kanîyê sar e  yek  du  çar  yek  du  sê  çar  min du nan anî te  du  kiras  anî  ne  ev avek  anî  ev  ne  mala  min e mala min nîne mala te heye ? belê mala min heye  derî  dade  dê nan  dide me  min  nan da te  mamo  bajo  êdî nabe dê dinale  şêr  şêr e çi jin e çi mêr e av sar e

21. y e k û d u ye û dido dikin sê dido û dido dikin çar bavê min e bavê min rahet e bra û manê min çûne bajêr çi dibêje ? bavê wî îro hat di mala me de kes nîne kî dibêje ko ez ne rahet im ji min re av û nan bîne here tan bike bavê min rahet e
n e f ê k î y e fi re he firehe fireh e fincane fincan e fireh e belê fêkî ye nanê me çak e here ji min re nan bîne ev mal fireh e mala me fireh e çûk difire balafir jî difire lê hesp nafire hesp yek û dido av û nan dê û bav bav û bra şêr û rovî

22. b a r ê m i n g i r a n e barê min giran e genimê me îsal çak e çak li havînê dinya germ e îro dinya germ e hespê min spî ye barê min giran e ava kanîyê çak e bavê min mezin e lê brayê min piçûk e piçûk m e m û z î n mem û zîn kurê manê min ê delal kurê manê min mezin e sê û çar dikin heft heft û du dikin neh b a r ê m i n g i r a n e

23. ş ê r m e z i n e şêr mezin e şev dirêj e sêv şîrîn e sêv şîrîn e keça min nîne min keç nîne mêr mezin e lê jin kiçik e dar kesk e lê ne bilind e ev mal mezin e lê ne gelek spehî ye mala te ji mala min mezintir e brayê te li kû ye ? brayê min çû gund îro nayê dê gelek pîr e ev jinik kirêt e lê gelek şêrîn e hesp reş e lê mehîn spî ye nanê te ji nanê min spîtir e şev keleha mêra ye mala te her bi ronahî ye ronahî h e r e w e r e here were were lo lolo were keçik ciwan û spehî ye bavê min gelek westa ye brayê min digel bavê min çû çûk ser diwar e h e r e w e r e here were keçik gelek spehî ye

24. e v p e n î r e ev penîr e ew pîvaz e petate tamdar e pencere fireh e derî ji pencerê mezintir e havîn hevalên belengazan e qelema te dirêj e q e l e m a t e ev kursî qahim e min mala te ne dît ev hesp qelew e lê ew mehîn ne qelew e qelî tamdar e belê bi tam e tamdar e tamdar ez te dibînim te ez dîtim hevalê min gelek qenc e di mezela min de maseyek heye tu ciwan î lê brayê te ne ciwan e destên min paqij in lê destên te ne paqij in q e l e m a t e qelema te qelema te

25. e v x a n î y e e v a x a y e ev xanî ye xanî mezin e xanî bilind e xanî û dar bilin in ev xanî mezin e lê ne gelek spehî ye di bexçê de darek heye dêya min gelek pîr e hevalê min tucar ne rahet e di xanî de maseyek heye hesp reş e lê mehîn spî ye ev porzer û çavheşîn e Gurgîn di deştê de bû lê ez di mezelê de bûm x w e xwe bixwe xwarin vexwarin ava gundê me xweş e ez û tu mala me di taxa jorîn de ye min têr xwar ez dixwim xweha te ne li mal e ? belê li mal e lê brayê min ne li mal e min piyanek anî kursî di bin masê de ye bavê min digel brayê te çû ez dixwazim tu dixwazî ez wê dibînim nû ye lê gelek kiçik e brayê min hespekî difiroşe lê xweha min pezekî difiroşe

26. gund fireh dergevan balafir balafir deşt çiya çem av bra sto sto stran stêr mêr stêr deng reng fêd dada dade dane nade no nade nade dide li te da baran e baran e mamo rabe mala te ava ya me ye ya te bavê me tê mamo ditîne nîne heye ava me sar e kirasê te ye çavê te çavê me ye celal e yek û dido barê min giran e mem û zîn şêr mezin e here were ev penîr e qelema te ev xanî ye here were lolo were were

1 2 3 4 5 6 7 8 9 10 11 12 13 14 15 16 17 18 19 20 21
22 23 30 40 50 60 70 80 90 100 200 300 400 500 600 700 800 900 1000

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t
A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T

u v w x y z
U V W X Y Z

Di Gundî De
Rojhelat e. Ezman hêdî hêdî bi rengên sor û heşîn dikene. Şivan bi pez û seyê xwe ve ji gund derdikevin. Gavan jî dewêr dide hev û ber bi çolê ve diçe. Deríyên xanîyan vedibin û gundî diçin zevîyên xwe û zarok, ji ber ko dibistan girtî ye, ji xwe re digerin, derdikevin çolê, hewa diguherin. Jin û keçên gund dest bi karê mala xwe dikin. Hin ji kanîyê avê tînin, hin nanê xwe lê dikin û hinek jî beravê dikin. Hinek ji wan jî teşîyê dirêsin, tevn û nehfûran çêdikin. Di gund de herkes bi dilxweşî dixebite. Gundî hemî hejî hev dikin û weke mirovên kêmaqil berberîya hev û du na kin. Zaroyên min ? Bes qayîş û berberiya hev Likin.

Şagirtekî qenc
Gurgîn zarokekî heftsalî ye. Ev du sal in ew diçe dibistanê. Her roj, ew sibezû ji nivînê radibe, û xwe pêk ditîne. Berî her tiştî ew dest û rûyê xwe dişo, pora xwe şeh dike, dranên xwe bi firçe difirikîne, cilên xwe dadiweşîne û li xwe dike.
Piştre ew kitêb defter û qelemên xwe dide hev û dinêre ko tiştekî xwe ji bîr ne ke û çavên xwe li nivîsandina xwe digerîne, heta ko tiştek jê kêm ne be û kêmasîyek tê de dibîne ew wê rast dike. Êdî Gurgîn demçûna dibistanê xweş nas dike û gava dibîne ko hê zû ye, dersên xwe dîsa carek an didowan dixwîne. Berî çûna xwe ew tê destên dê û bavê xwe û xwişka xwe ya piçûk Zînê maç dike.
Gurgîn di dibistanê de zarokekî paqij û bo jîr e. Gurgîn tucar bi hevalê xwe re pev na çe, ji tu kesî re xeberinê xirab na bêje û di dersxaneyê de bala xwe dide dersa xwe. Dê û bavê Gurgîn manosteyên wî ji wî xweş in.

Meha Gulanê.
Meha Gulanê, meha salê ya çêtir e. Gulan meha kulîlka ye, her texlît kulilkên bi reng tê de hene. Êdî serma na mîne. Xelk cilên stûr dertêxin ên tenik werdigirin. Meha Gulanê de, mêrg û çiyan de em digerin. Dar bi kulîlkan tejî ne û hewa ji bihna wan bihndar e. Sal ko hewa te de xweş û bijûn e, di wê salê de meywe û zad gelek dibin. Çûk hêlînên xwe çêdikin û hewa ji deng û stranên wan tejî dibe.
Çend gulçîçekên spehî biçinin û bikin diyarî ji dê û bavê xwe re, ji ber ko dê û bavê we jê hez dikin. Ez ê ji xwîşka xwe re jî qevdeke gul û rehanan bidim, ji ber ko ew jî gelek hejî wan dike .

Di Heftekê De Çend Roj Hene
Di heftekê de çend roj hene ? Gurgîn herwekî jîr e, rojên hefteyê xweş dizane û navên wan dikare bibêje : În, Şenbî, Yekşemb, Duşemb, Sêşemb, Çarşemb, Pêncşemb, Soro navên mehan jî xweş dizane. Bala xwe bidin ,honê bibînin çawan ew navên wan ji we re dê bibêje. Çileyê-pêşîn, Sibat, Adar Nîsan, Gulan, Hizêran, Tîrmeh, Tebax, Îlon, Çirîya-pêşîn, Çirîya-paşîn, Çileyê-paşîn. Soro zarokekî jêhatî ye, di hejmartina navên mehan de xwe şaş ne kiriye.

Hejmartin.
Bêco dikare bê zehmet heya hezarî bihejmêre. Bêco niho dê bihejmêre, kerem kin bala xwe bidin ê : Yek, Du, Sê , Çar, Pênc, Şeş, Heft, Heşt , Neh, Deh; Yazde, Donzde, Sêzde, Çarde, Panzde, Şanzde, Hevde, Hejde, Nozde, Bîst , Bîst û yek, Sih , Çel , Pencî , Şest , Heftî , Heştî , Not , Sed , Du sed , Sê sed , Çar sed , Pênc sed ,Şeş sed , Heft sed , Heşt sed , Neh sed , Hezar , Du hezar....
Bêco bê xelet heya hezarî hejmartin. Manosteyê wî jê gelek dilxweş bû û jê re diyarîyek da.

## Dara Sêvê

Di bexça me da darekê sêvê ya mezin heye. Ew sih salî ye. Rayên darê bi rehşikên xwe ve, di bin erdê de, cihekî mezin digirin. Wê gelek çiqil hene yên mezin û piçûk, yên kurt û dirêj. Ji xwe ra û rehşik, li bin erdê, biqasî şah û çiqlên darê di ser erdê re, pehn dibin.

Ber bi dawiya payîzê ve belgên darsêvê dest bi weşînê dikin. Li zivistanê dar yekcar dibe tazî, lê gulpikine hûr li ser çiqlan dimînin. Gava bihar tê û tava rojê erdê germ dike, bihna axê xweş dibe, dara sêvê tê ser belgên xwe.

Rayên darê bi rehşikên xwe ve ji erdê qinyatê hiltînin. Ew qinyat dibe mîna şîre û ber bi serê darê û çiqlên wê ve hildikişe û wan tejî dike. Ji gulpikan pêş de, tên belgên sorespî. Dar kulîlkan dide, ew kulîlkên rengerengîn dibişkivin. Gava belgên kulîlkan diweşin der dewsa wan sêvine kesk yên piçûk xuya dibin.

Rayên darê, bi rehşikên xwe ve, biharê û havînê pê de dixebitin. Çiql û belgên darê jî xebata xwe ya xas pêk tînin. Pê sêv hêdî hêdî dibin mezin, tamxweş, bihindar û rengîn û çêdibin.

Reşbûna deyindikên sêvan nîşana gihaştina wan e. Sêv meyweke gelek hêja ye û çar spehîtî lê yek bûne: şikil û tamdarî, reng û bihinxweşî.

## Hevalê Min Temo

Min Temo zûda nas dikir. Me di zarotiya xwe de tevhevdu berx diçêrandin. Carekê li ser zebeş, kelem, gêzer, kundur, tivir û silqan û darteaman bû xeberdan. Wî digot: "Ez ni zanim çire gundîyên me ji xeynî ceh û genim û pez xwedîkirinê tiştekî din na kin. Em ji bona kirîna heşînatiyan divê her herin gundên dora xwe. Axa gundê me gelek qenc e. Ava kaniya me boş e. Çikas rind dibû heke gundê me jî bexçe û bostan hebiwa. Lê ev tişt ne zehmet e, divê bête çêkirin."

Ji wê roja ko gotin li ser çêkirina bostanan bû gelek wext borî. Herwekî, ev pênc sal in, ez li bajêr dimînim, min ne dizanî, heke gundiyan dest bi vê xebatê kirine an ne.

Berî bi çend rojan ez çûm gundê ko zarotiya min tê de borî. Navê wî gundî Pamp e. Gava ez gihaştim ê, min baweriya xwe bi çavên xwe ne dianî. Dora gund bi bexçe û bostanine spehî xemilandî bû. Ne bitenê heşînatî lê xelkê gund bexçeyên xwe bi darteam û gulçîçekan çeleng kiri bûn. Darteamên tede rêzkirî ji texlîteke nûjen bûn, ne gelek bilind herçend jî çiqlên wan têr meywe bûn. Min berê xwe da mala hevalê xwe yê ciwaniyê Temo. Gava ez nîzîkî mala wî bûm, min bi dişwarî reya xwe derdixst. Her alîyên gund, bi bexçeyên bedew dorgirtî, ecêb spehî bû bûn; Ji niska ve çavê min bi Temo ket. Wî, di nav bostanê de, av dida heşînatiyan. Min deng û silav lê kir. Wî gazî kir: "Tu bi xêr hatî", li ser seran û li ser çavan hatî." Gava ez diketim hindûrê bostanê dilê min hêj bêtir şa bû. Dar, heşînatî û gulçîçek li bi rêz û tertîb hati bûn çandin û çikilandin. Temo, bi rûyê xwe yê kenok ber bi min ve dihat. Me destên hev givaştin û pev re, demekê, bêî ko gotinekê bibêjin, li dora xwe nêrîn. Xebata hevalê min û ya gundiyan rûyê gund û dorhêlan ecêb guhêrandî bûn. Gund bû bû mîna rûyekî kenok.

Piştî ko me halên hev û dû pirsîn û çend gotinên hevaltiyê bilêv kirin, Temo got: "Metheloka kal û kalikên me çiqas rast e; "Xebat şêr e dest avêt ê dibe rovî". Min lê vegerand: "We tiştekî hêja pêk anî, eydî li gund fêkî û her texlît heşînatî peyda dibin. Wî got: "Belê; xelkê gund gelek dilxweş in û ava kanîyê eydî winda na be. Piştî nîro ez ê kewarên mêşên hingivî, yên ko em bixwedî dikin, şanî te bidim. Xelk jê jî razî ne.

Di saya gulçîçekên bexçan û kulîlkê darteaman hingivê gundê me gelek bihndar û tamdar e . Jê bilî , herwekî xwarina wan di dera wan de ye; bi çñ û hatina rêke dirêj wextê xwe winda na kin û zehf hingivî çêdikin . Gava Temo ev tişt digotin , dihate bîra min ko nêşên hingivî hewce be ji ji kewarên xwe heta sê hear mêtiran dûr diçin û li qwîta xwe digerin . Lê hingî , ew gelek wext winda dikin û ni karin pir hingivî çêkin .

................

Êvarê Temo hemî hevalên xwe , ko piraniya wan hevalên min jî bûn, vexwendin ba xwe û me piştî şîvê , heta nîvê şevê , qala demên zarotiya xwe ,serboriyên ciwaniya xwe û reyên pêşveketina welatê xwe , gund û bajarên xwe kirin . Ez çend rojên din li gund mam ,û di nav bexçe û bostanande , arîkariya hevalên xwe kirin û piştî heftekê vegeriyam bajêr .Gundê me gundê me ye berê bû , lê xebata rûniştinanan bi fikrinê nû ew kiri bû ciwan û bedew .

Havîn û Xebat

Hemî xelkên gund hatinên erdên xwe berhev dikin . Zaro jî bi wan re ne , ew jî destvala na sekinin , di zeviyan de der tenişta dê û bavê xwe , mam û pismamên xwe dixebitin , arîkariya wan dikin .Rast e ko ji wan karinê giran der in . Lê ew bi destên xwe yên piçûk xebateke hêja pêk tînin . Dersdarê gund yê ko zaro anîn zeviyan ,mîna paleyekî ,dset dide gundiyan û xebatê dike .

Piştî xebatê dersdar gazî zaroyan kir in û gote wan : "Zarono... lihev bicivin ." Zaro lihev civiyan. Dersdar gote wan :"Hon dixwazin sibe dîsa bên û arîkariya bexçevanan bikin. Zaroyan yekdil û yekdeng bi şahî qîr kir û got : "Belê , em dixwazin . Wî li wan vegerand : "Hingî , sibe , di saet heftan de , em ê di nav dexlên gund yên roavayî rastî hev bên".

Dotira rojê dersdar û zaro di cihê gotî de , der dema nîşandayî gihane hev. Jinên gund di bexça memo de dest bi xebatê kiri bûn . Dersdar û zaro piştî silavdanê bi ken û dilxweşî dest bi arîkatiya jinan kirin, û di nav çar saetan de , gelek fêkî berhev kirin .Jinan digotine wan: "Hon ecêb xweş dixebitin û xwe dilezînin , mala we ava be .

Bi wan gotinan dê , met , xaltik , xwîşk , dotmam , brazî û xwarziyên wan , yên ko di jinên gund de bûn , nav di wan didan .Saet dehan de berhevkirina meywan qediya û jin û zaroyan ew danîn selikan . Eydî , dema xwrin , vexwarin , leyistin û stranan hati bû .Jin û zaroyan û dersdar , pev re , taştî şkênandin , fêkiyine tamdar xwarin bi govend û stranan bi ken û kêfxweşî bihna xwe vekirin .

Pênc SEHKERAN

Pênc sehkerên me hene ; em bi wan tiştên dora xwe de sehdikin. Desdan , dîtin , bihistin , bihnkirin û tamkirin sehkerên me ne .

Em şikl û gewherê tiştan bi desdanê seh dikin .Çav hêsincawê dîtinê ye . Çav bi çermikên xwe û mujang û birhan tête paraztin .

Bi guh em dibihîsin . Ji derveyê guh re kirîjiyok û nermik dibêjin ê . Di hundirê guh de çermekî zirav heye ; ew ji birha dengî dilerize û wisan em dibihîsin ; wî çermê zirav re pergî tête gotin .

Difn hêsincawa bihnê ye . Tama tiştê şor û şîrîn , tehl gemar an tûj bi zman tête sehkirin , hêsincawê tamê zman e . Pênc sehkerên me bi ranan bi mejî ve girêdane .

Se çawan ji xwe re hevalek dît

Se hergav bitenê di nav rêlan de dima . Tenahî dilê wî aciz û hiznî dikir . Rojekê , ew çû nav bexçan û meşan bi qesda peydakirina hevalekî . Di nav bexçan de pir geriya û ber bi êvarê ji nişka ve rastî kevroşkekê hat . Se got ê :

-- Lê , kevroşkê , de were em bihevre bijîn .

-- Ez razî me .

Wan di nav bexçan de ji xwe re cihekî dît da ko lê şeva xwe derbas bikin . Kevroşk raza , lê heçî se hişyar ma . Ber bi nîvê şevê se dest bi reyînê kir . Xewa kevroşkê revî , wê baz da ser xwe û gote se :

-- Ev çi reyîn e ? Gur dengê te wê bibihîse ,dê bê me bixwe . Se kher bû û fikirî :"Min ji xwe re hevaleke xirab bijart . Dilê kevroşkê tenik e bila ez herim ba gurî , wilo dixuye ko ew ji kesî na tirse . "

Se dev ji kevroşkê berda û berê xwe da çolê da ko rastî gurî bê . Se di nav kevir û deviyan de gelek meşiya , bi derbekê çavê wî bi gurî ket.Se da pey wî .Pir ne borî ,se seh kir ko gur jê direve.Se gazî gurî kir û got ê :

-- Heyran,ji min me reve , ma tu min kêmî xwe dibînî , ez li hevalîtiya te digerim . Were , guro , de em bibin dostên hev û pev re bijîn. Gur sekinî , li sê nêrî û dît ko seyekî pakdil e ,ber bi wî hat û jê re got :

-- Qenc e , xuyaye ko ti ji dil dibêjî ,ez pê qail im , de were em hev re bijîn .

Êvarê ew gihan demeke nependî û piştî ko şevborî derbas kirin, xwe pêk anîn heta ko razin . Gur raza, lê se hişyar ma . Nîvê şevê se dest bi reyinê kir . Gur tirsiya û got ê :

-- Qurban , tu çire direyî .Me xwe avêtiye vê nepeniyê da ko hirç bi me ne hese . Cihê ko tu rakevî tu direyî, hirç wê bê me bixwe .

Se ji xwe re got "Min digot xwe qey gur mêr e ,mêrxasek e, lê ne werge ye , ne biqiwet e . Ji hirçê ditirse û xew ji çavên wî direve . Se gur hişt li cih û berê xwe da şikeftan û rez û bostanan û li hirçê geriya.Di fitlîneka rezekî de rastî hirçê hat. Se nîzîkî lê kir û got ê :

-- Hirça xurt û zor , were de em tev de bijîn...

Hirç pê qail bû. Wan ew roj pev re derbas kirin .Êvarê hirç raza. Lê se dîsa raneket . Wî nîvê şevê dest bi reyînê kir . Hirç veciniqî ser xwe tirsiya , çêrî se kir û got ê :

-- Kher be lo , çima direyî . Mirov dê bibihîse wê bê û me bikuje .

Se xwe fikirî " Ewa jî tirsonek e , gerek e ez herim li mirovî bigerim.

Se ji ba hirçê baz da çû . Sibetirê ew di nav meşan de gelek geriya lê rastî mirovî ne hat . Dawî ji nav meşan derket , kêleka rê ket,da ko hinik bihna xwe veke . Pir ne borî , çavê se li mirovî ket yê ko ber bi meşan ve dihat . Se hat ba wî û got ê :

- Mirovo , mirovo lo , de em pev re bijîn .

Mirov sekinî , li sê nêrî , kenî û got ê :

- Çire no , were de em pev re bijîn û bibin hevalên hev , bide pey min .

Û mirov sê bir ba xwe . Bû êvar , mirov raza . Nîvê şevê sê reyî lê mirov hişyar ne bû . Se ji nû ve û gelekî xurt reyî , îca mirov hişyar bû û bi hêrs gote se :

- Tu çira direyî , gelo tu birçî yî , lewra direyî . Mirov rabû hinik goşt û nan anîn û danîn ber wî . Se hinik xwar û raket û zûka bi xew re çû. Ji vê şevê ve se ma ba mirov û niha jî se ba mirovan dimîne û ew hevalê wî yê pakdil e . Yekî goti bû:" Hingî ez pîr dibim , qenctir hînî mirovan dibim û ji seyên xwe hez dikim .

Cotkar.

Rojhelat e, mame Tacîn diçe cinîna xwe, mer û tevirên wî, liser milî wî ne . Bi kêf û dilxweşî cinîna xwe, dikole. Hevind jî diçe dibistana xwe û her ro di rê de, rasta wî tê. Hevind silavan lê dikę û dibêje :
– Mame Tacîn, roja te xweş be !
Mame Tacîn pê dilxweş dibe, selava wî lê vedigerîne. Hevind zarokekî bi jîr e qedrê cotkar û ketkeran digire. Mezinahiya mirovan bi xebatê ye .

Girgiroka Pîrejinê.

Zivistan e, dinya sar e, baran hûr hûr dibare. Rê kaş e û herî ye.Pîrejinkê, cilên kevn wergirtî ne, girgirok daye peşiya xwe û berê wê daye evrazê.Tiliyên wê ji sermayê qufilî ne, pêyên wê axê na girin û jê dişemitin,ew dikeve nav herîyê de û nav de digevize ;hîngî radibe dîsa dikeve ;ni kare bi rêve biçe, dimîne cihê xwe de. Çend zaro bere diborin ,yek ji,yên din re dibêje :
– Gelî zarokno werin, de em arîkariya vê pîrejinê bikin ! !
Zaro lê vedigerînin dibêjin :
– Baş e !
Zaro lê tên hev û girgirokê didehifînin, bi hewa dixin û dibin serî kaşî. Pierjin gelek dilxweş dibe, bihna wê derdikeve û li zaroya dizivire û dibêje:
– Gelî zarono ! ! Xwedê ji we razî be, herwekî ez îro ji we razî bûme, û we ji dê û bavê we re bihêle ! Zarok destûra xwe jê dixwazin û berên xwe didin mala xwe .

Mîr û Xanî

Çawe em dizanin Ehmedê Xanî yek ji şaîrên me yê mezintir e .Memozîna wî di dinê de binav û deng e. Mîrê Botan gelek qedrê Xanî digirt û her car ew vedixwend nik xwe. Lê Xanî carina ezinandina Mîr ji bîr dikir û ne diçû nik wî. Carekê, Mîr ji nehatina wî gelek enirî .
Xanî erna Mîr bihîst û çû bal Mîr ve, ji bo efûkirina qisûra xwe.Kengî ew ket dîwanê û Mîr ew dît, Mîr berê xwe jê zivirand û piştа xwe da yê.Xanî kenî û bi dilxweşî pêş ve çû ji Mîr re got :
– Mîrê min, li guhê min keti bû ko tu ji min enirî, lê ez dibînim tiştekî welî tune.
Rûyê Mîr ji ernê sor bû û bi dengekî hişk lê vegerand û got :
– Seyda...ma tu ji çi dertêxî ko ez ji te ne enirî me û bihîstina te ne rast e .Ehmedê Xanî got :
– Mîrê min te pişta xwe da min, ez dizanil ko tu pişta xwe ji dijminên xwe re na dî . Mîr pê gelek dilxweş bû û ew çûn ser û ruyên hev .

Buhar.

Buhar e. Hêdî hêdî hewa germ dibe. Mêrg û solîn bi sosin beybûn, kinêr,lale lawlaw, hêro, helal, stêrik û nêrgizan dikenin. Her der dibe têr giya û çîmen. Berfa serên çiya dihele û belekî dikevin zozanên jorîn.Deşt û zozanên jêrîn kepeneyên xwe ji nav milên xwe davêjin û serên xwe radikin.

Sîngên wan bi her texlît kulîlk û giyan tên xemilandin. Bayê feraşînê li wan dide, guliyên wan dihejîne û bûkikên wan dibişkivîne . Şehlûl û bilbil derdikevin ser serê guliyên daran, rûyalan û tehtan û di wan deran de dixwînin , awaz dibêjin û diştirin û mizgîniya biharê didin.Refên qulingan xwe pêktînin û qesda zozanan dikin, legleg û hacîreşk ji germiyanê berê xwe didin honikahiyê û tên û lê ew hêlînên xwe çêdikin û hêkan dikin:Di zevî û rezan de xelk dixebitin zeviyên xwe cot dikin, rezên xwe dikolin.Xelk û şivan derdikevin banehiyan û berbuhariyan û pezên xwe li erdê bijûn diçêrînin.Ceh û genim roj bi roj radibin û li xwe zeyde dikin.Kurê min ê delal ! Tu dibînî çawan her kes dixebite...tu jî xweş bixebite, xebat şîrîn e, jîna te bi xebatê şîrîn dibe .
Heta mirinê çav li kirinê. Bi xweziya dest nagihê baqa keziya...

Havîn.

Havîn e, dinya germ e. Giya hişk bû ye, bûye pûş. Rûyê erdê zer û gewr e.Mêrg û solîn gul û kulîlk ji xemlên xwe ketine. Wextê berxwerê ye, dexl û zad gihane. Darteam bi çêbûna fêkî bireng bûne, di rezan de mêwê tirî bi uşiyên zer û sor tejî ne,ji nav pelén heşín xuya dibin û mizgîniya çêbûna xwe didin. Çaxa durûn û paleyîyê ye.Pale dikevin zeviyan de, bi das û qeynaxan qirşî didurûn û dikin melûk.Jin jî bi mêrên xwe re dixebitin, wan melûkan dikin gidîş. Qirş te kêşandin, di bênderê de tê gêrekirin, ka û danê wî bi milhêban didêrin. ji hev vediqetînin û safî dikin.Jin û zaro dikevin dehl û cinînan de meywe berhev dikin. Di rezan de selik û qifik ji tirî tejî ne.

Mûrî ji xwe re qwitên xwe berhev dikin û lêk didin, têxin malikên xwe de û hisabê paşroja xwe dikin, ji lewre, rojên teng û li ser wan de tên, da ko di wan rojan de giriftar ne bin.Zaro jî di dibistanê de dixebitin,seydayê wan ji wan dilxweş e.Sibe zaro mezin û mirovên zana bibin û bibin arîkarên mal û welatê xwe .

Mele û Gundî

Mele çû ser bêndera mirovekî, wî mirovî bêndera xwe didêra .Mirovî ji Melê re got :" Tu dizanî Şeytên ji min re dibêje çi ?"
Mele got : " Dibêje çi ?"
Mirovî got ê : " Ew dibêje min , rahêje vê melhebê û li nava qehfê melê xe..."
Melê got :" No, malwêran , Şeytan dijminê Xwedê ye ,ko jê bê ya qenc na ke û jê bê erş û kursî wê xira bike ."
Di dû saetekê re, Mirov car dî jê Melê re got :"Mele ,tu dizanî Şeytan ji min re çi dibêje ?"
Melê got :" Dibêje çi ? "
Mirovî lê vegerand û got :" Ew dibêje min, ji bêndera xwe derkeve û wê teslîmî Melê bike : "
Melê jê re got : " Ma tu zanî çi ye ,bihostek ji erdê ne ma ko Şeytan ibadet ji Xwedê re ne kir ,bes niha ew û Xwedê hebik ji hev û du xeyidîne , bes ew pir qenc e .

Kew û Rovî

Roviyek ji xwe re digere li çolê, ew rastî kewekî hat .Xebera kew jê tu ne. Kew ji xwe re digot : " Yê ko xewa wî na yê çawan bi derew radize ,ez ê xwe biceribînim. Kewî çavê xwe girtin û dikî ko raze. Rovî ji par re çû û rahişte kew bi devê xwe re. Kewî nêrî ko di devê Rovî de ye û ji Rovî re got : " Te ez girtin,ez nesîbê te me ,bêje spas ji Xwedê re .
Rovî got : "Spas ji Xwedê re. " Devê wîna vebû Kew firîya miqabilî Rovî danî. Rovî ban kire Kew got : " Mala wîna ne ava be heçî ko birçî be û bêje Spas ji Xwedê re.Kewî jê re got :"Mala wî ne ava be heçî ko xewa wî ne yê û bi derew raze . "

Methelokine Kurdî

Hoke ker bi nefs e, mistek ceh bes e. Kêvroşk ji çiya na tirs e .
Deh mal donzde rîspî . Berf dihele çiya dimîne ,mirov dimire nav dimîne .
Ji bona çavekî dihebînim çiyayekî . Hesp dibeze, siwar pesnê xwe dide .
Serê bê teqûreş ji xwe kundir e . Rih dibe bost, dijmin na be dost .
Yê ko na êşîne , na kenîne . Çi bostek çi çar tilî .Dest hilanîn ferea xêrê ye .Yan mêrê baş be, yan bivir û das be, yan bimir ji xwe xelas be .
Yê ko dest dike dê û bav nake ,Didu bi hev re rast bin, ê sisiyan Xwedê ye.
Mî, bizin bi dizî gon dixwin, eşkere dizin.Dinê li dinê çavê gur li bizinê .
Yekî jina xwe berda bû, digotê :" Were bibe yara min."
Gotin kerê :" Were em te bibin cinetê." Got ma givzonik li wê derê heye ?
Heta hevraz ne keve ber te , qedrê berjêrî ni zanî .
H i n e k d i x e n i k i n , h i n e k d i x e r i q i n ...

Nivîsandina Nameyan.
Gava dê û bavê min,bra û pismamê min li nik min rûniştî ne ;ez dikarim xwestina xwe, ji wan re bi dev bibêjim,lê heke ez ji wan dûr im, divê ez xwestina xwe, ji wan re bi kaxezekê bidim zanîn.
Nivîsandina nameyekî tiştekî gelek hêsanîye.Ezê biceribînim :

Dêrik, 4, Adar.1958.

Ji bo yê kurê min ê şêrîn û delal.

Pêşî çavên te diramîsim. Heke tu pirsa min dikî, ez bikêf im û rahet im lê her ez di xema we de me. Gelo îşê we çawa ye, hon rahet in ?

Çaxê nameya min bigehe destê we,çilobûn û çawabûna xwe, ji min re binvîsin û qenc bidin zanîn. Êdî ez çavên te maçdikim tevlî brayên te û ez çavnêrê reşbeleka te me. Tu ji min re sax.

Bavê te Haco.

---

Hezargol, 4.Tebax.1957

Ji bona hevalê min ê şêrîn û hêja .

Paş silava, ez çilobûn û çawabûna te dipirsim û heke tu li min dipirsî ez bikêf im, tenê ez bêrîya te dikim .

Tu dizanî ko, îsal min diviya bû, ez li Cezîrê genim bikirim,kiriyariya min jî diviya bû, bi destê te be. Lê belê, vî çaxî destê min teng e,min ni karî bû ji te re perekî pir bişînim .

Lê belê vaye hezar zêr, min di postê de, ji te re şiyand, ji bo ku tu genim pê bikiri .

Ez ji te hêvî dikim, heta ji te bê hinikî bi erzanî û genimê qenc bikire , heta ko em li vêderê pê ne xesirin.Ez çavnêriya himeta te û bratiya te dikim .

Ez selavan li te dikim û çavê zarokên piçûk radimîsim û ezê keyfa heval û hogiran dipirsim brayê min ê delal.Ez li hêvîya reşbeleka te me .

Hevalê te
Haco

---

Mûş, 7 .Tebax. 1956.

Hevalê min ê delal.

Reşbeleka te giha min û te ez bi nivîsandina xwe gelekî dilxweş kirim. Sibe nikarim bêm cem te, ji lewre mêvanên brayê min ê mezin hatine mala me.

Dusibe piştî nîvro di nav beyna saet çar û pêncan de, ezê bêm ziyareta te .

Saxiya te daxwaza dilê min e. Ez têm çavên te .

Hevalê te
Gurgîn

---

Roha, 5.Gulan.1957.

Hevalê min ê delal.

Îro giham Rohayê û hema çûm nik brayê te. Pesn li Xwedê be,halê wî baş e û min doktor jî dît, ew dibêje ko êdî tu taluke ne maye û paşê heftekê brayê te dikare ji nav nîvîna xwe rabe.

Herwekî min ji te re goti bû ,her ro ez ê herim balê û paşên çend rojan ji te re dîsa li ser halê wî binivîsim.

Di rê de min pismamê te Elo dît, ew gazindan ji te dike û dibêje ko du kaxezên ko ji te re şandî bûn bê bersîv mane. Hêviya min ji te heye ko tu jê re zû binivîsî. Xweşiya dilê te dixwazin.

Neco .

Şam, 1. Tişrîna-Paşîn. 1956

Ya lawê min.

Xwedê enrê te dirêj bike, Xwedê dê û bavê te ji keda te mehrum ne ke, yanî bi şev û ro tim tu di bîra me de yî. Îsal heşt sal in em li welatê xarîbiyê ne. Em tum dixwazin cuhab û xeber bidin hev, lê em ji hev dûr in, gazind na be.

Xwedê bixwaze, bi emrê dirêj, mirov digehe miradê xwe. Berê mehekê dilê min hebû, ez ji te re nameyekê bişînim, lê herwekî tu dizanî nivîsan - dina min nî ne, brayê te yê piçûk jî ne hazir bû...

Brayê te duhî ji xwendegahê hat, vê reşbelekê pê didim nivîsandin.

Ez ni karim bêm ba te, lê dilê te hebe, tu dikarî bê. Me gelek bêriya te kiriye. Em dixwazin rojkê berî rojkê te bibînin. Ez û deya te çavê te yê rastî radimîsin.

Brayê te tê destên te.

Bavê te
Şero

---

Diyarbekr, Deriyê-Nû 7. Tebax. 1958

Ê lawê min.

Berî sê salan ez hatim Qamîşlokê, li wêderê ez nesax ketim. Sê meha ez di nivînê de mam. Roja min tu dîtî li Qamîşlokê, daestê min vala yek û insan nesax bikeve aqilê wî hebkî kêm dibe, min guh ne da te lawê min. Li kêmasiya bavê xwe me nêre. Roja, tu ji cem min çû û berê xwe da Mêrdînê; wê çaxê ez pir poşman bûm, ji hev qetandin zehmet e. Divê tu tim ji min re binivîsî. Min bihîst tu zewicî, zewicandina te pîroz be, li ser xeyrê be.

Înasan zewicî, divê dîsa xatirê dê û bavê xwe zanibe. Ji min û ji dêya te, taba wê ji min pirtir e bi te re, gerek tu xatirê dêya xwe zanibe. Tu bavê heft lawan be înşalah.

Ez silavan li dêya te dikim, xaltiya te, li pîreka te, li xalê te, li apê te, heçî mirovê me dostê me, heçî pirsa me dikin, ji ber min ve, silavan li wan bike.

Ez çavê te radimîsim, Xwedê bike ez kêmaniya we ne bînim. Tu û pîreka xwe tevde kal û pîr bibin. Xwedê we muhtacê nemerda me ke. Ez ji te razî me, Xwedê ji te razî be. Lingê te li kevirekî ne keve lawê min.

Bavê te
Temo

---

Tirba Spî. 16. Adar. 1959

Pismamê delal.

Meha borî, gava tu li cem me bû yî, te digot ko dilê te heye herî Dêrikê. Sibe berî nîvro di saet heştan de, ez û brayê xwe Gurgîn û cîranê me Remo, em ê tev de herin Dêrikê. Di otomobîla me de cihekî vala heye.

Hevalîtiya te di vê çûyinê de, dilê me dê gelek dilxweş bike. Hêvîdarê bersîva te me.

Ferzende

---

<u>Telegraf</u>

Etman Axa Hesîçe

Sibe berî nîvro saet dehan de têm Hesîçeyê, keremke li hêviya min bimîne.

Resûl

---

Hejmartin û hisabkirin.

Gava ez diçin bazarê û tiştna dikirim li ser kaxezekî hisabê xwe dibînin .

Herwekî :

| Tişt | Bihayê wan bi banknot(lîre)ên tirkî |
|---|---|
| Goşt | 10 |
| Nan | 3 |
| Mast | 2 |
| | 15 |

Ji vê hisabê tê zanîn ko min panzde banknotên tirkî derve dane. An

| Tişt | Bihayê wan bi banknotên tirkî |
|---|---|
| Berxek | 80 |
| Çar mirîşk | 30 |
| Golikek | 150 |
| Bizinek | 110 |
| Beranek | 160 |
| | 530 |

Ji vî hisabî xuya dibe ko min pênc sed û sîh banknotên tirkî derve dane.An

| Xweyîyên pez | Hejmara pez |
|---|---|
| Hevind | 35 |
| Temo | 12 |
| Tacîn | 14 |
| Feremêz | 22 |
| Hewran | 11 |
| Cengîr | 44 |
| Ferzende | 26 |
| | 164 |

Ji hisabê min derdikeve ko di gundê me de sed û şest û çar pezên spî hene.

## Ew Du Kevroşk

Di nav deviyan re, ji seyan peyketî, kevroşkek ez na bêjim dibezî , lê difirî. Yekê ji hevalên wê ji lanê xwe biderket û jê re got :" Bisekine... hevalê, çi heye ? "

Ya din lê vegerand : " Çi heye ? Bihna min çikiyaye, tu na bînî, min eydî taqet nî ne, du tajiyên rêbir li wê ne, li ser şopa min in . "

Belê, ya paşî lê vegerand, li wê derê , ez wan dibînim, lê ew ne tajî ne ...

— Hingî ew çi ne ? --Sey in, seyine kurteling . — Belê..Çi tewzekerî, tu heneka xwe bi min dikî ...Ez dibêjime te ko ew tajî ne û birastî tajî ne , min ew bes dîtine . — De here, ew seyine kurteling in, tu hîç pê ni zanî. --Ez dîsa ji te re dibêjim , seyine kurteling...

Li ser wê, se tên û her du kevroşkên me yên ji xwe bêhay dikin devê xwe . Bila yên ko ji bona jevên ne giran e kara bingehîn davêjin piştguhê xwe , vê bûnebûnê her bînin bîra xwe .

---

Qismetê pisîkan li kevaniya xirab e .
Qubê spî giş ne ziyaret in . Şêr şêr e, çi jin e , çi mêr e
Eqil tacek zêrîn e , serê herkesî nî ne .
Dinê li dinê çavê gur li bizinê .

## Rabûn û Rûniştin.

Kurd gelek bi edeb û terbiye ne .Rabûn û rûniştina wan, dan û standina wan bi rêz û tertîb in.Kurd nazik, giran û ciwanmerd in.Xwediyê gotina xwe ne. Paşgotiniya xelkê, heval, hogir û braderên xwe na kin.Dostê dostê xwe ne.Pir na xêvin, gotina xwe bê rê drêj na kin.Gava ew êrê an belê dibêjin erê an belê ye û gava no dibêjin no ye. Ew beriya ko tiştekî bibêjin ,vî tiştî xweş didin eqlê xwe û eydî ji gotina xwe bi şûnda venagerin.Heke wan wad da poşman na bin, bi dilxweşî û canêrî wada xwe tînin cih .

Qenciya ko ji wan re hate kirin tucar ji bîra na kin .Heke dijminê wan kete bextê wan , ew di sûçên wan diborin .

---

Gava ji kesekî tiştekî dixwazin na bêjin bide min, lê dibêjin " Ji kerema xwe bide min ".Ko ji wan re tiştek hate dan "Spas "dibêjin û pê minetdariya xwe didin zanîn .

Ko kesekî banî wan kir ,ew dibêjin :" lebê an bifermû an ez benî . "

Gava kesek ji wan tiştek dipirse ew lê vedigerînin:"Ez dizanim an ez nizanim, an erê an belê an no" lê nabêjin :"hî, ha " û serê xwe na hejînin, ew dizanin ko wilo kirin kêmasiyek e.

Gava ew tiştekî vedixwin bi edeb û isûl vedixwin, hêdî hêdî û bi edeb dikişînin , yên dora xwe aciz na kin .

Wadê ew li ser xwarinê ne û parî di devê wan de ye milçe milç û çelq û çelq na kin .

Heke ew di civatekî de , di nav xelkê de rûniştî ne bi qirpe qirpa qirika xwe hevalên dora xwe aciz na kin .Ew dizanin ko vî tiştî kirin kêmasiyeke gelek mezin e .

Pêşbirî li jin û zarokan na kin , rê li wan na birin .Wadê ew dipeyivin dengê xwe bilind na kin û heke yek dipetive gotina wî na birin û beriya ko ew axaftina xwe biqedîne dest bi peyivê na kin.Her rastiyê dibêjin, derewan na kin ,ew dizanin ko derew sêwî ne .Ew dîsa dizanin ko derew çiqas zû jî bibeze dawî rastî wê digire . Kurd nî ne ko gotina bav û kalan :"Derewker û bê bext her rû reş in ."

Kurd dest û tiliyên xwe na kin dev û difn û guhê xwe û wan pê paqij na kin. Gava ew dikuxin an dibihnijin destê xwe an destmala xwe didin ber devê xwe .

Ew li erdê tif na kin . Goşt û xwrina ber diranan tû na kin erdê . Ariya cigara xwe , di nav civatê de, na weşînin erdê .Li zaroyên xwe na din, wan bê sebebeke giran na êşînin , wan tirsiyandî û çavşkênandî na kin.Ew dizanin ko heke wan wilo kir zaro pê derewker dibin .

Çiqas jî bienirin dijûnan na kin ,gotin û pirsên xerab na bêjin.Ew dizanin ko heke wan gotinekî xerab ji mirovekî re gotin wî ji kur ve brîndar dikin. Ew dizanin ko brîna xenceran sax dibin, lê brîna gotinan sax na bin .

Bê rê sund na xwin û bê sebebeke giran xelkê na din ber sundan. Di nav axaftinê de ,bi serê bav û pêşiyê xwe sund na xwin û bi serê bav û kalê xelkê û gora wan jî sund na xwin . Ew dizanin ko ev tişt gelek kirêt e.

Gava ew tên malekê û xwediyê malê banî wan dike ser xwarinê bi derew an ji ber şermisariya bê rê ,na bêjin ez têrim û bi delalî tên ser sifrê .

Wadê ji wan tiştek tê pirsin, xweş bala xwe didin gotinên pirskerî da ko bikarin bi rastî bersîva wî bidin .

Gava kesek ji wan re tiştekî dibêje an qise dike bi bihnfirehî guh didin û bi lez û bez na bêjin : " Ez dizanim an min seh kir . "

Bi bala fireh mirov hêj çêtir hîn dibe .

Ew dizanin ko ern û bihntengî tiştine ne qenc in , nemaze li ber mirovên qels û belengaz û jin û zaroyan û dilşkestina wan kêmasiyek e , şermisariyeke zor gewre ye .

Kurd çavsoriya xwe li xurtan dikin , li yên di ser xwe re dikin , ne li yên di bin xwe re , ne li yên kêmî xwe .

---

## Xewna Drûnkerekî

Drûnkerekî, bi nexweşiyeke giran nesaxketî, xewneke gelek ecêb dîti bû . Wî bawer dikir ko li ber mirinê ye û didît ko li pêş çavên wî aleke mezin ji perçeyên qumaşan hevedudanî yên ko wî ji kirîyarên xwe dizî bû, dihate pehn kirin û destekî veşartî ew dida palandin .

Di vê demê bixwe de ew veciniqî û ji xewê hişyar bû , bi xwehdaneke cemidî şilbûyî .

Drûnker , vê xewnê mîna işareteke wicdana xwe hesiband û wehd kir heke ji nesaxiya xwe xelas bû xebata xwe bi dilpakî bîne cih û dest ji diziyê bikişîne . Saxbûna wî dereng ne ma û herwekî ew ji xwe ne ewle bû , wî gote yekî xebatkerên xwe her cara ko ew desteke cil diqusîne bila ew pirsa alê bîne bîra wî .

Mêrikê me , wexteke dirêj , qedrê wehda xwe girt . Lê rojekê ko wî ji qumaşeke hêja desteke cil diqusandin , pêşiya berbarekî hinde giran xwe sist kir, û jê perçeyek da alîkî .

Xebatker , bêfeyde pirîcaran pirsa alê anî bîra wî . Dawî drûnker jê re got :

— Tu bi ala xwe bihna min teng dikî . Ji xwe di wê ko min di xewna xwe de dît qûmaşek ji vî rengî tune bû .

---

## Kurê Çêtir

Ticarekî navdar ji Babilê di Hindistanê de miri bû . Wî dû kurên xwe kiri bûn mîratxwerên xwe binîvî , piştî ko xweha wan da bû mêr û diyariyek ji sih hezar zêran hevedudanî , hişti bû ji bona kurê ko dê bête hikim kirin ko ji bavê xwe bêtir hez bike . Yê mezin ji bavê xwe re tirbek da ava kirin . Yê piçûk ji parmîrata xwe birek da xweha xwe .

Xelkê digot :" Yê ko ji bavê bêtir hez dike yê mezin e. Yê piçûk pirtir hejî xweha xwe dike . Sih hezar zêr ji mezin re ne. Zadig pey hev her du kur anîn ba û wî ji mezin re got : "Bavê me , qet ne mir, ew ji nesaxiya xwe ya dawîn xelas bû û vedigere Babilê." Xort lê vegerand ;"Pesn ji Xwedê re , lêbelê ewe tirbek ko ji min re gelek biha hat . "

Zadig, di pişt re ev peyiv bixwe yê piçûk. Wî lê vegerand :" Ez ê hemiyên ko min hene vegerînim bavê xwe , lê ez hêvî dikim tiştê ko min daye xweha xwe bila jê ra bimîne ."

Zadig got ê : — Hon tiştekî venagerînin , û sih hezar zêr jî ji we re ne . Hon in yê ko ji bavê xwe bêtir hez dike .

---

Xebata mûrî enbaran tejî dike , serê wala jê çi seh dike
Dinya gulek e , bihn ke bide hevalê xwe .

Bexçevan û Seyda

Bexçevanê qenc hejî hemî giya , gulçîçek û darên bexça xwe dike û bala xwe dide wan . Ew ji bona her yekê ji wan cihê jê re qenctir dineqîne û li gora hewcedariyê wan dihemîne . Ew erdê ji, ji geleyehên xirab paqij dike, avê dide heşînatî û gulçîçekan . Seydayê qenc jî wilo ye . Ew bala xwe na de tenê zanînê , lêbelê ew bi rabûn û rûniştina zaroyên ko teslîmî wî kirine mijûl dibe . Zaro hemî li ber dilê wî şîrîn in û mîna ko bi giyayên nûgehiştî tête emel kirin , bi nermî bi wan re dide distîne . Lê herwekî wî qenc guh daye wan, ew wan xweş nas dike , ew dizane ko ji bona hina gotinek bes e , hinên din hene ko divê gohê wan bête kişandin û hinên dîtir ko bê hinik êşandinê na yên ser rê .Dersên wî zaroyan hişyar dikin û wan digihînin zanînê . Ew bi şîretê xwe yên qîmetdar çavên zaroyan vedike, ji wan re şanî reyên rastî û qenciyê dide . Bi gotinekê bi destê seyda zaro dibin mêr , mêrinê qenc .

---

Heta mirinê çav li kirinê . Me de ser pirê nemerdan ,bila av te bibe . Dilê tirsok sînga gewr na bîne . Xwedê li çiyê dinêre û paşî berfê lê dide dahatin . Ga dimire jê çerm dimîne , mirov dimire jê nav dimîne .

---

Şever li Pragê

Gava Frensizan bi ser Bohemyayê de girt , Kolonêl Şever fermandariya segmanan dikirin yên ko diviya bûn hilkişin bedenên keleha Pragê . Wî serjanên xwe gihandin hev û gote wan :" Hevalên min , hon hemî mêrxas in , lê niho ji min re mêrxasekî mêrxasan divê ye ko qesabê mêran e .

Di piştre , rûyê xwe da serjan Paskal , ji segmanên Elsasê û got ê : " Eve ev mêrxas ...Hevalo , yê pêşîn tu hildikişî ,ez ê bidim pey te .

– Belê Kolonelê min . Gava tu ê bigehî serê bedenê , nobetdar wê ban bike :" Wardo " Tu lê venagerînî.

– Belê Kolonelê min . Ew ê bi tifinga xwe derbekê bavêje û berik li te na keve .

– Belê Kolonelê min . Tu ê derbek bavêjî û wî bikujî .

– Belê ; Kolonelê min .

Her tişt mîna ko wî goti bû qewimîn . Paskal û Şevre yên pêşîn ketin hindurê bajêr .

---

ŞÎR NÎVÎŞK PENÎR

Em şîrî ji çêlek , ganêş , û ji pezan distînin. Şîr pêxwarineke gelek çak e û birhê dide mirovan . Nîvîşk jê derdikeve . Gava şîr dikele û sar dibe rûyê şîr tok digire . Şîrî dikelînin , hêvên dikin dibe mast . Mastî têxin meşkê de , dikeyînin dibe dew ,ji wî dewî nîvîşk çêdibe . Gava dixwazin rûn çêkin , nîvîşkî li ser agir dihelînin,xwey dikin dibe rûn .

Ji şîrî , bê kelandin jî nîvîşk dikare bête çêkirin. Şîr donzde saetan legenan da bête berdan ,nîvîşkê tê de şiklê qrêmê de li ser rûyê wî dicive , ew qrem tê standin û keyandin û pê ,ava wî ya te de , jê vediqete û qrem dibe nîvîşk, ev nîvîşk , bi ava sar xweş tête şûştin û tête dayin ser sifrê .

Şîr bê kelandin bi hêwên an havên dibe penîr . Ji ava şîrê penîr , lûlik çêdibe .

Pirsên hînkirinê

1° Şîr ji kîjan heywanan çêdibe ? Nîvîşk çi ye ? Rûn çi ye ?
2° Dew ji çi çêdibe ?
3° Penîr çawan çêdibe ?

## BIHN GIRTIN Û BERDAN

Destê xwe deyne ser sîngê xwe, tu dihesî ko singê te bilind û nizm dibe. Ev her du qelq yên bihngirtin û bihnberdanê ne.

Gava sing bilind dibe ji dev û difnê hewa diçe kezebê û gava nizm dibe jê derdikeve. Kezeb di aliyê çep û rastê dilî de ye. Sing nîzîkahî ve bi kezebê tejî ye. Gava dikeve kezebê rasta xwînê tê û wê paqij dike.

Ew hewayê ko ketiye kezeba me de zûka kevin dibe, xwîna me êdî pê paqij na be, ji ber vê yekê singê me nizm dibe û ew hewayê pêemelkirî derdikeve û ji nû ve singê me bilind dibe û hewayê paqij dikeve hindurê kezebê. Dona dinê bi hewayî girtiye, hewayê deşt û çiyan ji yê bajaran xweştir û bijûntir e.

Gava xelk di mezelekê de rûdinin û pencereyên wê digirin hewayê mezelê kevin û nexweş dibe, mirov êdî ni karin hewayê paqij jê bistînin. Divê pencereyên mezelê têne vekirin da ko ji nû ve hewayê paqij bikeve hindur. Hewayê bihnî û nexweş mîna jehrek e.

### Pirsên Hînkirinê

1° Singê te diqeliqe ? Gelo singê te çire bilind û nizm dibe ?
2° Kezeba me bi çi tête şûştin ?
3° Di dora dinê de çi heye ?
4° Hewa kengê kevin dibe ?
5° Ko hewayê mezelê kevin bûye tu çi dikî ?

---

## DIHNDANA CENDEKÎ

Gava hon destên xwe datînin ser zend, sing an serê xwe hon seh dikin ko di binde tiştekî hişk hene, ew hestî ne. Hestî bi goşt kiraskirî ye û jê lemlateyên cendekê me peyda dibin, û bi wan lebatên me diqeliqin.

Gava hon destê xwe ê rastî didin milê xwe lemlateyê baskî digehe hev û wisan destê we digehe milê we. Bi dihndana cendekî lemlateyên bedenê zexımtir dibin.

Ran û teşkên mirovên birêveçûyî ji ên rûniştker xurtir dibin. Heke hon ji zexmiya bedena xwe hez dikin, dest bi dihndana cendekî bikin.

Bezîn, bireveçûn, melevanî, cotikî û lotikî, nêçîrvanî ji bo dihndana cendekê me gelek qenc û bikêrhatî ne. Di dihndana cendekî de, di her xwendegahê de, zanîndayekî gelek li kar e.

Zarono ... bala xwe bidin cendekê xwe, da ko sibe laşê we xurt û qaim be.

### Pirsên Hînkirinê

1° Hestî çi ye ? Lemlate çi ye ?
2° Dihndana cendekî çi ye ?
3° Em çawa dikarin xurt bibin ?
4° Navên lehîstokên ko tu dizanî bibêje ?

---

Şûr qalanê xwe na bire. Diza ji diza dizî, erd û ezman lê derizî.
Merşekî yekî ber avê çû, got : " Bila xêra dê û bavê min be."
Mizgîniyê dane kerê, go :" Dehşek ji te re bû ! " Got :" Êmê min kêm bû, barê min zêde bû. " Gur bi du pariya na mire.
Hezar dost kêm in, dijminek pir e. Her tişt bi zravî dişkê, mirov bi stûrî.

## ÇAWA DIVÊ EM XWARINÊ BICÛN ?

Xwarinên em dixwin bi diranêb ko di devê me de ne têne cûtin û pelixandin û bi tifê şil dibin . Piştî cûtin û pelixandinê ew tên daqurtandin û bi xwe diçin berukeke mezin ya ko di hindurê bedene me de ye û bi mîde ango hûrî navlêkirî ye . Xwarinên ko wisa digehin hûriyê hêdî dihelin û dibin wek awarê . Em bi vê awarê têr dibin û tên xweyî kirin .

Çêbûna awarê ji xwarinan hel e . Hin tiştên xwarinê di hûriyê de zûka hel dibin , weke şîr , hêk, zeytê masî û ji wan re zûhel dibêjin ê û hin tiştên xwarinê di hûriyê de zehf dimînin , giran in , dereng hel dibin weke garis , ji wan re derenghel tê gotin .

Çiqas ji me bêt divê em tiştên zûhel bixwin . Xwarinên derenghel hûroya me diwestînin û ji westabûna hûriyê gelek nesaxî çêdibin .

Heke em saxî û xurtiya hûriya xwe dixwazin divê em pariyên xwe di devê xwe de 70 û heta 80 caran bicûn û wan bikin mîna hevîrê nerm . Wilo xwarin di devê me de bi tifê dibe weke hevîrî û paşê bi sivikahî tête daqurtandin .

Pariyên ko di devê me de xweş ne hatine cûtin û çûne xwar hûriyê diwestînin û hûrî pê nesax dikeve .

Divê em ji bîra ne kin ko hûriya her roj çar , pênc caran dixebite, na be ko em wê bê rê biteibînin .

Heftî , heştî salan em hewcedarê wê ne . Mirovên lezxwer hûriya xwe zû diwestînin û xira dikin ji ber ko hûriya me ji gelekiya xwarin û vexwarinê jî elemî dibe .

Ava xwe jî hêdî , hêdî vexwin da ko pê hewa me keve hûriya we û we me êşîne .

---

## Pakdilî

Bavê Waşington gelek bala xwe dida terbiya kûrê xwe û ew dişidand her cara ko kêmasiyek lê didît . Wî nemaze dixwest kurê xwe bike mirovekî rastdil . Lawik biherawayî bi ya bavê xwe dikir û çîroka jêrîn pakdiliya kurikî şanî me dide .

Rojekê , Waşingtonê piçûk , ew wê demê hêj şeş salî bû , bi bivirê xwe dareke gilyasê ,ji texlîteke kêndîtî ko bavê wî gelek giranbiha dihesiband , birî .

Dotira rojê gava çavê bavê wî bi darê ket û wî dît ko dar hate xira kirin gelek enirî . Wî qîr kir û got :" Kesê ko ev tişt kir heke dikeve destê min ez ê wî bikujim . Lawik lê bû û tirsiyayî li bavê xwe dinêrî û dilerizî . Di dema ko wî seh kir , seba vê darê yekî bêsûç dikare bête êşandin , gote bavê xwe :" Bavo..: yê ko ev tişt kir , ez im ," Bihnekê , bavê wî ma heyirî. Lê wî zûka rastdilî û camêriya kurê xwe seh kir, wî ew kişand ser pêsîra xwe û got ê :" Lawo ...pakdiliya te ji hezar darên wilo hêjatir e". Ew Waşingtonê piçûk dawî bûyê serdarê welatê xwe û wî ew gihand azahî û biserxwebûnê .

---

Serê du beranan du beroşkî de naye kelandin . Dest hilandin fereca xêrê ye.
Ko te girt , bermede , eger te berda , pey me keve .
Yê tazî bû di kewarê de digot jina xwe :" Zirav birêse ! "
Mirî ne melûn be , gor lê teng na be . Qubê spî giş ne ziyaret in .

Mar û Mirov

Mirovek , rojeke biharê , li çolê digeriya û bihna xwe dida .Ji nişka ve di kêleka rêlekê de, dengek guh lê bû . Yekî dikir hawar. Mirov ber bi hindava dengî ve çû û piştî ko wî li rêlê çepda wî dît ko marekî mezin di bin kevirekî gir de difetisî . Marî gazî wî kir û got ê :

– Ey lawo....ez bextê te û Xwedê me ...di bin barê vî kevirê xedar de bihna min diçike , ez ê bimirim. Ez bavê heft zaroya me , jina min jî nesax e, were vî kevirî rake û min xelas ke .

Mirov bi henî xurtiya xwe singê xwe da kevirî û bi dişwarî ew kevirê mezin wergêra û mêr pê bihna xwe da . Mirov bêî ko li heviya spasên marî bisekine dikir here rêya xwe lê mar rabû ser zikê xwe û dirêjî mirovî kir .

Mirov şaşmî bû û gote marî :

– Maro ...heyran..ma wilo ye ?.....min ti ji mirinê xelas kirî û ti dixwazî bi min vedî ? ...

Marî lê vegerand û got :

– Bo çi tu wisa heyirî ?...ma em ji mêj ve ,ji bav û kalan û hetahetayê ne dijminên hev in ?...

Miron kenî û got ê :

– Çîroka ko tu dibêjî gelek kevn e, kevnare ye, me ew ji mêj ve ji bîra kiriye .

Marî bersîva wî bi vî awayî da :

– Heke we mirovan ew ji bîra kir , eve ez tînim bîra te.

Mirovî lê vegerand û got ê :

– No heyran...wilo na be .Bila em, her du, herin û li qadiyekî bigerin û li gora qerara wî bikin .

Mirov zmanxweş bû û dawî dilê mêr tejî kirin ko her du divê herin û li qadiyekî bigerin . Her du, der tenişta hev, dan rê .Dinya mij û moran bû , çar alî ne dihatin dîtin .Mar û mirov ,wextekî li peydekirina qadiyekî geriyan û dawî di nav devîyan de çavên wan li roviyekî ketin. Her duwan banî rovî kir .Rovî ber bi wan ve hat û gava wî mar û mirov pev re dîtin ,wî ji vê hevalreyê dev vekirî ma û gote xwe : " Dûnahûka dinyayê nîzik bûye . "

Her du silav li rovî kir û piştî ko hal û xatir pirsîn, mirovî pirsa xwe danî pêş rovî . Rovî gote wan :

– Heke min divê li ser vê doz û dehwayê qerarekê bidim, divê ez cihê ko ev bûyer qewimiye bibînim .

Mêr qailiya xwe pê anî ,her sê ketin rê û hatin pêş kevirê gir .

Rovî gote wan :

– Ez tiştê çêbûyî, divê ji nû ve ji bona min çêkin da ko ez bikarin qerara xwe , bi rastî û li gora rêz û rêzikên kal û kalikên xwe bidim û ew ber bi marî ve zivirî û got ê :

– Tu xwe dane cihê ko mirov te lê dîtiye .Mêr tiştê ko rovî got ê anî cih .Dû wî rovî got mirovî :

– Tu jî, wî kevirî weke berî ve lê ke .Mirovî welê kir. Rovî nema deyn dikir , qey keti bû texminîne kûr. Marî got rovî :

– Mîrza Qadî lezê bide qerara xwe, ez ji nû ve di bin vî kevirê giran de difetisim . Rovî gote mirovî :

– Careke din destê xwe me de wî kevirî . Rovî û mirov da rê û piştî bihnekê hawara marî ne dihate bihîstin .

---

Rih dibe bost, dijmin na be dost . Çi bostek çi çar tilî .

## Gur Çawan Tirsiye

Rojekê malan bar kir . Li dewsa wan man kerek ,dîkek û beranek.Kevroşkeke biyanî jî hate gihaşte wan û her çar di nav wergehî de çêriyan .Du gur , bi wan hesiyan û , hatin nîzîkî li wan kirin û dîtin ko her çar diçêrin . Yekî gote yê din :

– Tu bila li vir li çavnêrîyê bimîne , ez ê herim yekî ji wan bikujim, têr bixwim, paşê tu jî herî yekî ji xwe re bikujî û têr bixwî.Hevalê wî got ê: " Erê , rind e, bes xwe bilezîne da ko dora min jî zûka bê,ez jî gelek birçî me.

Gurê pêşîn berê xwe da heywanan û wextê ber bi kerê çû û dikir direjî wî bike , kerî serê wî kir nav lingên xwe û givaşt . Beran xwe lezan hat bi qoçan lê da .Kevroşk gava ew dît, baz da çû. Dîk, qet hay pê tune bû,nikilê xwe li erdê dixist ,ji xwe re kurm dixwarin . Dawî , gur bi zehmet ji destê ker û beran xelas bû , lezê da xwe , revî çû gihaşt hevalê xwe .

Hevalê wî jê pirsî : – Te çawan kir ?

Wî lê vegerand û got ê :– Min çawan kir ? Ez wexta çûm û giham wan , yekî serê min kir nav du daran , yek hate min bi du gopalan , yekî tirba min dikola , yekî jî hawarê dibir malan.

Gurê din jî tirsiya û eydî her du nîzîkî ker , dîk û beranî ne bûn û ji vê derê revîn .

## Heşînatî ;

Heşînatî giya ne û em wan pehtî û ne pehtî dixwin . Fêkî jî mîna heşînatiyê ne lê ew şîrîn in .

Heşînatî bi goşt têne xwarin .Dihndana wan ne bi qasî goştî ye, ji lewre divê gelek bêne xwarin . Welatê me de her texlît heşînatiyine tamdar hene weke bacanê sor û reş , fesûlî , bamî , baqil , kertol , binerd, binsêv, gêzer, silk , şêlim ,kelem , xiyar , turûzî , ecemî , qulind ,pîvaz , sîr, sîrik , soryaz , stirik , kerenk , kerekzer ,mend , pûnk ,helîz , bîk .

Hin heşînatî hene yên ko hişk jî bi tam in ,mîna fesûlî, baqil ,nîzk , bamî , maşik .

Meywe jî gelek hêja ne û nemaze zaroyan divê zehf fêkî bixwin ,lê belê ne fêkiyên xav û ne jî fêkiyên ne şuştî .

---

## GENIM ARD NAN

Coţkar bi haletê xwe zeviyê dajo , genimî direşîne û ew tov bi gîsin binax dibe . Tovê genimî di erdê hêmî de heşîn dibe .

Ji tovî ra û bistî derdikeve . Ra diçe bin axê de û bistî derdikeve ji derve . Tenişta bistiyê de pel hene . Gulanê de bistî ûşî dide, carna di ûşiyekî de heta sed liv hene . Di havînê de gava genim zer dibe û digehe dirûnê , bi dasê an bi mekîna dirûnê tête dirûn, ev paleyî ye .

Paşê wî tînin benderê û wî gêre dikin pê genim ji ûşiyan dawerihe û bi milheban tête dêran û wilo livên genimî ji kayê dûr dibin. Ev tişt bi mekînan jî çêdibe û mekîneyên gêrekirinê vî karî zûtir û paqijtir pêk tînin . Bi aşî genim tê hêrandin û ard dibe , ard tête bêjinkirin û pa jê xelas dibe .

Nanpêj ardî bi av û xweyê hevîr dike û hevîrtirşikî davêje nav hevîrî . Hevîrtirşik hevîrekî kevn e ,bi wî nan dipilpixe , dinepixe û sivik dibe . Wî hevîrî di sêl , tenûr an firnê de dipêjin û holî hevîr dibe nan .

Nan ko hon her ro bi dilxwazî dixwin bi vî awayî çêdibe. Tucara ne be ko hon nanî bavêjin , bizanin ko gelek mirovin hene hewcedarî wî ne lê ni karin wî peyda bikin .

Pirsên Hînkirinê

1° Bi çi hesincawî erd têtе ajotin ? Bi hesincawî tov têne bin ax kirin ?
2° Tovê genimê çawan heşîn dibe ?
3° Bi çi hesincawî genimî didûrin ? Genimî çire gêre dikin ?
4° Bi aşî ji genimî çi çêdibe ?
5° Nan çawa tê çêkirin ? Ko hevîrtirşkî ne êxin hevîrî çi çêdibe ? Firneyê çawan germ dikin ?

---

## Çîroka Pariyekî Nan

Gava hon xweş xebitîne û leyistîne hon westa dibin û birçî ne û bi xwarinê têne ser xwe . Dibe ko hon ni zanin ,lê hon bi nan û xwarinê xurt û mezin dibin . Heke hon na xwin , hon zû meûz dibin û dikevin .

Pariyê nanê ko dikeve devê we de , hon bi diranan dicûn û bi şila - tiya devî wî şil dikin , paşî ew diçe hûriya we , têde bi tirşava hûriyê têtе hêran û jê diçe rûviyan . Di rûviyan de dibe weke avgoştеke zelal . Ji wê avê xwîn çêdibe û lebatên me pê tên xweyî kirin . Bermayiyên xwarin û vexwarinan ên nebikêrhatî ji her du rêyên laşê me derdikevin û bedena me jê xelas dibin .

Zaroyên delal, li destên xwe binêrin ,di bin çermê we de rêzên heşîn hene . Ev rêz ra ne û tejî xwîn in . Xwîn cendekê me de bi jenîna dilî digere . Destê xwe deynin ser singê xwe , li milê çepê ve hon wê seh bikin çawa dil xwe dijenîne .

Pirsên Hînkirinê

1° Hon kengî birçî dibin ?
2° Hon çire xwarinê dixwin ?
3° Kengî dilê we na çe xwarinê ?
4° Parî ji devê we diçe kû ?
5° Hon bi diranan çi dikin ?
6° Xwîn çi ye ?
7° Dil li kû ye ?

---

## TIŞTÊN XWARINÊ

Em nanî bi goşt û heşînatiyê dixwin . Nan bi şîr û mast û penîr û bi fêkiyan û bi nivîşk û hingivî jî zehf xweş e .

Goştê teyrê kedî jî têne xwarin , goştê wan sivik e .Keleba, mirîşk, werdek , qaz , elo-elo , kevok ji teyrê kedî ne. Qaz û werdek ji avê hez dikin û piraniya wextê xwe an di nav avê de, an di teniştа wê de diborînin, teyrên mayin ne heweskarên avê ne û ji wan teyran bi tenê kevok ji firînê hez dikin .

Goştên teyrê kovî mîna kew, qutefir, reşêle , bet jî gelek tamdar e. Nêçîrvan diçin nêçîra wan û ew digirin an bi tifingan dikujin .

Hin goştên heywanên kovî jî têne xwarin mîna kevroşk, pezkûvî, şivin, xezal .

Em goştê masiyan jî dixwin , weke cew, marmasî ,masiyê zer ,masiyê reş.

Heşînatiyên ko em dixwin pirtexlît in , mîna kereng ,pîvaz , sîr , sîrik, soryaz , bacanê sor û reş , pirpar ,silk , parim , kurît, sipî , çîriş, çorî , guhbizin , ket , kulind , mend , heliz , gêzer ,binerdî , siyanbo , qaşim , sopelî .

Sêv , karçik , hejîr ,hinar , tû ,tirî , zebeş , gindor ; dihmik , hilû , mişmiş , zerdelû , enanas , xurme , moz , pirtiqal ,menge ,gilyas, gilyastirş , meywe ne .

Kurd zehf fêkî dixwin , fêkî ji bona laş û xwîna me derman e, pê bedena me xurt dibe û bihna me vedibe .

Pirsên Hînkirinê

1° Em goştê kîjan heywanan dixwin ?
2° Navên teyrên kedî bibêje ?
3° Navê heşînatiyên ko tu dizanî bihejmêre ?
4° Sêv çawa ye ? Zebeş çawa ye ? Tirî çawa ye ?
5° Navê çend texlît tiriyan nas dikî ?

## XWÊ

Xwê ji çiyayên têrxwê an ji ava şor tête derxistin . Çiyayin hene ko tê de xwê mîna kevirên mezin têne peyda kirin . Ava behrê ne tamxweş e , şor e , lewma ko tê de xwê heye . Di peravên behrê de , li ser tehtan xwêçeker çavikan ji ava behrê tejî dikin , bi germiya rojê û hewa, av hêlim dibe û xwê tê de , di wan çavikan de , dimîne , lê ew xweyê hêj tehl e , bi hin dermanan xwê têtе desteber kirin û pê xweyê paqij û spî û tamdar çêdibe .

Welatê me de xwê piranî ji ava şor , ya ko di nîzikî çem û robaran de peyda dibe têtе çêkirin .

Cihê ava şor dikolin û dikin bêrim û bîrik û vedidin.Ji rex û bînê bêrim û bîrikan ava şor derdikeve û ew çal tejî dibin .Dora bêrim û bîrikan dikin male , malek wê ava şor ji wan bêrim û bîrikan dertêxin û têxin di wan malekan de , ji wan malekan re benderên xwê tê gotin . Av hêdî hêdî didawerive, diçe û telpa wê dimîne û hişk dibe û dibe xwê .

Pirsên Hînkirinê

1° Xwê ji çi tê derêxistin ?
2° Ava behrê çiro şor e ?
3° Bêrim çi ye , malek çi ye , benderê xwê çi ye ?
4° Telpa ava şor çawan xwê dibe ?

Lo şivano, lo, lo şivano, dil bi kulo, dil kovano !
Navê şivanê'm Elî ye , pez berda dora gelî ye .
Lo şivano, lo, lo şivano, dil bi kulo dil kovano !

Bilûra şivanêm zeytûn e, pir bedew û şikil çûne ,
Bi wî dengê xwe yê xweş e, di bilûrê de dixûne .
Lo şivano, lo, lo şivano , dil bi kulo, dil kovano !
Lê keçikê , lê bedewê ,navzirav û laşqelewê !
Gava çavêm pê dikeve , na razim ez roj û şevê .
Çavên te î di reş kuştim , ax û eman gidiyano !

Ereb Şemo (Şivanê Kurd,)

## Cotkar û Rovî

Cotkar hero diçû zeviya xwe radikir . Roviyek jî dihate ba wî nan dixwar . Rojekê rovî dît cotkar qayişa xwe li kû derê vedişêre . Wexta cotkar çû ,pey wî rovî hat , qayişa cotkar hilda û anî teslîmî deya xwe kir û got ê : – Vê qayişê hilîne ,ev rojekê bi kêrî me dê bê .

Sibetirê , cotkar hat zeviyê û li qayişa xwe geriya û dît ko qayiş ne di cihê xwe de ye . Cotkar fikirî , fikirî û ji xwe re got : Tê de hîç şik nîne , rovî qayiş biriye . " Vê çaxê kerek hat ba cotkar û jê re got : – Cotkaro , tu şire difikirî ?
Wî lê vegerand :
– Ma ez nę fikirim , kî bifikire . Qayişa min rovî dizî . Ez nema dizanim çawan bikim . . Kerê got ê :
– Wekî ez qayişa te bînim û bidime te ,tu ê min bixwedî bikî ?
Cotkar got ê :
– Tu wê bîne , ez ê te bixwedî bikim .

Wexta tarî ket erdê , ker çû ber bi qula rovî û li ber vê xwe terkemirarî avêt .Dotira rojê rovî rabû , wexta derdiket ji derve dît ko ecêbeke giran qewimî...ye .Kerek li ber deriyê wî gever bûye.Ew vegeriya mal û gote ehlên xwe :
– Werin , werin alî min , kerek gever bûye , werin em cendekê wê bînin hindur . Gava rovî bihîst gote deya xwe :
– Ya dê , tê bîra te qayişa ko; min ew roj anî , de kerem ke wê bîne, ez ê wê bavêjim nava xwe û pê kerê kaş bikim û bînim hindur ; Gava rovî qayiş avêt nava xwe û stukira kerê , ker ji nişkave rabû û baz da û ker û rovî pê ve kaş bûn heta ba cotkar .

Cotkar qayişa xwe ji stukira kerê û ji nava rovî vekir û pê rind li rovî xist . Rovî bi dişwarî ji destê cotkar felitî . Heçî ker ma ba cotkar û eydî ne çû tu cihan .

---

## Masîvan û Masiyê Piçûk

Masiyekî piçûk , di nav avê de bi dilxweşî sobayî dikir û herwekî deya wî jê re goti bû nîzikî bejê ne dihat . Rojekê hevalkî wî jê re got:
– Tu çire devê xwe na vêjî tiştên tamdar yên qeyarên avê .
Wî lê vegerand :
– Ez bi ya deya xwe dikim , wê gote min ko li ser qeyarên avê mirovin hene û ew li girtin û kuştina me digerin .

Masiyê ko xwe gelek eqilmend dihesiband lê vegerand :
– De, li min binêre , ez ê niho nîzikî li bejê bikim û xwarineke qenc têxim devê xwe . Masiyê din got ê :
– Dev jê berde , ne hewce ye ko tu vê bikî , heke masîvan tu girtî xelasbûn zehmet e .
– No , lo...masîvan kengê min digire , tu ê niho bibînî ...

Pir ne borî masîvanek ew girt .

Herwekî masiyê piçûk xwe gelek bi fen dihesiband gote wî :
– Masîvano , te ez girtim...lê binêre min , min goşt nîne, heyf e ko; tu min bikujî . Mirov lê vegerand :
– Rast e , tu ne gelek bi goşt î ,lê çi jî be masiyek î ,masiya pêşîn ko min îro girt . Masî got ê :
– Ji min bigere , min bavêje avê , ez ê rojekê bibim masiyekî mezin hingî tu ê min bigirî û ez ê wê rojê bi kêrî te bêm.Firaxê te bi goştî tejî bikim.

Ji xwe di vê avê de masiyine mezin zehf in . Mirov lê vegerand :
– Tu xweş dibêjî , devê te tejî gotin e ,lê tu hisabê tiştekî na kî.Gelo sibe ko tu mezin bûyî nîzikî vê derê bê , tu jî mîna masiyên mezin yên din dûrî bejê bibî , ew li hênceteke din digeriya , lê masîvan li serê wî da , ew kuşt û danî alîkî .

---

## N Ê Ç Î R V A N
### Çîrokeke Kurdî

Rojekê , hirç , rovî , dîk ,mirîşk bi kevokê ve diçin şkeftekê, pev re daxêvin û ji hev re dibêjin " Em ê bibin destbrayên hev . "Hemî qîma xwe pê tînin .

Pey vê yekê , hirç dibêje rovî :" Bra ,ez birçî me , dermanekî bike."

Rovî dibêje :" Ez rovî me , siyarekî çilapî me, na yeme xwarin." Hirç ji dîk dipirse û dibêje :" Dermanê me na be , em ê çawa bikin ?Dîk dibêje :" Ez dîk im,li ser kundir im na yême xwarin." Hirç îca dibêje mirîşkê :" Lê em çawan bikin ?" Mirîşk dibêje :"Ez mirîşk im, nan û hevrîşk im, na yême xwarin ." Hirç paşê dibêje kevokê :" De, tu bêje..." Kevok lê vedigerîne û dibêje :" Ez kevok im, kew im , nan û dew im,na yême xwarin."

Piştî axaftina kevokê , hemî li hirçê dinêrîn. Hirç dibêje :
– Çire hon li min dinêrin ,ez hirç im, tevda pirç im ,na yême xwarin .

Wextek dibore .Kes devê xwe venake , Hemî mitalan dikin.Rovî ji hirçê re dibêje ;" Bra, te qet nan û dew xwarine ?" Hirç dibêje :" No..."
– Ay , mala te ava be, ma ji nan û dew xweştir hene ?
Her du destpêdikin kevokê dixwin .
Hirç piştî xwarine kevokê dibêje rovî :
– Bra ez birçî me ...
– Bra te qet nan û hevrîşk xwarine ?
– No ...
– Mala te ava be , weke nan û hevrîşk xweştir tune .
Ew digihêjine mirîşkê , wê jî dixwin .
Hirç dîsa dibêje :
– Lanet li vî halî , lê bra rastiyê bêje , ma em ne birçî ne ?
Rovî serê xwe dihejîne û dibêje :
– Bra te hîç nan û kundir xwarine ?
Hirç lê vedigerîne :
– No ...
– Wa , mala te ava be , qe ji kundir xweştir qet bawer nekî ko tiştek çêtir di dinyayê de hebe...
Ew radibin dîk jî dixwin .

Eydî bitenê hirç û rovî dimînin . Hirç dibêje rovî :
– Bra, ez tî me , ez çawan tî me ...
Rovî lê vedigerîne :
– Bra, av heye , lê heqe wê çawek e. Herge tu çavekî bidî wê avê bidin, herge na dî , na din .
Hirç gelek difikire , lê gava dibîne ko çare na be ,çavekî xwe dide rovî, da ko ew avê bîne .
Rovî diçe şerbikek av tîne û tê. Hirç bi vê şerbikê têr na be, dibêje rovî:
– Bra, ez tihn im, bra ez ecêb tihn im. bra ez ê çawan bikim ?
Rovî lê vedigerîne :
– Çavê din jî bide, da ko têra xwe avê vexwî , an ne , bê çav avê na din.

Hirç çavê xwe dinê jî derdixe û dide rovî . Rovî diçe , şerbikeke din av tîne û jê re dide . Hirç vê derbê jî tî dimîne , têr av venexwariye, û dibêje rovî :

– Bra , ez tihn in ....

Rovî lê vedigerîne :

– Bra , derman nîne , bide pey min were . Heye ko gava xelk dê bibînin ko tu kor î li te bên rehmê û avê bidine te .

Rovî dide pêşiyê , hirç dide pey , her du dikevin rê .Rovî bi fen bû , rê zanî bû , lê hirç kor bû ,rênezan bû . Rovî çû ser serê zinarekî sekinî û reya zinêr de hêdîka daket û gazî hirçê kir :

– Lê , hirçê , rast bi rast pey min were ...Hirçê pirsî :

– Bra rê rast e ?

Rovî lê vegerand :

– Rast e , ne tirse , bimeşe ...

Wexta hirç giha serê zinêr û pe yê xwe avêt da ko pêş ve here zinêr de belabela bû , çû , gever bû . Rovî lê vegeriya da ko goştê wê bixwe . Wî devê xwe avêt hêta wê , lê hema vê çaxê nêçîrvanek lê der hat. Rovî kir bireve , lê eydî wext dereng bû , tîra nêçîrvan ew wergerand ser kêlekekê , li rex hirçê rovî dirêj bû .

Nêçîrvan gihaşte wan , zikê her diwan qelaştin , dîk , mirîşk, û kevok saxesax ji zikên hirç û rovî derxistin .

Her sê gelek şa bûn û eydî ne çûn çolê . Nêçîrvan jî , ji vê rojê bi şunda mirîşk , dîk û kevok hînî xwe kirin û ew her sê heywan bûn heywanên kedî .

---

Ji rovî zexeltir nîne , li sûkan ji eyarê wî bêtir nîne .
Methelokeke Kurdî

---

MAR Û TIRBA SPÎ
Çîrokek Kurdî

Hebû mirovekî pîr û belengaz . Ew xweduyê çend pezên spî û reş bû . Hero , serê sibehê , di bihna rojê ûya pêşîn de , ew ji mala xwe derdiket , pezên xwe didan ber xwe û diçû çolê heta ko wan biçêrîne.Wî,mirovî xweş pif dikir bilûrê û heta ko wextê xwe biborîne li bilûra xwe dida û stranine zîz û melûl , nexmeyine dilhebîn û hevîndar dileyistin .

Rojekê ew di nav kulîlk û giyan de bi xişexişekê hesiya û halo nêrî û dît ko marekî mezin ber bi wî ve tê .Mar çend gav ber bi wî ve hat lê bi derbekê rawesta , rabû ser dûvê xwe û dest bi dîlanê kir, mar wextekî dirêj bi kêfxweşî reqisî , mîna di dema gulana maran de û dawî vegeriya kuna xwe û jê bi derket û hat pêş şivên û zêrekî zer danî pêş wî. mar û mirov , pir ne borî , fêrî vê lihevhatinê bûn û eydî çi bihar , çi havîn, hero serê sibehê, di wextê xwe de ko marî dengê bilûrê dibihîst, dihat pêş pîrî , bi dilşayî direqisî û piştî vê, wê zêrek didanî pêşiya şivên .

Du sal ne qediya bûn ko şivan bû dewlemend û herwekî ew dîndar bû, rojekê gote xwe :

" Ez bûm dewlemend , min divê , ez herim û mala Xwedê tewaf bikim."

Piştî vê qerarê , mirovî banî kurê xwe kir û hal û hewalê xwe û marî jê re da zanîn û got ê :

– Kurê min , dewlet serî vî marî , em bûn dewlemend . Dotira roja çûna min divê tu di spêdeyê de , pezên me bidî pêş xwe û herî cihê ko min şanî te da û lê li bilûrê pif bikî . Tu ê bibînî ko marekî zêrdil dê bê pêşiya te û ew bi çelengî û nazdarî dê bireqise û piştî qedandina dîlanê ew ê ji te re zêrekî zer wê bîne û deyne ber te . Lê lawo ..we ne be ko tu bi qesda talankirina gencîneya marî wî bikujî .Divê tu xweş bizanî ko heke qeda dê bikeve mala me . Dotira roja ko mêrik berê xwe da Hecê , lawik bi pezan ve çû cihê nîşandayî û dest bi leyistina bilûrê kir . Demeke kurt borî , çavê lawik bi marî ket yê ko ber bi pêş dihat . Mar, herwekî bavê wî jê re goti bû , pêşberî wî de rawesta .Lawikî pifkirina xwe hêj xweştir kir .Marî xwe berda ser xweşiya semayê , mîna levenekî di avê da , weke terhekî li ber bayî xwe dihejand , diket aliyên çep û rastê direqisî , direqisî . Dawî mar vegeriya kuna xwe zêrek anî û danî ber lawik . Mîna ko bavê wî jê re goti bû eydî hero, serê sibehê lawik dihat cihê mêr û li bilûra xwe dixist .

Lê wextekî dirêj ne borî ko xortê me ji marî aciz bû û gote xwe : " Heta kenge ezê xulamîtiya vî marî bikim . Bavê min mirovekî pîr û sist bû, ne çav sor bû , lê ez ciwan im , ez xurtim , ez jêhatî me bi Xwedê ezê vî marî bikujim , gencîneya wî talan bikim û xwe û bavê xwe û dûndanên xwe ji dîlîtiya mêr xelas bikim .

Lawik ko carek qerar da , hema şûrek peyda kir , wî ev şûr kir bin kepeneyê xwe û pezên xwe ve , mîna adtê çû cihê ko, em pê dizanin û dest bi pifkirina bilûra xwe kir .

Mar hat mîna hero , bi dilpakî , sema kir . Lawik mestiya marî firsend dît û bi şûrê xwe li marî da û dûvê marî qetand, lê di vê hengamê de , marî jî pê veda .

Jehra marî gelek xurt bû , lawik di cih de bêhiş ket û ji bîrve çûyî ma , cendekê wî nepixî û ber bi êvarê mir .

Xelkê gund gava dîtin , ko roj çû ava û lawik venegeriya mala xwe, gelek li ber wî ketin û hema bi şev lê geriyan . Wan ew ber bi nîvê şevê peyda kir û herwekî ew kurê mirovekî dewlemend bû , jê re , der cihê ko ew mir, di bin darên bîşengan re , tirbeke spî ava kirin û wan ew te de veşart .

---

Roja vegera heciya hati bû , xelk çûn ser rê pêrgîna wan .Gava bavê lawik , di nav xelkê de , kurê xwe ne dît , di canê xwe de bi êşeke kûr hesiya û di xwe de got :

" Xwedê dizane lawê min bi qurbana sergermiya xwe bûye . "

Bavê reben gelek qehirî , lewma kurê wî li ber dilê wî gelek şîrîn bû . Lê tol vekirin ne hat bîra wî , li nik wî berpirsiyar lawê wî bû . Her çi jî bejê , dotira rojê ew êz dan ber xwe û çû cihê zanî û dest bi leyistina bilûra xwe kir .

Mar ji kuna xwe derket lê nîzikî lê ne kir . Mirovî got :
– Heyran ... çime pêş ve na yî û mîna berê sema na kî, ma em ne hevalên hev in ?.....
Marî lê vegerand û got :
– Heta ko ev tirba spî di pêş çavên te de ye û dûvê min î qetandî der pêş çavên min , eydî di nav bira me de hevalîtî çênabe û marî bêî ko li hêviya bersîva pîrî bimîne , dev jê berda û vegeriya kuna xwe .

---

## HIRÇ Û KEÇIK
### Çîrokeke Ûrisî

Carekê keçik çûne bexçê ji bona fêkiyan bînin . Wan gelek fêkî berhev kirin û nîvro dageriyan mal , lê ew pê ne hesiyan ko yek ji wan kêm e . Bi rê ve , gava pê hesiyan û banî wê kirin kesê li gaziya wan venegerand . Dema ko hatin gund , gotin ehlê wê ko Nûn , navê keçikê Nûn bû , di nav bexça da winda bûye .

Heçî Nûn , berê xwe da bû tenahiyekê û diçû . Ew dawî di nav rêlekê de rastî malekê hat . Wê li derî xist , lê tukes deyn ne kir . Wê derî def da , derî vebû . Nûn ket hindur û li ser kursiyekê rûnişt . Hirçek di vê malê de dima , lê wê gavê ne li mal bû .

.......

Hirç êvarê vegeriya , hat mal . Gava çavên hirçê bi Nûnê ketin, dilê wê gelek şa bû û jê re got :
– Keça delal , meyvana şêrîn tu bi xêr hatî , tu li ser seran û li ser çavan hatî , îca ez na hêlim ko tu herî , tu ê bi min re li vir bimînî."

Keçikê li hirçê venegerand , hema dest bi girînê kir û axîn dikişandin . Lê keçika reben , ew çi dikari bû bike , tiştek ji destê wê ne dihat . Ji xwe keçikeke piçûk û narîn çi dikarî bû pê bike ? Deyn ne kir û di mala hirçê de ma . Hirç hero temamiya rojê diçû nav bexçan û berî ko ji derî derkeve digote keçikê :" Aqil be , malê paqij bike, xwarinê çêke , hilîne deyne û bê destûra min me çe tu deran . Divê tu xweş bala xwe bidî gotina min , heke tu direvî qenc bizane ez te digrim û ko tu girtî ez te dixwim .

Nûnê , ji bêgaviyê , guh dida hirçê lê di dilê xwe de digot gelo reya rev û xelasê li kû ye . Piştî wextekê keçikê ji hirçê re got :
– Lê , hirçê ev çend hefte ne ez dûrî dê û bavê xwe me . Ez dixwazim ji wan re diyariyekê bişînim , gelo tu çi dibêjî ?
Hirçê got ê :
– Xebera te ye , ev tişt dibe . Ez ê diyariya ko tu dixwazî bînim wan .

..........

Dotira rojê keçikê kade lêxistin û selikeke mezin peyda kir û ji hirçê re got :
– Ez ê kadan bikim nava wê selikê , tu ê wê bibî gundê me . Lê na be ko bi rê de wan kadan bixwî . Ez ê hilkişim ser xanî û li te binêrim, me be ko tu destê xwe dirêjî şîraniyan bikî .
Hirçê lê vegerand :
– Ez ê bi ya te bikim .

Keçikê selik anî û danî ber derî û berîya ko hirç ji xênî derkeve ew bi xwe ket nava selikê û kade jî kirin ser xwe .Piştî bîstekê , hirç ji mal derket , selik hilanî da ser pişta xwe û berê xwe da gundê Nûnê û çû .

Hirç meşiya , gelekî meşiya , westiya û ji xwe re got :" Ez ê hinik di bin siha vê darê re rûnim û bila çend kadan bixwim . "

Keçikê ji hindurê selikê deng lê kir û got ê :
– Ez te dibînim , belê ez te dibînim , di bin siha vê darê re rûnene û kadan me xwe .Ma gotin û qerara me çawan bû ...
Hirç bihna xwe dide û dibêje :
– Çi fen e , çi fesal e , li jorê rûniştiye , lewma cihên dûr dibîne .

Hirç selikê dike pişta xwe de , û peş ve diçe . Dinya germ e, rê kaş e , hirç piştî bihnekî, dîsa bi westabûna xwe dihese û ji xwe re dibêje :" Bi Xwedê , ez ê di bin siha vê darê re rûnim û hinik kadan bixwim!"

Keçik ji nava selikê dîsa dengê xwe bilind dike û dibêje :
– Lê ...lê...hirçê , têrpirçê , ma wilo ye , ez te dibînim . Xwedê me ke ko tu rûnî di bin siha vê darê û kadan bixwî ...

Hirç dibêje xwe :" Ma çawan keçik min dibîne , ev çi fen e , çi fesal e , çi bazar e , bi Xwedê li jorê , gelek li jorê rûniştiye , lewma bergehên dûr dibîne .

Hirç dîsa radibe , selik dide ser pişta xwe û dibeze heta ko digehe gundê keçikê . Ew rast bi rast diçe mala dê û bavê Nûnê û li deriyê wan dide .
– Teq , teq , teq , teq , req , teq , derî vekin , derî vekin ,Nûnê ji we re pêşkeşek , kadeyine nerm û germ rêkirine , eve min ew anîn .

Gava seyên malê hirçê dibînin ne yek , ne dido xwe davêji ser hirçê . Hirça tirsiyayî selik ji pişta xwe davêje ber deriyê malê û baz dide ber bi bexçan ve .

Gava bavê Nûnê derî vedike û li selikê dinêre , ew dimîne ecebmayî : Keça wî di nav kadan de rûniştiye û dikene .

..............;

Yê ko dest dike , dê û bav na ke .
Methelokeke Kurdî

---

## Jiyîna Mirovan û Demên Salê

Şahirekî talyanî got :" O ciwanî , bihara jiyînê ... O bihar, ciwaniya salê ... " Gava bihar dadigere , em di pêşiya hişyariya dinyayê ya rastîn in . Her tişt ji nû ve xwedî can dibin , her tişt ji nû ve dest bi livînê dikin . Herçend jî nîşanên ve tevdanê hêj ne kifş in , giya dest bi derketinê , ji axê , dikin , gupik li ser çiqlên daran, bi serê xwe yên hûr î kesk xuya dibin û dikevin jiyîneke nû , çûkên rengereng distirin û dibêjin :" Em lê ne , em lê ne ...."

Ev giyayên nûzayî dê bibin çîmenzarine feyizdar , ev gupikên nazik dê bibin [illegible]iyine tamdar , ew çûk dê hêlînan çêkin û ji wan hêlînan dengbêjine nû wê derkevin .Bi gotinekê , bihar dema comerdiyên hêjnegihayî , dema hêviyên nûzayî ye . û wilo bihar , zarotiya me û ciwaniya pêşîn tîne ber çavên me .

Carina , ne havîn û ne jî payîz daxwaz û hêvîyên me tînin cih. Carina mirov di demên xurtiya jiyîna xwe de tiştên ku xwestî na yêne cih û hêviya hevîdaran dişkînîne . Ji xwe herwekî çav di dema biharê de, li şîrîniya rengên dinyayê dinêre, wiha jî gava mirov li zaroyekî an xortekî mêze dike spehîtiya rûyên wan yên xweşik dibîne . Lê bê guman vebûn û hişyarbûna giyanekî nû, ji hemî bergehên şîrîn hêjatir e .

Havîn heşînatî û kulîlkan belav dike çar aliyên dinyayê , pê di bexçeyan de meywe , li deştan zad , li rezan tirî çêdibin . Ev dema jiyînê ya comerdtir e . Jiyîn di nav xurtiya xwe de qudretdar e . Wiha jî gava mirov digehe navsera jiyîna xwe dikare bike hertiştê hêja ko jê tê . Ev dewra jiyîna wî ya zeximtir e . Hingî ji her wextê bêtir dixebite û xebata wî berine hêja dide .

Payîz , di destpêka xwe de , hêj bi germî û meyweyên xwe , bi reng û roniya xwe , dewlemend e , mîna mirovê ko di destpêka berjêrçûna jiyînê da , wexteke din , xurtî û keyfxweşiya xwe ya berê ji dset bernade.

Lê paşê , di me de , û di dora me de , guhartineke hizindar destpêdike . Rast e ko ew guhartin hêdîka çêdibe . Lê çêbûna wê , meşa wê bê eman e û na yê sekinandin .

Pelên daran diweşin , em ji xurtiya xwe dikevin , tava rojê sist e dibe , mîna berê bi germî û xurtî na biriqe , rojên spehî dibin kêm û daxwaz û xiyalên me yên dawîn ditemirin , herwekî hişê me dibe tarî , Belê ...belê zivistan nîzing e û pîrî li pey me ye . Gava herê du jî tên, berf da tê bi carekî ser erdê û ser eniyên me û herwekî av di çeman de dicemide , xwîn di ranên me de diqerise .

Lê ev li ser hew çûn li vir disekine . Erd piştî mirineke xapînok , ji nû ve dê şîn bibe , ew dê bibe rengereng bi giya û kulîlkan, bi gûl û gulçîçekan , heçî mirov jê re hatina bihareke nû nî ne . Pîrîtî û mirin dê bibiwana du bextreşiyên mezin , heke mirineke qenc , para mêrine qenc ne biwa , mêrên ko di jiyîna xwe de , tiştekî hêja pên anîne .

.................

Berf diçe , çiya dimîne , mirov diçe nav dimîne .
Methelokeke Kurdî

---

## HIRÇ Û DU HEVAL

Du heval , herwekî hewcedarî perah bûn , ji cîranê xwe yekî kurkfiroş xwestin ko ew eyarê hirçekê ji wan bikire .
Kurkfiroş gote wan :
- O ...ez dibînim we hirçek kuşt , pêrûziya min ji we re ...
Wan lê vegerand :
- No , ya rastî hirç hêj dibeze , lê bê şik em wê di vê nîzîkahiyê de dê bikujin . Û we bidîta çi hirçeke mezin...siltana hirçan , ne kêm , ne zeyde , bê şik ko we ew kirî hon wê bi bihayeke giran dê bifroşin , eyarê we laşê mirovan ji sermayên xurtir dê bipareze û hon dikarin ji dêla kurkekê jê du kurkan çêkin .

Piştî vê pesindanê , bihayê eyarî hate birîn ,û her du nêçîrvan wehd dan , di nav du rojan de , eyarî bînin û teslîmî kurkfiroşî bikin.

Nêçîrvanên me dotira rojê dan rê û gihan tenahiyên ko warê hirçê bû . Pir ne borî çavê wan bi hirçê ket , ya ko xwe dilezand û ber bi wan ve dihat . Eve ,mûxasên me ji tirsa di cihê xwe de qey cemidîn, û bazara wan û kurkfiroş yek car ji bîra wan çû . Lez û bez yek hilkişiya ser darekê û yê din , mîna yekî mirî ket erdê û xwe lê pehn kir, çav û bihna xwe girtin, ji ber ko wî carekî bihîsti bû ko hirç dirêjî miriyan na kin .

Hirçê nîzîkî lê kir , dûr û dirêj lê nêrî , ew bihn kir û ji xwe re got :" Xuyaye ji mêj ve miriye , jê bihneke pîs tê .Û li ser vê , hirçê rûyê xwe jê bada û berê xwe da daristanê .

Nêçîrvanê ko hilkişiya bû serê darê jê hate xwar û gote hevalê xwe :
- Hirçê tu, tirsandî , lê siûda te qenc bû , ez bi dilxweşî dibînim , tu xirabiya wê ne giha te . Lê ez didim eqlê xwe bazarê me û kurkfiroş,

eyarê ko sibe an du sibe diviya bû , teslîmî hev bikin . Her du jî keniyan . Yê pêşîn bi ser ve zeyde kir û ji hevalê xwe pirsî :
– Ji serê darê min didît ko hirçê gelek nîzikî li te kir û qey bi te re diaxaft . Gelo wê şîretek li te ne kir ?
Yê din lê vegerand :
– Belê , wê gote min :" Mirov na be eyarê hirçekê ko wî ne kuştiye , bifiroşe . Ev gotin bila bibe guharê guhê te .

---

Zeyde me kin

Li gora bihn û can bikin

Gundiyekî xeşîm û nezan , heta dereca ko xwey çi ye û çawan mirov pê emel dikin ni zani bû , rojekê , ket mala cîranê xwe di dema firavînê de . Wî dît ko xwediyê malê li ser grarên xwe goşt û heşînatiyan,hebine spî î hûr yên ko dibiriqîn direşandin .Ev tişt jê re yek car nenas bû .

Wî lê dûr û dirêj nêrî û dawî ecebmayî gote xwediyê malê :
– Hon pê çi dikin , ji bona çi ye toza ko hon li ser xwarina xwe dikin ?
Cîranî lê vegerand û got :
– Ma çawan , hon hêj ni zanin ko xelk bi xwey emel dikin . Gava xwarin bê xwey in , ne tamdar in , dil na çe wan . Heçî xwey wan tamdar û iştehawer dike . Gundî got ê :
– Cîranê min , hon ni zanin bi tiştê ko we hînî min kir , ez çiqas minetdarî we me û her wekî xwey hinde qîmetdar e , ez ê hema herim û jê ji xwe re bikirim .

Gundî çû sûkê û bi kîsekî tejî xwey vegeriya ba xwe û ji xwe re got :" Heke hinik jê besî tamdarkirina xwarinê ye , divê xwey bi xwe gelek xweş be , divê ez kefçîkeke jê bixwim ."

Bi vê gotinê wî, kefçiyeke xwey danî devê xwe .Lê wî hema dest bi kuxik û qîrqîran kirin . Piştî ko halê wî hinik çêbû , lêxist çû ba cîranê xwe û gote wî :
– We henekê xwe bi min kir. Hinik ma bû wê toza spî ez bikuştima , hêj qirika min dişewite .
Cîranî wî lê vegerand û got :
– Hevalê delal , ma min ji we re gotiye xwey bi kefçiyan bixwin,diviya bû hon mîna min jê hinik deynin xwarinê xwe . Ji xwe bi her tiştî divê mirov ne pir bike , ne zeyde bike , lê li gora bihn û can bike .

---

Pîr û Sê Xort

Mirovekî heştî salî darek dadiçikand . Cîranên wî , sê xortên nûgihayî , lê dinêrin û di, heqê pîrî de xeberinê nexweş digotin .
– Kalo dîn e , yekî hinde pîr heye ko bikare ji xwe re xaniyek bide ava kirin û qedandina vê avahiyê bibîne , lê çikandina darekî ... ma pîrê reben û hurufî , tu ê kengê jê fêkiyan berhev bikî û bixwî . Xebata te yekcar bê feyde û pûç e .

Divê tu bi qasî Matûsalem bijî da ko jê feydeyek bigirî.Ev xwewestandin ji bona tiştê ko dawiya wî ni karî bibînî ji bona çi ? Pîro .. kalo ... xebatine hewcedarî wextine dirêj ji bona me ne ji bona xortan e .

Pîrî ew xeber hemî bihîstin û li wan vegerand :

-Dawiya xebata ko dikim , heye ko hin xort jî ni karin bibinîn.Ji bona çêkirina tiştine piçûk jî pir wext divêtin , Herwekî jiyîna me kurt e, em pirîcaran ji berên xebata xwe hindik parmend dibin . Destê ko jiyîna min û we te de ye li gora hikma xwe kurt an dirêj dike .Para we û ya min ji, jiyînê çiqas e kî dizane . Kîjan kurtir û kîjan dirêjtir e. Ez ê hêj bêtir bibêjim , ji nav me hemiyan ye ko li tava rojê dawîntir dê binêre kî ye gelo nas e , yekcar veşartiye .

Herhal ez hêvîdar im ko nevî an nevîçirkên min an yên we di bin siha vê darê de rûnin û ji meyweyên wê bixwin .Ma xirab e ko eqilmend ji bona xweşiya çêlîyên ko bên di xebatê de pê bide erdê û zehmetê bide xwe. Ji xwe ev xebat bixwe ji bona min ne renc û ne jî ezab e , ez pê sebrê didime xwe , dilê xwe geş û xweş dikim , bihna erdê ya bicûn distînim axa ko sibê dê bibe nivîna min . Ez pê îro bextiyar dibim, heye ko sibe jî dê bextiyar bibin û roja dîtir jî...Lawino... sibe wê çi biqewime kes ni zane , heye ko ez hilatina rojê li ser tirba we bibînim ...

Bûyerên peyhevhatî heq da wî pîrî : yekî ji xortan berê xwe da Emerîkayê û bi rê ve xeniqî , yê diwemîn , herwekî dixwest bibe navdar di qadên şerî da xidmeta dewleta xwe dikir , hate kuştin û di nav ciwaniya xwe de vemirî , yê sieyan gava dar dibirîn ji çiqlekê ket û mir! Pîrî xwema wan xwarin û li ser wan giriya û heta ko ev ders ne yê winda kirin tiştên jorîn li ser kêlê gorên wan dan nivîsandin . Ji wan bûyeran di niqtan divê em ji bîra ne kin . Ya pêşîn eve ko jîn kêm dom dike û her çax em dikarin wê winda bikin . Divê mirov çiqas ji destê wî bê qenciyê belav bike dora xwe . Ya paşîn , divê mirov di jiyîna hindekurt de bi mêrxasî bixebite ji bona nefsa xwe , jo bona xelkên din , ja bona welat û miletê xwe û ji bona cihanbratiyê. Ji xwe rêya xebatê , rêya bextiyariyê ye . Zîneta dinyayê xebat e .

---

<u>Bibe arîkarê xwe</u>

Mîrekî mezin yê ko erdên dora xwe xisti bû bin hikmê xwe ,rojekê di şerekî de bi eskerên xwe ve hatibû şkênandin.Ew dilperitî acizbûyî , westiyayî hilkişiya kadînekê da ko di tenahiya vê derê de , bi rahetî bifikire û bi hinek razanê jî tehliya bûyerên rojê ji bîra bike. Tîrejeke rojê di nav du beştên serbaniyên qenc hevnegirtî re diborî û roniya xwe davêt ser tofekê kayê ya ko di nav kadînê de mîna girekî piçûk xuyanî dikir .

Mûriyek devê xwe de livekî ceh dikir hilkişe serê girî, mûrî heta nîvê bilindahiyê giha bê zehmet, lê jê wêdetir rê asê bû , mîna berpala çiyayekî . Mûrî , bê livê ceh , dê bikariya hilkişe serî , lê li wî diviya bû dev ji livê ceh ber me de û wî bigihîne enbara mûriyan cemciqînê xwe .

Çavê mîr gava pê ket meraqa wî hişyar bû û bala xwe da mûrîyê piçûk , mûrî cehda xwe dikir , zorê dida xwe da ko pêş ve bikeve lê livê ceh jê re barekî giran bû . Cara paşîn ger bû û ket heta jêr . mûrî liv bir devê xwe û dîsa dest bi jorketinê kir . Mîr ecebmayî bala xwe dida mûrî . Wî dixwest bizane gelo dişwarî zora mêrxasiyê bibe an mêrxasî zora dişwariyê .

Mûrî diket , livê ceh winda dibû , mûrî lê digeriya, ew peyda dikir , dikir devê xwe û berê xwe dida kaşê , carek , dido , sisê , çar, pênc ...Mûrî sebrê dida xwe , xwe sist ne dikir .

Mûrî heştî û penc car ew ceribandin , cara heştî û şeşan zora hevrazê bir û giha serê wê .

Mîr ew hejmarti bûn û wî ji xwe re got : Xeberâ eqilmendan e, sebir arîkariya mêrxasiyê dike . Mîr ji kadînê hate xwar , eskerên xwe saz kirin û dotira rojê ji nû ve dirêji dijminan kirin û ew şkênandin .

...........

Çiya çiqas asê be , rê pê dikeve . Çiya nîne ko rê pê na keve .
Methelokeke Kurdî

.............

## Ew du beytik

Saleke sar û xelayê de , du beytikên piçûk û reben , ji sermayê qifilî û ji birçîtiyê kelsketî diêşîn û diezibîn .

Rojekê yê qelstir got yê xurtir :" Brayê min î qenc , qiwetên xwe yên mayîn bide hev û here binêre heke tu ni karî hinik zad peyda bikî, ez dixwazim hevalîtiya te bikim , lê ezo bextreşo , hîç taqeta min nî ne, ez yekcar bê mecal im .

Heke te tiştek peyda kir , ji jêhatinê an lêhatinê , hinek jê bîne min lê xwe bilezîne û berî roavayî vegere , an ne ez ê ji nêzan bimirim. Yê din wehd da tiştê ko brayê wî jê xwestiye bîne cih û berê xwe da bexçan. Pir ne borî çavê wî bi darekî ket ko li ser çend gilyas hebûn .Wî bi şabûnî qîr kir , niho ez û hevalê xwe em ji mirinê felitîn . Beytik hema dest bi xwarinê kir . Wextek borî lê beytik , hêj têr ne xwari bû .

Rojên zivistanê kurt in . Bê ko ew bohese , dinya lê bû tarî. Vê demê hevalê wî hat bîra wî lê wî ji xwe re got :" Min gelek xwariye û lagê min yekcar sist bûye , divê hinik bihna xwe vekim û rahet bikim. Ko min hinik rahet kir ez ê hêj zûtir bifirim û xwarinê bigehînim hevalê xwe yê reben . Beytik wilo mitalan dikir û hin tiştinê din digote xwe ko di xew de çû .

Dotira rojê gava hişyar bû bi poşmanî girî û hema gilyasek bir û vegeriya ba hevalê xwe . Lê hevalê wî ne li ser darê bû, ketî bû erdê û gever bû bû , birçîtiyê ew kuşti bû .

Beytik gelek li ber mirina hevalê xwe ket û gote xwe :" Ez ne merd im , min hevalê xwe yê ko li tengasiyê bû ji bîrâ kir û ketim derdê zikê xwe . Lê gotina wî ni karî bû beytikê reben ji mirinê rake. Mirov divê qedrê gotina xwe bigire .

---

## Aştî

Aştî, dema xweşî û şabûniyê ye . Li her derê bitenê xortên têr-mijûl û enîgeş , jinên dilrahet têne dîtin , ji ber ko hemî li ber dilê wan şirîn li nik wan in. Di vê dewra bextiyar de xweşî li her derê ye. Li çolê erdên, tovkirî zadine spehî didin, cotkar bi şahî tejîbûna enbarên xwe dibîne û qenc feyda taba xebata xwe dibe .

Gundî , bi şewk xasiline çak tînin bazaran yên ko bi bihayeke erzan û bêzehmet têne firotin . Li bajêr , kargeh mîna kewarên tejî têr zivên in . Xebatker , herçend ji rêzên wan xweş tejî ne , xebatine her texlît peyda dikin û bi rahetî nanê xwe dertînin .

Em ji halê xwe razî ne . Û di nav vê destlivandina amdagirtî ,

dewlemendiya herkesînî de rahetcanî , malê çêtir , li ser dilan hikimran e . Dê , dilê wan têrhevî li jînborîna zaroyên xwe dinêrin û xiyala pêşiyê dikin . Bê şik ewe nigareke gelek dilrevîn .

Lê herhal , divê em bizanin , gava welat emrî me dike , dest ji şîraniya aşîtiyê berdin û bi nêrxasî şerî dijminên welatê xwe bikin .

---

## Ker û Xwediyên wî

Kerekê ko di xidmeta bexçewanekî de bû giliya qedera xwe dikir ji ber ko xelkê ew hero li tarîgewrîkê hişyar dikir . Wî digot :"Beriya ko dîk rabin ez nişke li ser lingan im . Ev lezandin ji bona çi ? De ji kerema xwe bêjin ? Min divê ez hinik rakevim . Xwedî bernadin . Divê lez û bez heşînatiyan bînim bajêr , hênceteke spehî da ko mirov kerekî xwedînamûs aciz bike . " Qederê xema giliyên wê xwarîn û destûr da ji destê bexçevanekî bikeve destê denkerekî . Kerî pê tiştek kar ne kir. Cihê heşînatiyan den , çerbik , firax barê wî bûn . Ev tişt ji heşînatiyan girantir bûn û bihnine kirêt ji wan dihatin .

Kerî bihna xwe kişand û ji xwe re got :" Kanî axayê min ê pêşîn. Di xidmeta wî de gava xelkê ez bi tenê dihiştim , ji qeneve min çend gêzer , kelem û xiyar didizîn û dixwarim . Ev den û firax û şerbik çi ne, bihna wan kirêt û tama wan ne xweş e . "

Heywanê me yê barkêş dîsa dset bi lavelavan dike û pê guherandineke din tîne cih . Îcar wî dişînin ba komirvanekî . Ker di nav toz û dumanan de qey difetise . Dîsa dest bi giliya dike . Lê qederê jê eydî aciz bûye û jê diênire û bi hêrs dibêje wî :" Ma çi... gelo tu bawer dikî ko ji te pê ve derd û ezebkêş nîne , behsa gazindan de tu bi tenê yî qey ji te pê ve kes nîne ko min divê li halên wan bipirsim , hey kerê kurmişkirî ...!" Kerê reben dide eqlê xwe gotinên qederê û ji xwe re dibêje: Qeder bi min camêr biwa ez ker ne dixuliqandim .

---

## Em Çima Dixwin ?

Sibe , gava em ji xewê radibin , em qehwe , çay , an şîrî vedixwin. Em , bi wan tiştan re , nan , penîr , hingivî , nivîşk , hêk û goştî jî dixwin . Di nîvroyê de , xwarina me jê bêtir e . Firavîna me ji şorbê , goşt , savar , meqerne an birinc , heşînatî , şîranî û fêkiyan hevedudanî ye .

Li êvarê em şîvê dixwin .Şîva me jî weke firavînê ji çend texlîtên xurdemeniyê pêk tê . Bitenê mirovên kal û bedenketî şîva xwe hindik û sivik dixwin .

Xelkê çiyê û zozanan , di nav bîst û çar saetan de , şeş caran dixwin : qeretûn , xurînî , taştê , firavîn , şîv û paşîv . Qeretûn xwarina tarîgewrikê , xurînî ya sibehê , taştê ya berî nîvroyê , şîv ya êvarê û paşîv ya şevê ye .

Divê em li xwe bipirsin :" Ma em çire hinde dixwin ? "

Hon ê , zaroyên delal , lê vegerînin :" Em ji ber birçîtiyê dixwin. Vegera we ne xirab e , lê kêm e . Bê xwarin kes ni kare bijî . Em bi xwarinê dijîn, ango seb jiyînê em xwarinê dixwin . Zaro xwarinê seb jiyîn û gehiştinê dixwin .

Di welatên jar û perîşan de ko xwarin û vexwarin mîna goşt,

rûn , şîr , şekir , şîranî , fêkî hindik in , zaro jar û qels, bajinpiçûk rûzerikî dimînin , gir na bin û her ne sax in . Ji xwe piraniya wan berîya ko bibin yek an du salî dimirin .

Lê , di erdên dewlemend de ko xwarin û vexwarin baş in û zaro xweş dixwin , vedixwin , ew xurt , gir û şidayî dibin . Jariya zaroyên welatê me , ne ji feqîriya axa welat e .

Tiştên xwarinê , ango xurdemenî ji goştfiroş , beqal , heşînatîfiroş û helawçêker têne kirîn. Ev tiştên he gelek hêja û qîmetgiran in, bi zanîn û xebata cotkar , gundî , bexçevan , rencber , hoste û paleyan têne gehiştin û çêkirin , û bavê me bi heqê xebata xwe wan tiştan ji me re dikire , divê em şikirdarê wî û wan bibin . Ji aliyê din divê em ê qedrê deya xwe jî bigirin û bizanin ko wê ji bona xwedîkirina me çiqas xwe êşandiye . Em ê gelek çak û baş bixebitin da ko wextê pîriya dê û bavê xwe de bi kêrî wan bên û arîkariya wan bikin . Hingî dilê me dê gelek şa û xweş bibe .

---

## Sewî

Ez sewî me û b'tenê
Bê dayik û bê bra ,
Perîşan im û jar im ,
Şev hene bê nan û av .

Zivistan e û berf tê ,
Dinê sar e , her der sar ,
Nî ne agir , nî ne nan ,
Ji birçîtî bûme jar .

Paşila dê min ne dît ,
Dilê Xadê çawa ye ?
Min bavê xwe jî ne dît ,
Mala min ne ava ye .

Bavê min nir şerî de ,
Deya min der hicretê .
Dinê sar e , her der sar ,
Zivistan e û berf tê .

Welatê min jî dûr e ,
Erd û axa Kurdistan ,
Xwedê bike ez bibim
Jê re gorî û qurban .

## Heyv û Stêr

Îşev şev e , şev bi şev e ,
Dê digirî tirba xwe ve ,
Heyiv derket stêra xwe ve ,
Dilketî me û singjar im ,
Bê welat û bê bajar im .

Erdê xwe re ez heyran im ,
Brîndar û bê derman im ,
Ji Kurdan re ez qurban im
Dilketî me û singjar im ,
Bê welat û bê bajar im .

Bê xweyî me , ez b'tenê me ,
Yek ji bextreşên dinê me ,
Ji bêbextî ez ketî me ,
Dilketî me û singjar im ,
Bê welat û bê bajar im .

Îşev şev e , şev bi şev e ,
Bavê min tê b'gora xwe ve ,
Heyiv derket b' stêra xwe ve
Dilketî me û singjar im ,
Bê welat û bê bajar im .

---

## Dûrik

Dûrikên li ber tenbûrê
Çi şikefta dev mezinê ,
Jê reviya refek jinê ,
Çavê min li ya mezinê .

Çi şikefta dev li hewa ,
Jê firiya refek kewa ,
Çavê min li ya bedewa .

## Titin

Ez radibim wexta seher ,
Qelûna min agir li ser ,
Her nefesê ez dikêşim ,
Defî dike pênc sed qeder .

Titina misk û ela ye ,
Vedixwit şêx û mela ye ,
Kî dibêjit titin bela ye ,
Ew ni zanin lezetê .

---

## BINGEHÎNA ZMANÊ KURDÎ

Bingehîna zmanekî , ji me re rêzikên wî zmanî dide zanîn .

Bingehîna zmanê kurdî , ji me re rêzikên zmanê me dide zanîn û me hînê rastaxaftin , rastxwendin û rastnivîsandina zmanê kurdî dike .

Tinê em mirov , dikarin raman û daxwazên xwe bi zmanê bidin zanîn .

Em raman û daxwazên xwe , an bi gotin an bi nivîsandinê didin zanîn .

Zmanê gotinê bi dengan çêdibe , zmanê nivîsandinê bi tîpan çêdibe .Her tîp ,ji me re dengekî nîşan dide . Deng an tîp digehinhev û ji vê gihandinhevê bêje derdikeve .

B Ê J E

Bêje, gotineke xweymana ye , wek : çav , enî , rez , dest , pez , rovî , qelem , mirov .

H E V O K

Hevok , çend bêje ne ko ji me re , raman an daxwazeke timam dide zanîn , wek : îro dinya germ e . Şêr dehbe ye .Divê ez herim .

ELFABÊYA KURDÎ

Elfabêya kurdî ji sih û du tîpan hevedudanî ye .
a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x ẍ y z

Tîp du texlît in :Hûr û gir. Tîpên jorîn ên hûr in,tîpên jêrîn ên gir in :
A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Ẍ Y Z

Dengdêr û dengdar : Tîp di dengdariyê de du texlît in, dengdêr û dengdar . Dengdêr ev tîp e ko dixwedeng e û dengê wê ,bi serê xwe derdikeve û dengê dengdaran derdixîne , û didêre . Dengdar ew tîp e ko dixwedeng e , lêbelê dengê wê bi serê xwe û bê arîkariya dengdêrê dernakeve.

Di zmanê kurdî de heşt dengdêr hene :

a e ê i î u û o

Dengdêr jî du texlît in : kin û dirêj .
Dengdêrên kin : ( e i u ) ne .
Dengdêrên drêj : ( a î ê û o ) ne .

K I T :Me goti bû , bêje gotineke xweymana ye ,herwekî : hesp , mal ,derî, kar , keçik , mêr , dar , xwarin , avêtin , mirov .
Bêje ji kitan hevedudanî ye . Kit pariyek ji bêjeyekê ye ko bi derbekê de ji dev derdikeve . Herwekî di bêjeya mirov de du kit hene : Mi - rov . Ji bo bilêvkirina vê bêjeyê divê em devê xwe ( ezman û lêvên xwe ) du car bilivînin ; carek ji bo derêxistina dengên ( mi ) û carekî din ji bo derêxistina dengên ( rov ) . Me sehkiriye ko di bêjeya mi-rov de du kit hene , gelo çend deng û çend tîp hene ? Ez ê bihejmêrim : (m-1,i-2,r-3, o-4, v-5 .) Ji hejmartina min tê zanîn ko di bêjeya mirov de pênc deng û pênc tîp hene .

NAVOK : Navok navê mirovekî , cihekî an tiştekî ye . Wek Temo,Dêrik,mast.
Navokên Cihê û Gî : Navok du texlît in : Navokê cihê û navokên gî.
Navên mirov û cihan , wek Temo , Hevind , Sînem , Ferat, Agirî ,Dêrsim, Diyarbekr , Parîs navokên cihê ne .

Navên tiştan , wek qelem , hesp , ga ,mast,xanî,dû,cil,navokên gî ne.
Tîpên destpêkî ên navokên cihê û hevokan bi tîpên gir tên nivîsan-din ;

ZAYEND : Zayend ji me re nêrîtî û mêyîtiya navokan dide zanîn .Gava em çêlek dibêjin, dizanin ko zayenda wî navokî , mê ye;heke em ga dibêjin dizanin ko zayenda wî nêr e .

Navokên bêzayend : Hin navok hene ko bê zayend in , ji wan re navokên bêzayend tê gotin . Herwekî heval . Em dikarin,ko heval mêr e hevalê min; ko mê yanî jin e hevala min bibêjin. Ango heval mê jî û nêr jî dibe,yanî bêzayend e . Lê ez tucar nikarim gunda min bibêjim , ji ber ko gund bêje-yeke bi zayend e, zayenda wî jî nêr e,yanî divê ez her gundê min bibêjim.

HEJMAR : Yekînî û pirînî
Heke navok ji me re tiştekî mirovekî an cihekî dide zanîn ev navok di yekîniyê de ye . Wek : mirov , qelem, ga, bizin, zozan , zevî.
heke navok ji me re du tişt du mirov , du cih an bêtir dide zanîn, ev navok di pirîniyê de ye. Wek : brayên min , qelemên Temo,Zozanên Şerefdîna. Brayên , qelemên , zozanên di pirîniyê de me, ji ber ko gava ez brayên min dibêjim, jî gotina min , bê şik tê seh kirin ko ji yekî zeydetir bra-yên min hene .

RENGDA :
Rengda ew bêje ye ko ji me re çilobûn û çawabûna navokan dide zanîn . Kengê ez hesp dibêjim, her kes seh dike mirada min çi ye,lê hê ni zanin û heye ko ji xwe bipirsin, gelo ew hesp cowan e an pîr e, bilind e . an nizm e, boz e, kumeyt e, şê ye , qule ye an qemer e ?

Ev bêjeyên hanê hemî ; ciwan, pîr, bilind, nizm boz, kumeyt, şê , qule , qemer , rengda ne , ji lewre dikarin, çilobûn û çawabûna hespî bidin zanîn .

Gava ez dibêjim, ev hesp ciwan , bilind û kumeyt e ; guhdarê min zûka reng û awayê hespî, çilobûn û çawabûna wî seh dike û dizane ko ew hesp ne pîr e, ciwan e, ne nizm e, bilind e, ne şê an boz e , lêbelê kumeyt e .

# TEFSÎRA QURANÊ

## 1- SÛREYÊ DESTPÊKIRINÊ.

### HEFT AYET IN, DI MEKÊ DE DAHATIYE.

Bi navê Xudayê pak ê dilovan û mihrivan
Pesin ji Xwedê re ye, ji nav û kerema wî re ye, yê ko Xudanê erd û ezmana ye § Xwediyê roja pişdawiyê ye § Em ibadeta te dikin û ji te hêvîdar in § Me bide ser riya rastiyê § Riya wan mirovên ko tu li wan hatiyî rehmê; ne peyayên ko ketine ber xezeba te û ne kesên ko dane ser riya şaş.

## 2- SÛREYÊ ÇÊLEKÊ.

DU SED Û HEŞTÊ Û ŞEŞ AYET IN, DI MEDÎNÊ DE DAHATIYE.

Bi navê Xudayê pak ê dilovan û mihrivan.

1- E.L.M. Ji wan herfan miraz çi ye Xwedê dizane. Xuda û

2- Ew kitêb bê şik ji bona bawermendan rêke rast e.

3- Yên ko bawerûya xwe bi xeybê (mîna bihuşt û dojehê) tînin, nimêja xwe dikin û rizqê ko me daye wan, di riya Xwedê da didin, arîkariya sêwî û belengaza dikin.

4- Ew bawermendên ko bi kitêba ko ji te re dahatiye û bi yên ko berî Quranê dahatine bawer dikin û bi axiretê înaniya xwe tînin û pê ewle ne.

5- Wan bi kerema Xwedê dane ser riya rastiyê û ewê bigehin rehm û qenciya Xwedê.

6- Yên ko kufir kirine, tu wan bi ezabî bitirsînî an ne tirsînî mîna hev e, baweriya xwe bi Xwedê û bi axiretê na yînin.

7- Xwedê dil û guhên wan mor kiriye û di ber çavên re perdeyek kişandiye, ji wan re ezabekî mezin heye.

8- Hin hene dibêjin ko me baweriya xwe bi Xwedê û bi roja Axiretê aniye lê wan di rastiyê de baweriya xwe pê ne anîne.

9- Ew qey Xwedê û mirovên bawermend dixapînin, lê ew nizanin ko pê bi tenê nefsa xwe dixapînin.

10- Di dilê wan de nesaxiyek heye û Xwedê nesaxiya wan bêtir dike û ji bo derewên wan ji wan re êşandineke dijwar heye.

11- Û gava ji wan re tête gotin di dinyayê de fesadî û tevdayiyê mekin, ew dibêjin em rastker in.

12- Awan û tevdayî ew bi xwe ne, ew pê nahesin.

13- Û gava, ji wan re tête gotin, mîna mirovên din hon jî baweriya xwe bi bi pêxemberê wî bînin, ew dibêjin: em jî weke sefîhan pê baweriyê bînin, sefîh ew bi xwe ne, lê ew pê ni zanin.

14- Û gava ew bi bawermendan re ne, dibêjin wan me baweriya xwe pê aniye û gava ew bi iblîsên xwe re bi tenê dimînin ji wan re dibêje em bi we re ne, lê em tinaz û henekên xwe bi wan dikin.

15- Xwedê wê henekê xwe bi wan bike û wan bihêle ko ew di serhişkiya xwe de heyirî û ecebmayî bimînin.

16- Yên ko bi rastiyê nerastî kirine, dan û standina wan tu kar ne daye û ew tucaran ne ketine ser riya rastiyê.

17- Ew mîna mirovekî ne ko ji xwe re agirek dadide û dema ko agir dora xwe ronak dike, Xwedê ronahiya wan dibe û wan di tariyê de dihêle û ew nabînin.

18- Ew kher, kor û lal in, ji riya xwe a xwar venagerin.

19- An ew mîna wan in ko ketine bin ewrê ezmên ê têr deng û tarî, tejî avtav û birûsk; ji tirsa birûsk û kuştina xwe tiliyên xwe dikin guhên xwe. Xwedê bi halê kafiran dizane.

20- Birûsk qey ronahiya çavên wan direvîne, gava birûsk dora wan ronak dike tê de diçin û dema ko li ser wan tarî dibe disekinin; heke Xwedê bixwesta bihistin û ronahiya çavên wan jî dê biçûya; Xwedê bi her tiştî dikare.

21- Gelî mirovono, ibadeta Xudayê xwe bikin yê ko hon û yên berî we

afirandine, ta ko hon ne kevin ber xezeba wî, ji ezabê wî xelas bibin û bigehin rehm û kerema Xwedê .

22- Wî ji we re erd rast û ezman ava kiriye û ji ezman baran barandiy û pê ji bona we zad derêxistine û wî ew kirine rizqê we û yê heywanên we ; jê re tu kesî me kin hevber û hempa ; hon ji xwe dizanin ko ew bê hevrî û hevber e .

23- Heke, di dilê we de ; di heqê vê kitêba ko me ji evdê xwe re şandiye xwar, şikek heye û ger hon di gotina xwe de, ko ew kitêb ne kelanê Xwedê lê kelamê Mihemed e dilrast in, ji Xwedê pê ve heçî arîkarên we hene, banî wan bikin, bila ew ayetekî mîna ayetên vê kitêbê pêk bînin.

24- Heke we ew pêk ve ne anî û pêkanîna wê bê şik ji we nayê, êdî xwe ji agirê ko ardûyê wî mirovên kafir û pûtên xaçperestan e bidin paş.

25- Pêxemberê min, mizgîniya mirovên ko baweriya xwe anîne û qencî kirine bide , jà bo wan bihuştine têr sih û dar hene û di wan de avên zelal diherikin û dema ko ew ji fêkiyên wê bihuştê bixwin dê bibêjin: Ew fêkî mîna wan in kù me berî di dinyayê de xwariye, lêbelê bi tenê nav û rengên her diwan weke hev e, û di wan bihuştan de ji bona wan , jinên paqij hene û ew tê de her wê bimînin .

26- Xwedê ji anîna qiyasekê bi kelmêşekê an bi tiştekî jê mezintir şerm na ke û mirovên bawermend dizanin ko ew qiyas ji aliyê Xudayê wan ve heq e , lê nebawermend ji xwe dipirsin : Gelo qesda Xwedê ji vê qiyasê çi ye ?

Xwedê pê gelekan dike ser riya xwar û gelekan jî digehîne rastiyê ; lê Xwedê bi tenê kafiran dike ser riya xwar .

27- Yên ko li ber Xwedê swind dixwin û bi yekîtiya Xwedê û fermanên wî muqir tên û paşî bextên xwe dişkînin û tiştine ko Xwedê bihevgihiştina wan emir kiriye ji hev dûr dêxin û di, dinyayê dê fesadiyê dikin ziyandîtî ne .

28 -Ma hon çawan Xwedê inkar dikin û pê kafir dibin !.. Hon mirî bûn, wî can daye we; paşê ewê we bimirîne û piştra ji kerema xwe re, ewê we vejîne û di dawiyê de ewê we bigehîne xwe .

29- Wî Xudayê ko her tiştên dinê ji bo we afirandiye û paşê dest bi ezmên xistiye û wî ezman li ser heft tayan ava kiriye..., Xwedê bi her tiştî dizane .

30- Gava Xudanê te, ji melyaketan re got : Ezê cihgirtiyek bigînim erdê, wan got : Yê ko tu bişînî, heye ko tê de fesadiyê bike û xwînê birijîne, destê me li ber rehma te sekiniye, û em hemî dizanin ko tu ji kêmaniyan pak î , û em bi mezinahiya te bawer in. Xwedê ji wan re got: Heke hon dilrast in , ke ji min re navên wan bêjin .

32- Ferişteyan got : Mezin tu î , ji zanîna ko te gihande me pê ve , em bi tu tiştî ni zanin , yê zana û fêris tu î .

33- Xwedê got : Ya Adem ! Navê mexlûqên dinê ji melaiketan re bide seh kirin û gava Adem navê wan ji wan re da zanîn, Xwedê got: Ma min ji we re ne gotiye ko ez nependiyên erd û ezmana û tiştên ko hon di nav beyna xwe de dibêjin an vedişêrin dizanin .

34- Û hingê, me ji melaîkan re got : Secde ji Adem re bibin, ji şeytên pê ve hemiyan jê re secde kirin, şeytên guh ne da, ser xwe ve çû û bû ji kafiran .

35— Me got : Ya Adem , tu û jina xwe pev re di bihuştê de rûnin û ji her tiştên wê bi qasî xwestina xwe bixwin , lêbelê nîzikî vê darê me bin , an ne honê bibin ji zalim û gunehkaran .

36— Lê Şeytên ew xapandin û ew bû sebeba derêxistina wan ji bihuştê û Xwedê ji wan re got : Dakevin erdê û tê de weke dijminên hev bimînin : di wê de heta wextekê ji we re war û qûtek dê hebe .

37— Adem ji kerema Xwedê hînî pirsên diayê bû, dia û tobe kir ; toba wî hate qebûl kirin , ji ber ko Xwedê bi tobedaran re rehîm û piyar e.

38— Me ji wan re got : Honê hemî dakevîn erdê , emê di wê de bi kitêb û pêxemberan riya rastiyê nîşanî we bikin , yên ko baweriyan xwe bi wan tînin , ji bona wan tirs nîne û ew xemgîr na bin .

39— Û ewên ko kafir bûne , û derew bi aliyê ayetên me ve dane ; dê bikevin dojehê û tê de her wê bimînin .

40— Gelî lawên Israîl !...Qenciya ko min ji we re kiriye bînin bîra xwe û baweriya xwe bi min bînin û li ser vê baweriyê nextê xwe reş me kin heta ko ez jî li ser bextê xwe bimînim , di bextxirabiyê de ji, min bitirsin .

41— Baweriya xwe bi vê kitêbê bînin , ev kitêb şehdetiya kitêba we Tewratê tîne , kafirên vê kitêbê ên pêşîn me bin û ayatên min bi tiştine erzan me firoşin .

42— Rastî û xwariyê têkilî hev me kin û rastiyê veneşêrin , hon ji xwe pê dizanin .

43— Nimêjê bikin , zekatê bidin û di nimêjên de tevî bawermenden din xwe bitewînin .

44— Ma kengê dibe ko hon li xelkê şîreta qencî û bawermendiyê [illegible] bikin û nefsa xwe jê bidin paş , hon Tewratê dixwînin van tiştan dizanin, çima wiha dikin ; ma hiş û aqil li serê we tu ne ye .

45— Bi sebrê , bi rojî û nimêjê hêvîdarê Xudayê xwe bibin , ev hêvî bi tenê ji nebawermendan re giran e .

46— Mirovên bawermend dizanin ko ewê rastî Xwedê bên û ewê bigehêjin Xudayê xwe .

47— Gelî lawen Israîl !...Qenciya ko min bi we kiriye bînin bîra xwe , min hon di ser hemî miletan de girtiye .

48— Û ji wê rojê bitirsin ko di wê de kes nikare arîkariya kesekî bike û mehdera yekî ji yekî re û dayina fidyê na yê qebûl kirin û tu kes ni kare gunehkaran ji ezabê xelas bike .

49— Û bînin bîra xwe ko me hon ji destê Firewn û mirovên wî felitandin , yên ko li we dişidandin , zor li we dikirin, kurên we dikuştin, û keçên we dihiştin . Xwedê hon bi vî ezabê mezin diceribandin .

50— Dîsa bînin bîra xwe wê dema ko me ava behrê ji hev kir û rê da we û li ber çavên we Firewn û mirovên wî di wê behrê de xeniqandin.

51— Û cardin bîni bîra xwe ko me ji Mûsa re, ji bo dahatina Tewratê çil şev wade dabû , we di wê hengamê de golikek anî û ibadeta wî kir û hon pê gunahkar bûn .

52— Û gava hon tobedar bûn û we dev ji ibadeta golikî kir ; Xwedê hon efiw kirin ; ta ko hon pê şikirdar bin .

( DAWÎ HEYE )

## HEDÎSÊN CENABÊ PÊXEMBER

Rehmet û Silava Xwedê lê be.

1- Ji bona her derî mifteyek heye, mifta bihuştê ew e ko mirov ji piçûk û belangaza hez bike û li halê wan bipirse.

2- Heçî malê miletî bê rê dixwin para wan dojeh e.

3- Bawermend divê bi şûr û gotina xwe cihadê bikin û pişta zilm û neheqiyê, derewker û zalima bişkînînin.

4- Di roja piştdawiyê de piraniya xelkê ji ber gotinên bê rê û beredayî wê bêne êşandin.

5- Dev û dranên xwe her paqij bigirin.

6- Piştî îmanê tiştê çak ew e ko xelk ji hev û du hez bikin.

7- Gava dest bi karekî dikin devê xwe bigirin, xelk ji mirovên ko îşê wan li rê ye dibeicin.

8- Ji nifirê bêsûca bitirsin, navbeyna wan û Xwedê de tu perde nîne.

9- Ne bi xweziya, lê bi xebat û kirinê jiyîna xwe biborîne.

10-Lok girêde û piştra bispêre Xwedê.

11-Dînê islamê qaim e, ibadeta xwe nerm nerm bike û zorê li nefsa xwe me de, me be mîna mirovên ko bar û serbarê heywanê xwe giran dike, pişta heywanî wî qul dibe, li çol û şevderê dimîne, û na gihe hevalên xwe.

12-Qenciyê ji dê û bavê xwe re bikin da ko zaroyên we jî qenciyê ji we re bikin.

13-Rizqê xwe ji xebata xwe bixwazin.

14-Herwekî mirov bi nefsa xwe re rast û qenc e divê bi xelkê re jî rast û qenc bibe, ji bona lihavhevîn̈chatina mirova bixebite û xêrxwazê xelkê be û feqîriya xwe de jî li halê belengaza binêre; bi pêk anîna wan sê tiştan îman timam dibe.

15-Berî li cîranekî baş bigere, û pişt wî re li xanîkî qenc bigere.

16-Bihuşt di bin lingên diya de ye.

17-Di nav mirovan de yê baştir ew e ko ji jin û zaroyên xwe re baş e.

18-Dermanê nezaniyê, pirs û xebat e.

19-Ji dergûşê heta mirinê minêkarê zanînê bibin.

20-Zanîn di welatê Çîn û Maçînê de be jî lawekarê wê bibin.

21-Li ser jin û mêra ilm û zanîn ferz e.

22-Sermiyanî miletekî ew e ko xulamîtiya wî dike.

23-Mirovên xirabtir ew in ko qedrê xelkê ji tirsa xwe digirin û dixwazin pê ji xirabiya wan ewle bibin.

24-Mirovên xirabtir ew in ko eqilmend nîzikî civata wan na bin.

25-Nîşana minafiqan sisê ne, gava dipeyivin derewa dikin, gava wada xwe didin lê diqulipin, ko mirov pişta xwe dayê bêbextiyê dikin.

(DAWÎ HEYE.)

## METHELOKÊN HEZRETÊ SILÊMAN

Ev in methelokên Silêman, kurê Dawûd, qralê Israilistanê .

1- Tirsa Xwedê destpêka zanînê ye ;yên bêkêr qedrê birewerî û hînbûnê na girin .

2- Bila , mîna agirê dojehê ê xurt bi wan kevin û weke gora ko miriyan daqurtîne wan daqurtînin .

3- Di derîzana dergehê kelatan de , di nav komên mirovan de gotina xwe dibêje ; dengê xwe bide bihîstin .

4- Heke te xwe dirêj kir , tirs na keve dilê te û ko tu razayî xewa te wê bibe şîrîn .

5- Heke ji destê te tê , arîkariya hewcedaran bike û xwe jê me de paş .

6- Heke di destê te de heye , bide ; û ji xelkê re me bêje îro here û sibe were ezê bidim te .

7- Xirabiya kesê ko li ba te rûniştiye me xwaze û me de eqlê xwe.

8- Bê sebeb , li acizkirina kesê ko tu neçeyiya wî ne gihaye te me gere .

9- Berberiya zorkeran ne ke û me de ser şopa wan .

10-Laneta Xwedê di mala peyayên xirab de ye , lê Ew rehma xwe digîhîne mala pakdilan .

11-Para eqilmendan serfirazî ye , û ya ehmeqan şermisarî .

12-Me de ser xaçereyên mirovên bêkêr û me kewe ser riya peyayên xirab .

13-Ji her tiştî bêtir guh bide dilê xwe , ji ber ko kanîyên jiyînê jê tên .

14-Berde , bila piyên te bi serbestî peş ve bikevin,bêşik wilo berve diçî .

15-Ava sehrinca xwe û ya ko ji bîra te derdikeve vexwe .

16-Mirovên xirab bi destê emelên xwe ên kirêt dê bêne weqifandin û bi wêrisên gunehên di xwe dê bêne girtin .

17-Cehda xwe bike kurê min, û xwe xelas bike , ji ber ko tu ketiyî destê xelkê, lezê bi xwe de , nav bi wan de û stoyê xwe bifilitîne .

18-Xwe serbest bike weke xezala ko ji lepê nêçîrvana xwe aza dike mîna çûkê ko ji destê teyirvana xwe difilitîne .

19-Here nik mûriyan , mirovê tiral , li rê û xebata wan binêre û bibe eqilmend .

20-Mirovê xirab , mirovê bêkêr dimeşe û devê wî xwar e ;
Çavên xwe dişkînîne û bi pê û tiliyên xwe dipeyive ;
Di dilî wî de xirabî heye û qesda neçeyiyê dike û xelk bi destê wî pev diçin .

21-Ji derdê qehbikekê mirov dibe hewcedarî nanê tisî, û jinikeke zinakar , nêçîrvaniya giyanê mirovan ê delal dike .

22-Ma kesek dikare bê ko piyên xwe bişewitîne li ser agirê sor bimeşe .

23-Dizê ko ji birçîna didize bêsûç na yê hesibandin .

24-Eqilmendî mala xwe ava kiriye û heft stûnên xwe danîne ;
Qurbana xwe şerjêkiriye , şeraba xwe aniye pêş û sifra xwe daniye ;
Navmaliya xwe rêkiriye , Ew di cihên bajêr ên bilind de ban dikin :
Yê ko bodile ye bila bê vir...ew ji yên sersem re dibêje :
Werin ,ji nanê min bixwin, û ji şeraba ko hatiye danîn vexwin ;
Dev ji ehmeqiyê berdin û honê tama jiyînê dê bizanin ; û li ser riya hişyariyê bimeşin ...

( Dawî Heye )

## JI MIROVÊN KÊM RE

— Bi ZERDEŞT Ve —

Jiyin kanîyeke xwestinê ye, lê di wan deran de ko mirovên kêm digel paqijan vedixwin, kanî bijehr in.

Ez hej her tiştên paqij dikim, li ni karim devê mirovên kêm û tihniya peyayên pîs bibînim. Wan bi kêmayiyên xwe ava zelal jehrdar kir.

Gava wan navên xeyalên xwe ên pîs kirin xwestik û armanc axaftin jî jehrdar bû.

Wekê wan dilên xwe ên şil û şeylo didin ser agirî, agir bêkêf dibe, dikeve reşiyê û dû dike. Eql û hiç ji xwe şahiya biriqandinê dixin dûr û dikevin tariyê.

Hin peyayên ko ji jiyînê xwe dane paş, ew tenê ji mirovên kêm xwe dûr dixistin. Lewra ko ew ne dixwestin kanî û agir bi wan re par bikin.

Hin ên din ko ketine çolê û bi heywanên kovî ezabê tihniyê dikişandin, ne dixwestin bi heştirvanên pîs li keviya kaniyekê rûnin. Carna ji xwe dipirsim : Ma jiyîn hewcedarî mirovên kêm û peyayên pîs e?

Camêrîn wek teyrok û badevê hatin û pê li qirika peyayan kirin. Ewan dil dikirin devên kortalên pîs û bêşerm bigirin.

Brao !! Ma dilxwaza te ne aveke paqij û avîje û kanîyeke zelal e? Hingî xwe bilind bike, di bilindayiyê de kaniyeke zelal û pak heye, di dora wê de mirovên pîs û peyayên kêm rûnanin. Di wê de agir, bireng e, dû na ke, bi pêteke sor diçirise.

Brayê min !! Dizanim ko tu pê kaniyekê digerî. Havîna dilê te wê honikayiyê dixwaze.

Were, di wê de, bêdengiyeke nerm heye, ew bilindayî hêlîn û welatê me ye.

Em hêlîna xwe li ser dara paşiyê ava bikin. Eylo bi nikilên xwe ji me re dê zad bînin. Belê em tu caran destê xwe dirêjî xwarina ko mirovên kêm û peyayên pîs jê dixwin, na kin. Ewê destên xwe ên bêşerm dirêjî xwarina me bikin û pê dev û zmanên xwe bişewitînin.

Emê wek eylo, wek berf û çiyan di rex bayê xurt de, bijîn. Emê carekî wek bayekî zor bi mirovên pîs û peyayên kêm bikevin û bihna wan bigirin.

Brayê min !! li dijminên xwe re bike şîretan, bila ber bi bayî ve tif ne kin.

---

BRAYÊN DELAL !..

XWENDIN Û NIVÎSANDINA ZMANÊ XWE

HÎN BIBIN Û HÎN BIKIN

## ÇEND RÛPEL JI EDEBIYATA WELATÎ

### 1- ŞAHIR Û EDIBÊN ME ÊN KEVIN
### A- ÇEND GOTIN LI SER JIYÎNA WAN

ELÎ HERÎRÎ - Di nav şahirên kurdmanc de yên ko piştî islamiyetê rabûne û bi kurdmancî nivîsandine ; ê pêşîn Elî Herîrî ye.(Xwedê rehmeta xwe lê erzan bike û heke di ser bihuştê re bihuşteke dih,bihuşteke bijarte heye, cih û meqamê wî tê de çêke.) Gundê wî Herîr di welatê Soran de ye û Elî bi xwe sorî ye . Dîwana wî heye . Kurdîzan ê ûris , bi nav û deng Melayê Jaba der heqê Elî Herîrî dibêje :" Şahirê berê, Elî Herîrî ye . Şahir û qesayid, ji gundek e , di cihê û nehya Şemzdînan di sencaxa Hekariyan de .Texmîna ko di tarixa çar sedê hicretê de peyda bûye û di çar sed û heftê û yekê de merhûm bûye û di nav Herîrê de medfûn e."

MELAYÊ CIZERÎ - Mela li cem hemî kurdmancan, nemaze li cem feqehan gelek nas e .Mela şahirekî mitesewuf e, dîwana wî di sala 1919 an de li Stenbolê ketiye çapê.Beriya wê li Petersburg(St-Petersbourg,bajarek ûris e.) ê jî hati bû çap kirin.Çapa Petersburgê çapeke lîtografîk e . Melayê Jaba di heqê wî de dibêje :" Eslê wî ji Cizîra Bihtan e.Navê wî Şex Ehmed e.Di tarîxa pecsed û çilî(hicrî) de di nav Cizîrê de hatiye dinê. Di wî wextî Mîr Îmadedîn li Cizîrê mîr bû û xweheke mîr hebû. Şex Ehmed hevîndarê wê bû , bi vê hevînê gelek xezel gotiye û dîwanek çêkiriye . Rojek Mîr Îmadedîn ew Şex Ehmed ceribandiye ko evîndarek ji dil e, û xweha xwe da ê.Şex Ehmed qebûl ne kiriye . Şex Ehmed di tarîxa pênc sed û pêncî û şeşê de merhûm bûye û wî li Cizîrê veşartine.Mezelê wî ziyaretgaha xelkê ye."

Dibêjin ko Mela li Westaniyê ,li ber şetê Cizîrê , li ser kuçekî rûdinişt û şihrên xwe dinivîsandin . Ji cizba wî kuç welê disincirî ko, piştî ko Mela jê radibû jin diçûn wî kuçî û nanên xwe pê ve didan û dipijandin . Xelkê Cizîrê hêj pê bawer e .

FEQEHÊ TEYRAN - Melayê Jaba di heqê Feqehê Teyran de dibêje :" Şahirê sisiyan Feqehê Teyran e , ko navê wî Mihemed e .Eslê wî ji qeseba Miksê ye ,welatê Hekariyan e . Di tarîxa heft sed û didowan de hatiye dinê. Hikayeta Şêxê Senhanî û Qiseya bersiyayî ji mewzûn gotiye û Qewlê hespê reş jî wisanî mewzûn gotiye û zehf beyt û şihîr jî qewî nilemeh û rengîn gotine . Navê wî jî di şihrê de "Mîm û Hey"e. û bi qasî heftê û pênc salan jiye û di tarîxa heft sed û heftê û heft da miriye û wî li Miksê veşartine . "

Gelo Feqehê Teyran kî bû ? û navê wî çi bû ? Ji ber ko Feqehê Teyran leqebê şahir e û ne navê wî ye .Di dawiya "Hikayeta Şexê Senhanî" nivîsvanê nisxeyê bi erebî nivîsiye ko :" Qesîdea wesfê şêxê senhanî ya ko Mîr Mihemed nezil kiriye tenam bûye .Ev Mîr Mihemed bi navê Feqehê Teyran meşhûr e." Li gora vê şerhê Feqehê Teyran mîr bû û navê wî Mihemed bû .Lê mîrê kijan welatî ?Heye ko ji mîrên Miksê bi xwe be.

MELAYÊ BATE - Navê wî jî Mela Ehmed e . Eslê wî ji Bate ye. Bate gundek e, li Behdînan û li nîzikî Amedîyê di sencaxa Hekariyan de ye . Di tarîxa heşt sed û bîstî(hicrî) de hatiye dinê . Gelek şihîr û ebyat gotine . Dîwaneke mexsûs heye qewî qenc e, xenji dîwanê mewlûdeke kurdmancî gotiye . Heştî salî emir kiriye û di neh sedê hicrî de miriye. Di nav gundê Bate de veşartî ye .

Axayê BÊDARÎ- Zanînên me li ser jiyîna vî şahîrê gelek kêm in. Di pey Bate de rabûye . Bi kurdmanciyek gelek xwerû şihîrên xwe nivîsiye.

EHMEDÊ XANÎ- Xanî di wextekî welê de rabû ko-beriya niho bi sê sed û sih û şeş salan (1632)- ne li cem me , lê li Ewropayê jî xelk hêj li miliyet û nijadê xwe hişyar ne bû bûn û zelamên ji yek miletî hev û din jâ bo ketolîkî an protestaniyê dikuştin. Di heyameke welê de Ehmedê Xanî bîra miliyeta xwe , bîra kurdaniya xwe biri bû û ji kurdan re goti bû hon herî her tiştî kurd in, rabin ser xwe, dewletekî kurdî çêkin û bindestiya miletên dirn din me kin.

Melayê Jaba der heqê Xanî gotiye :" Eslê wî ji tayifeyê Hekariyan ji eşîreta Xaniyan e. Bi xwe hatiye Beyazîd ê .Di zmanê kurmancî de Memozîn nav kitêbek aşiq û maşuqan gotiye û kitêbek lixet jî bi kurdmancî û erebî gotiye , navê wê Nûbihar e .Zarok , di welatê kurda de piştî Quranê wê dixweynin . Xanî zehf jî xezel û şihîr û beyt bi zmanê kurdmancî de gotiye . Û ji şahirên kurdan ê meşhurtir ew e, belkî ji hemî şahiran meqbûl û memdûh e. Şest û sê sal emir kiriye . Di nav Beyazîdê-de mizgeftekî bi navê xwe daye avakirin, li kêleka mizgeftê da veşartî ye."

Xanî li Beyazîdê dibistanek jî danî bû û tê de dersa zaroka bi kurdmancî digot . Di pey mirina wî re şagirtê wî Smaîl bîst salên din li wê dibistanê guhdar bû û dersên kurdmancî tê de gotin .

Ehmedî Xanî herwekî bi xwe gotiye , Mem û Zîn ji xwe re kirine behane bi wê hincetê kula dilê xwe bi derd daye , derdên miletê xwe ê kher û lal bi zman kiriye û ew axivandiye .

Memozîna Xanî di sala 1919 an de li Stenbolê hatiye çap kirin. Seyda Hemze dibaçeyek nivîsandiye û tê de dibêje ko Xanî Nûbara xwe di sala 1094 ê hicrî, de nivîsandiye. Li gora vê tarîxê berî qedandina Memozînê bi neh salan. Tirba Xanî li Beyazîdê ziyaretgaha xelkê ye.

SMAÎLÊ BEYAZÎDÎ- Eslê wî ji Beyazîdê ye , ji şagirdên di Ehmedê Xanî ye. Di hezar û şêst û pêncê hicretê de hatiye dinê û di hezar û ... û sed û bîst û yekê de miriye . Ferhengekî bi kurmancî erebî û farisî bi navê Gulzar nivîsandiye ko zarokên welat dixwînin. Xenji wê gelek şihîr û xezel û beyt bi zmanê kurdmancî gotiye. Cehda wî bi nav û deng e. Di nav Beyazîdê de miriye û gora wî li wê derê ye .

ŞEREF-XAN - Melayê Jaba di heqe Şeref-Xan de gotiye :" Ji mîrê di Hekeriyan e. Di sala hezar û sed û yekê de li Colemergê ko cihê hikûmeta Hekariyan e , hatiye dinê . Bi zmanê kurdmancî û farisî gelek şihîr û beyt gotiye. Di sala hezar û sed û yekê de miriye. Gora wî li Colemergê ye .

MIRAD-XAN - Melayê Jaba di der heqa wî de gotiye :"Mirad-Xan di tarîxa hezar û sed û pêncî yî nda li Beyazîdê da hatiye dinê .Ewî jî gelek şihîr û beyt bi zmanê kurdmancî gotiye û û di hezar û du sed û nehê da miriye ."

SIYEHPÛŞ - Sed heyf û mixabin ko di heqê wî şahîrê hêja de em tu tiştî ni zanin , xenji çend şihîrên gelek giranbiha ko mane heta îro. Ji şçihîrên wî tê zanîn ko piştî Xanî de rabû ye .

MEWLANA XALID- Şêx Xalid ZIYAEDÎN di terîqeta neqşîbendî de şihba Xalidî daniye. Ji kurdê Sileymaniyê ye.Li sala 1242 an ê hicrî da li Şamê miriye .Di çiyayê Çilyaran da veşartiy ye . Şahirekî mitesewif e, Diwanek nivîsandiye , lê di bêjeyê wî de gelek yên farisî hene. Ji ber ko zmanê wî ne xwerû ye , hinek dibêjin wî bi nîkurdî nivîsandiye .

MELA XELÎLÊ SÊRTÎ - Mela Xelîl di wexta Mela Yehyayê Mizûrî de rabûye. Lêbelê herwekî derheqa van her du mela yên hêja tiştekî pir ni zanin me her diwa bi hev ra bi nav kir . Hinek şihîrê wan mane heta îro .Xenji van şihîran kitêba ko Mela Xelîl nivîsandiye ji aliyê gelek feqehan hêj tê xwendin .Ev kitêb Nehcel Enam e .

N A L Î- Ji şahirên Soran e. Diwana wî di sala 1931 ê de li Bexdayê çap bûye û yên ko dîwan dane çap kirin bi serhatiya Nalî ji tê de gotine . Jê dixuye ko Nalî leqeba şahir e , navê wî Mela Xidir e, Nalî di sala 1215 ê hicrî de , li Şarezorê ji deya xwe bûye . Di sala 1255 an de çûye Stenbolê û heta dawiya emre xwe li wê der ma û di sala 1273 an de wefat kir.Li Stenbolê di gornistana Eba-eyûbê-ensarî de veşartiye .

HACÎ QADIRÊ KOYÎ- Hacî Qadirê Koyî Xaniyê didowan e .Ew jî weke Xanî bi derdê miletê xwe dişewitî . Şihîr û qesîdeyên wî tev de li ser milet û welêt in .

Çend şihîrên Hacî Qadir di sala 1925 an de li Bexdayê di bin navê "Komela Hacî Qadirê Koyî" de çap kirine . Di vê komelê de biserhatiya, Hacî jî gotine . Li gora wê komelê Hacî Qadir kurê Mela Ehmed e, di gundê Gorqeracê de ji deya xwe bûye , û ji eşira Zengenê ye. Lê ji ber ko di zarotiya xwe guhastiye Koyê navê "Koyî" pê ve bûye .

Hacî jî weke nalî çûye Stenbolê û ketiye civata edîb û şahirên Stenbolê . Ji şahirên wê heyamê pirê wan farisiya xwe li ber destên hacî xwendine .

Hacî dîwaneke mezin heye , bi destnivîseke hûr qederî 800 rûpel e . Lê hêj ne hatiye çap kirinê .

ŞEX NÛREDÎNÊ BIRÎFKÎ - Ji eserên wî "Çîroka Siltan Ebûbekrê Şiblî di destên me de heye .Em ni zanin ko eserên din nivîsandiye an ne.

EVDIREHMANÊ AXTEBÎ - Kitêbeke wî heye bi navê "Rewzel Neîm" tê de qala wesfên pêxember û mîraca wî dike . Kitêb menzûm e û 360 rûpel in. Kitêb di sala 1302 ê hicrî de hatiye nivîsandin .

ELÎ TEREMAXÎ- Jaba dibêje ko kurdmancan heta 1000 ê hicrî ilmên din û şerîetê bi zmanê erebî dixwendin .Piştî vî tarîxê melayek bi navê Elî , ji gundê Teremaxê , ji qeza Miksê rabûye û ji ber xwendinê çû heta Bexdayê . Elî li medresên Bexda, Mûsil, Behdînan û Soran de xwend û di nav zanayên heyama xwe de zanakî serdest e . Piştî ko vegeriya welatê xwe rabû di gundê xwe de medreseyek ava kir û bi zmanê kurdmancî kitêbeke tesrîfê jî çêkir û dersa feqehên xwe bi kurdmancî got .Ew kitêb niho li her aliyê welêt tê xwendin .

MELA ÛNISÊ ERQETÎNÎ - Jê re melayê helqetînî jî dibêjin.Erqetîn an Helqetîn gundê wî ye. Vî melayî daye pey Elî Teremaxî û kitêbên tesrîf , zirûf û terkîbê bi zmanê kurdmancî nivîsandine .

MELAYÊ ERWASÊ- Kitêbeke piçûk , lê gelek hêja nivîsandiye.Kitêba wî li ser nexweşîn û dermanên wen e .Mela tê de qala nexweşînan dike û dermanê her nexweşînê û çêkirina dermanên jî dibêje. Di wextê Evdil-Xan bavê Bedir-Xan de rabûye . Beriya niho bi 180 salî jiye . Ji kitêba wî re Tiba Melayê Erwasê dibêjin .

Xen ji van şahiran gelek şahîr û edîbên din jî hene ko em li ser jiyîna wan û eserên wan pir hindik tişt dizanin divê ko zanayên me gelek bixebitin ji bo temam kirina zanînên me di der heqa wan de .

AXAYÊ BÊDARÎ , AXAYOK , MELA YEHYAYÊ MIZÛRÎ , HECÎ FETAHÊ HEZROYÎ , ŞÊX MIHEMEDÊ HADÎ , ŞÊX EVDIREHMANÊ TAXÊ , ŞÊX RIZA ji edîbên ko bi kurdmancî nivîsandin û jiyîna wan û eserên wan di tariya nezaniyê de mayiye ji bo me .

Me tenê şahîr û edîb yên ko bi zmanê xwe kitêban nivîsandine bi çend gotinan ji nû ve bi bîr hanî .Xenji wan hinek edîb û şahîrê kurd hene ko pir bi nav û deng in , lê wan bi zmanên biyanî, bi farisî, bi tirkî , bi erebî nivisandin .

Ferhenga frensizî bi nav û deng "Nouveau petit Larousse" di çapa xwe a 1968 de li rûpelê 1357 di benda FUZÛLÎ de :" Ev şahîrê mezin bi eslê xwe kurd e . Lê dîwanê xwe bi erebî, farisî , tirkî nivîsandiye .

Hemî rojhilatnas ji me re didin zanîn ko NEF'Î û NABÎ jî kurd in , lê kitêbên xwe bi tirkî nivîsandin .

Ji mîrên Bedlîsê , dîrokvanê kurd Şeref-Xan dîroka kurdên heyama xwe bi farisî nivîsand.Ev kitêb hatiye guhaztin bi frensizî û erebî.

B-ÇEND ŞIHÎR JI VAN ŞAHÎRÊN KEVIN (KLASIKÊN KURDA)

Dîlberê îro seher avête cerkê min du dox
Yek li sîne ,yek li dil da lew ji min tên ax û ox
Ah û oxên min ji dil tên , ew ji ber tîra qizil tên
Yan ji kowanên di kil tên, jê dizên her xûn û zox
Xûn ji dil co co rewan tê , wek eqîq û erxewan tê
Lê ji dest selwa ciwan tê ,ew şepala şeng û şox
Ew şepala şox û şengê, kafira rom û firengê
Da me ber cihtek xedengê zalimê kuştim bi dox
Zalimê kuştim şepalê , nazikê qencêt delalê
Bûn hicaba zilf û xalê berqe'e ala û tox
Nitrik û tayên bi rîşî yê di zêrîn pê veweşî
Min dû fêris dîn di pêşî , mirwet û insaf yox
Lew heriftim ez ji meylê, şibhetî sehl û sihêlê
Mihbet û eşqa delîlê ez kirim yekser pilox
Dest nêhêlim ez ji dînê şibhî Ferhad û Şîrînê
Dê ji ber eşq û evînê min direçit ev kilox
Sibheta çerx û sema tê, wek Melê sed nibtela tê
Zenzen û ava heyatê miçterî sed şêx û şox

Melayê CIZERÎ

Xelkno , li min kin şîretê ew dîlbera zêrîn kemer
Min dî di halê xefletê hat der ji bircê wek qemer
Hat der ji bircê û penceran dil girt û da ber xenceran
Ev reng e halê dîlberan lew aşiqan xwîn bû ceger
Qelb û ceger min bûn birîn lewra ko jê tên av û xwîn
Ey can were halim bibîn da rûh ji qalib bête der
Canê min bête ser cesed mizgîn bi afaqan resed
Alem hemî pê bin hesed însan û cîn û canewer
Alem hemî têk bûne sef seyirîn li şahê min bi xef
Hatin temaşa çarteraf şatir xumar tayin di ber
Hat padî ahê pir sipah qamet elîf dêm şibhê mah
Dad û meded sed ah û ah zilf û eqarîp têne ser
Kuştine xelkino eqrebê mestim ji şewqa xebxebê

Talî tenê min d'kewkebê îro eqarib têne der
Îro eqarîb hate xar çû nîvê baxê gulîzar
Ew bê ceyê her lê bihar lew bilbilan lê qal û şer
Bê hed ji dil nalî û keyb da bexçeyê rîdwan û xeyb
Wan naliyan nînin çi eyb sohtîne em dil bû seqer
Sohtin li min cerg û hinan werdên di dor girtin xunav
Zilf hate ser lêkir belav bayê nesîm wextê seher
Tirsim mixalif ba ditê zilfên di dora cebhetê
Rakit giyam wê saetê alem bibit zîr û zeber
Zahir dibêjin pendegîr da dil ne dî zilfa hesîr
Şibhê Melê d'mînî esîr guh dêre qewlê muteber.

Melayê CIZERÎ

Bizan ko min yar ti wî
Ez ... yekcar ti wî
Bê dest û hem pa ti wî
Ê b'xezeb xwendî ez im
Zencîr bi zendê ez im
Aşiqê cindî ez im
Xweş qed û ehla tu wî
Şux bejn û bala tu wî
Pir bext û tala tu wî

Dûr ji wisalê ez im
Îsa li erdan tu wî

Dil jî birîndar ti wî
Çi bikim ko min var ti wî
Pir li min kubar ti wî
Di qeydû bendê ez im
Miştaqî rindî ez im
Perwazî findê ez im
Cama piyala tu wî
Delala mala tu wî
Nîmeta ala tu wî

Yar di xeyalê ez im
Bi girt û berdan tu wî.

Feqehê TEYRAN

Hemdê bêhed bo Xudayê alemîn
Wî Xudayî daye me dînê mibîn
Em kirine imeta xeyrel beşer
Tabihî wî miqtedayê namwer
Wî Xudayî malikê milkê ezîm
Daye me mîras Qurana kerîm

Bo cemihî mislimîn û salihe
Bo feqîrê Bate jî el-fatîhe

Melayê BATE (Mewlûd)

BIDERKETINA ŞEHRIYAN E BI DESTÊ
JI BO SEYRANA SERSAL Û GEŞTÊ
Dewra felekê ji bexti fêrûz
Dîsan ko nina ji nû ve newrûz
Mebnî li wê adetê mibarek
Şehrî î spahiyan bi carek
Bajar û kelat û xanî berdan
Teşbîh bi nijdiyan û cerdan
Sef sef dineşîne kûh û deştan
Ref ref dixweşîne seyr û geştan
Esnafî îmem sixar û kub-bar
Qetha ve ne ma di şehri dey-yar
Hindek bi peyarî çûne baxan
Hindek bi siwarî çûne raxan
Hindek bi tebayî û bi kesret
Hindek bi hevalî û bi wehdet
Rabûne ve xanim û xewatîn
Wan jî tejî gul kirin besatîn

Hûran kire meskenê xwe cen-net
Bê perdê û bê melal û min-net
Dûşîze û duxter û rewalan
Pakîze izar û zilf û xalan
Etrab û kewaibê di ezra
Merdan û mirahîqê di zîba
Eshabi qimaş litfi rixsar
Erbabi metah hisnî dîdar
Wan lêk dikirin metah yek erz
Texmîn dikirin bi tûl û w'elerz
Sewdakeri eşq bûn di bazar
Hem bayii hisn û hem xerîdar
Sersalî û bakir û rewalan
Sedsalî ciwan û pîr û kalan
Sersal li resm û rahi mahûd
Gêran diçû meqami mehmûd .

Ehmedê XANÎ (MEMOZÎN )

Sazî dilî kul bi zîr û bem bit
Sazendeyê eşqî Zîn û Mem bit
Şerha xemî dil bikim fesane
Zînê û Memî bikim behane
Nexmê we ji perdeyê derînim
Zînê û Memî ji nû ve vejînim
Derman bikim ez ewan dewa kim
Wan bê mededan ji nû ve^ rakim
Meşhûr bikim bi terz û islûb
Mimtaz bikim mihib û mehbûb
Ewreng bikim ji nû serefrez
Da bîne temaşeyî nezerbaz
Dîlber li Memî bikin girînê
Aşiq bikenin bi derdê Zînê.

Ev meywe eger xerab e ger qenc
Kêşaye digel wî me du sed renc
Ev meywe eger me avdar e
Kurmancî ye ev qeder li kar e
Ev tifle eger ne nazenîn e
Nûbar e bi min qewî şêrîn e
Ev meywe eger ne pir lezîz e
Ev tifle bi min qewî ezîz e
Mehbûb û libas û gûşwar e
Milkê di min in ne mistear e .

Ez pîlewer im ne gewherî me
Xodreste me ez ne perwerî me
Kurmanc im û kûhî kenarî
Ev çend xeber in di kurdwarî.

Ehmedî XANÎ (M E M O Z Î N)

Dîlberek min dî bi çavan
Agirek berda hinavan
Şemh û rihniya zilamê
Zilf û xalên û temamî
Şerbeta şîrînkelamê
Sed şikir îro selamê
Şerh û teqrîrê Isamê
Reng û elwanê di Camî

Sed elfîf pabûsî bû
Şemh û der fanûsî bû .
Agirek berda di amê
Qeyd kirin mehbûs bi damê
Terkî min nadit midamê
Kir li min taze xulamê
Fikr û teswîrê kelamê
Şibhetî tawûsî bû

Şibhetî çavê duyengê
Mir-reyê tîra xedengê
Kes ne dî qet wî çi rengî
Qet ne ma qet wî çi rengî
Sifdera mêrê du cengê
Sed hezaran wek bi şengê

Qews û ebrûyê du bengê
Zilf û xal û xuncerengê
Neqşê maçîn û firengê
Hikmeta Temûr û lengî
Şêr û nexmûr û pilingê
Hikmekî kawûsî bû.

Min qebûl e hikmê rindan
Lê çi bêjim qewl û bendan
Zehmetek wan pir bi min dan

Sexweş û sûretlewendan
Ketme tora lehl û xendan
Kefşe bim wek gaz û sindan

Dil hedef kir tîr li min dan
Bê eded cewher bi min dan
Xenzeyê pir mekr û fendan

Lê ji halê nestemendan
Lewmonoşê can bi der dan
Lê li min casûsî bû .

Lê li min berda girînê
Bê sebeb ketme nivînê
Lê ji ber hisna şerînê
Kanî hûra ser zemînê
Ev bi xef, halim bibînî
Zilf û xal û xemrevînê

Mihbeta wê nazenînê
Ax û efxan û enînê
Şeq bû bedra yasemînê
Carekê bête girînê
Merhema bavê birînê
Bo me calînosî bû.

Zilf û xal û mest û naz e
Gerdenê gerdenfiraz e
Cerd dikin ehlê mecazê
Xef dibin esrar û raze
Ez çi kim sewm û nemaz e
Min ji dest tembûr û saz e

Işweyê wan xemzebaz e
Lê ji eşqa rûyê taze
Ta sedî yasî û qaze
.....................
Kar û şixl û bê niyaz e
Dil wekî naqûsî bû .

Dil ebîr û mest û mîrê
Da li min derbek bi tîrê
Kirme hib-ba zemherîrê
Kanî Melayê Cizerî

Begler û şah û wezîrê
Ta li mir'nê min vebîrê
Sîne kir armanc li tîrê
Mek-kî û Elyê Herîrî

Xanî , Şêxê Babeşîrê
Xemrî î gîs û herîrî
Bên li dengê min feqîrê
Şev li min kabûsî bû

Şev dikim nalîn û zarî
Ey Siyehpûş tu xumar î
Çend Siyehpûş tu sitar î
Dir û yaqût û mirarî
Hespê şahê şehsiwar î
Şibhetî teyrê Biharê
Sahibê adab û kar î
Lê bi eşqa dil ni karî
Misk û enber jê dibarî
Angeh ez pabûsî bûm .

Dilberê ehlê dilan bû
Qatilê cergê pijan bû
Qasidê rûh û we can bû .

S I Y E H P Û Ş

Tawûs bi vî şiklê melîh
Ew qijika gûxwer binêr
Şêrê ji heft bavê xwe şêr
Tûlepîsê heft kûçikan
Nanî cehî têr naxwitin
Simbêl û çavan bel dikit
Fezl û terîqa neqşebend
Ew dîzika şorbe di nêv
Fezl û terîqa sofiyan
Ew nêriyê lehyetewîl
Fezl û terîqa aliman
Cismê kulindê sermezin
Fezl û terîqa qadirî
Ew şeq şeq a asî , yeqîn
Şermendeyê saqê di reş
Qij qij dikit elwan im ez
Dawayî şêrî naketin
Ewew dikit erslan im ez
Tiştek di malê de niye
Zebaşiyê qewman im ez
Ger ew bi şorbe germ biya
Dê şêxê Bestamî biya
Ger ew bi reh beh'ta wicûd
Dê bê guman sofî biya
Ger bi şaşa gir biya
Dê qazî beyzawî biya
Ger teq teq û şeq şeq biya
Dê qulbê gelanî biwa

A X A Y O K

Çi tedbîr ey misilmanan
Ne tersa me yehûdiyem
Ne beriyem ,ne behriyem
Ne ez erkanî tebhiyem
Ne ez Çîn im ,ne ez Hind im
Ne ez milkê Iraqê me
Ne ez av im, ne ez ba me
Ne ez dinya , ne ez iqba
Nîşan im bê nîşan başed
Ne ten başed ne can başed
Ne baba me , ne dada me
Li ser wechê çiraya me
Ji efxana bes e salek
Ji bo mibihan hero carek
Kî men xod ra nemîdanem
Ne gebr û ne misilmanem
Ne şerqiyem ne xerbiyem
Ne ez eflakî gerdan im
Ne ez Bilxar û Maçîn im
Ne ez xakî Xuristan im
Ne ez xak im ne ez ateş
Ne ez Firdewsî Ridwan im
Mekan im lamekan başed
Ne min ez canî canan im
Ne ema me , ne xala me
Dikim îro di efxan im
Ji maşûqan bes e yarek
Welî bim ez bi çeşman im.

MEWLANA XALID

Tu guh dêre nitq û beyana fesîh
Ji bo ferz û eynan e merdê melîh
Ko îslam û îman û sewm û selat
Li ser malîdaran e hec û zekat
Li ser te ji ferzan e ey nûrî can
Bizanî tu erkan û şertê di wan
Heçî hikmê şerhê tu mihtac dibî
Ji bo zanîna wî tu minqad dibî
We lêken qe yek bê yekî nabitin
Misilmanî bê her dîwan nabitin

Mela XELÎLÊ SERTÎ

Zemane resmi caranî ne mawe
Çiraxi nazim û minşî kujawe
Le dewri ême roman û cerîde
Egerçî meqsed e , zanînî baw e
Eman qedrê bizane em kitêbe .
Le dinya êstekî hemtay ne maw
Le eyamî heyatî şêxî Xanî
Le ser nisxey xet ew nûsirawe
Le layî erbabi xoy qedr û qîmet
Xeziney gewher e, û kîsey diraw e.
Le mecmûhi diwel, Soran û Botan
Le sayey em kitêbe nasirawe
Le kurdan xeyrî Hacî û şêxî Xanî
Esasi nezmi kurdî danenawe .

Hacî Qadirê K O Y Î (Komela,bi zarê sorî)

Ev bendeyî şêxî cihan
Zahir bikim qutbî zeman
Şêxek hebû xewsê dinê
Ne d'hate xab û xwarinê.
Navê ewî qutbî şerîf
Yekser dibû wek mû zeîf
Eslê terîqa şêx çi ye
Şêx hakimek farîsî ye
Mîrê nihawendî bû ew

Lazim divî sira nihan
Da hon bizanin qisetê
Insah hemî jê bûn xenî
Daîm bi terka lezetê
Şiblî Ebûbekrê zerîf
Daîm bi tirs û xeşyetê
Ewil emîrî şahiye
Siltanê mîr û şewketê
Şahê semerqendî bû ew .

Şêx Nûredînê BIRÎFKÎ (Ji qesîda Ebûbekrê Şiblî)

2- ÇEND HELBEST (ŞIHÎR) JI HELBESTVANÊN KURD
YÊN Q I R N A B Î S T Î

SERXWERABÛNA MIRÎŞKAN

Li welatê me Xerza ,
Dîkek hebû şehreza .

Rabin bêjin mirîşkan
Bes xwe bidin enîşkan.

Leşker tev de bûne yek,
Hin çeleng û kulek .

Teyra dî ko nagehan ,
Hatî leşkerkî giran.

Ew jî li hev bûne kom,
Yekî rabû gote bûm .

Rabe ser xwe tu mîro ,
Ji bo me bêje îro ;

Bûm kenî û gote wan :
Ba kin bazê pahlewan .

Go rabe ey tu bazî ,
Şeh te îro dixwazî .

Rokê ew çû nav dîka ,
Ji wan re go hêdîka :

Dîk û mirîşk bûne kom
Berê xwe dane cem bûm .

Berê xwe dane çolê ,
Tevlî koç û tev êlê .

Tev de firîn ji malan,
Berê xwe dane balan .

Ey padîşahê teyran ,
Wey ser bilindê Tûran .

Ev leşkerê bê jimar
Gelo heye jê şimar .

Hudhud rabû serefraz ;
Wî çû bi lez gote baz:

Baz çû cem şeh li banî ;
Destên xwe l'ser hev danî .

Go ey xwendekarê min ,
Zû li min ke barê min :

Bazî rabû weke şêr ,
Firek da xwe hate jêr.

Destê wî girt û hêjand ,
Nitqek jê re dirijand .

"Sîzîn burda ne îş war ?"(2)
Dîk xeyîdî lê da dar .

Go bi zor û bi gazin ,
Em heqê xwe dixwazin .

Ez im paşa ,ez im mîr ,
Ez im şahê cihangîr .

Tevan go paşa û mîr ,
Kesî ne got, ez wezîr .

Bazî rabû çû banî ,
Li ber destên bûm danî .

Ev hatine ji mala xwe,
Divên istiqlala xwe .

Go tev paşa û mîr in ;
Bê wezîr û gizîr in .

Go bi taca serê min ,
Kes nîne hemberê min ,

Hatin teyrên dubirak ,
Ba kirin kund û qirak .

Dîka xwe da enîşka ,
Bû qîrqîra mirîşka .

Ê ko kuştin ê ko man ,
Hatin gundan bê goman .

Elok û tûtik û qaz ,
Tev de bûne belengaz .

Wek seydayê Cegerxwîn ,
Henî bûne dilbirîn .

Bûm gote bazê xwînxwar :
Bi lez rabe here xwar.

Bazê terî bi rêşî ,
Hate cem dîkê pêşî .

"Clan sen nêrelîsin ?" (1)
Go em xelkê Bedlîs in .

Bazî şehda xwe anî ,
Dîk jî darê xwe danî .

Baz go kî ye serleşker ?
Go tu nizanî ey ker ?

Bazî çû cem dîkê dî ,
Dî ko ew jî wekî wî .

Nefer bûne yûzbaşî ,
Heta giha ê paşî ,

Tilûr tev lê bûne kom ,
"Qale ya ey-yûhel qewm ."

Bûm got bazê dilawer ,
Gelo kî ye serleşker .

Bûm hêdî rabû ser xwe ,
Taca xwe da serê xwe .

Rabin wek pehlewana ,
Dê em herin ser wana .

Go hon werin binêrin ,
Ka em îro çi mêr in .

Go fermana we rabû ,
Koma wa j' hev bela bû .

Wan jî weke me kurdan ,
Destê xwe j' ber xwe berdan .

Tev de ketin koxê reş ,
Çîroka me ji we re xweş .

C E G E R X W Î N (Dîwana EWIL )

........

Bes e , hon ji xew rabin , ez gorî zû ,
Ji zarokên xwe re bêjin ilmên nû .

..........................

Ew kesê bê xwendin û eql û zanîn ,
Li rêza kera ye ,çi bi dîn û çi bê dîn .
Cegerxwîn(Ji pendname yê)

(1) Yanî : Kuro tu ji kû yî ?
(2) Yanî : Îşê we li wir çi ye ?

DAXÊN SÎNGÊ

Dîsa ji ber jana emîn ,
Min tên ji dil sed ax û ox.

Daxên li sîngê axivîn ,
Her jê dizêtin xwîn û zox .

Xwîn tê ji van daxê di kul ,
Ker ker dibit , mêlak û dil .

Dişkên li min tev pişt û mil,
Gava ko tê ew şeng û şox .

Şoxqanetê wê saetê ,
Da min nîşan xal û xetê .

Gava me dî bû dil ketê ,
Min secde bir ebrû û rox .

Ebrû qezeh , çavin qedeh ,
Min pê dikir kêf û fereh .

Bejnan zirav, misk û gulaw,
Xeftan bi ser.. de şal û çox.

Xeftan li bejnê çox û şal ,
Sed Ristem û Ferhad û Zal .

Wê nazika rind û delal ,
Kuştî ne heryek ew bi.. dox.

Sed dox li sîngê xistine
Mêlag û dil derxistine .

Zinar û kember bestine ,
Lê rakişandin tîr û hox .

Pir tîr û hox, wê lê kişand ,
Agir bi ser de lê reşand...

Tîra kevanê reş weşand ,
Danî ceger.., xwîn bû kulox.

CEGERXWÎN(Dîwan -1)

DELALIYA ZAROWAN

Binve xweşiya dil û du çavan ,
Dadê ji tere hero, nigehban ,
Da zû tu mezin bibî Bedir-Xan,
Binve kezeba min binve lo ! lo !

Hişyar me be, niho ne qenc e ,
Landik ji te re bizane genc e ,
Bê xew mebe paşiya wê renc e,
Binve kezeba min binve lo! lo!

Xweşhal î wekî kevok û berxan ,
Fekrandina te melek jî heyran,
Pak e neseba te dadê qurban ,
Binve kezeba min binve lo! lo!

Dewra felekê li ser me kîn e ,
Bextê me reş e , kezeb birîn e ,
Mesken ji me re niho nivîn e ,
Binve kezeba min binve lo! lo!

Ne mal û ne saxî û ne rahet ,
Talan kirine hemî ji mihnet ;
Dişwar e gelek belayê xurbet,
Binve kezeba min binve lo! lo!

Çerxa felekê wekî nesîm e ,
Ho nabe , Xwedê gelek rehîm e,
Roja xweşiyê dibit kerîm e ,
Binve kezeba min binve lo! lo!

Hewqas tu me bêje ev çi hal e ,
Bê sebr me be welê me nale ,
Ewn û kerema Xwedê heval e ,
Binve kezeba min binve lo! lo!

Emîn Alî Bedir-Xan

Estêre berzekan edrewşênewe be şew,
Wek min be daxewen ne sirewtyan heye ne xew

Caran ! de roj be heçeheç u bareberiywe
Şesterehêle,lêzme u baran u teriyewe .
Roj baperî,wirêne şew, raperîn, tekan
Bawêşk y lerz u balefire, coqecoq y dan.

Ebê bexsinde mil keç ka le ast y mûcexor y xoy,
Surahî bo piyale ser firû dênê ke têka boy)

Dwênê be tewbeyek qedeheken şikand ,
Emro be xwên y ew qedehe tobekem şikand .

Emsal beherman ke bê barane ,
Gulale y sûrman cerg y herane,
Le her sê lawe saiye berîze ,
Xenebendan y xwên y azîze .

Elên salêk duwanze mange ,
Min mangin dî çuwarde sale .

Pîremêrd (Bi zarî sorî)

Ewane y kewa wefa nazanin
Demim nayênê bilên însan in.

Grînan buît e Hitler birwan e
Kewte ber le'net bira y şeytan e.

Xozge ew kesey be zol der eçû
Ewîş wek êstir ber y ebû .

Rê y rast emîn e eger piya biroy
Le lay hemû kes bêgane nîyt xoy.

Nazanim mirdin boç wa asane
Berew pîrî y merg şaîy û seyran e.

Wek xak be feys be bo hawcins y xot
Xakîş ebête dayk y dilsoz bot.

Şwanit le kuîexa y lawe çaktir e
Dest y bêgane mary pê bigre .

Pîremêrd(Bi zarî sorî)

## NEXWEŞÎ Û NEZANÎ

Bavo nexweş in, serê min têşî
Ah dilê min têşî !
Gorî te bibim , çinan tu têşî
Anan tu dikêşî ?
Derdê me yeman e , nîne derman
Dijwar û giran e .
Rabe te bibim li ber piyên şêx,
Ew bo me aman e .
Ah ma çi bikim, li çi siwar bim ?
Ha va ye kerê reş .
Xurşîdê nexweş ,li ser kerê reş,
Pal daye wisa xweş ;
Dermale bi ben girtiye kalo
Û tev de ketin rê .
Hêstir dirêjin xwas û perîşan,
Ew bavik û ew dê .
Êvarê gihan xanegeha şêx
Ew tazî û birçî .
Pal dane li ber xanegehê tev ,
Bê xwarin û bê cî.
Hawîr dibezin qîr û sena yé ,
Yan pesnê Xuda ye .
Xanîkî mezin pan û bilind e ;
Manendî sera ye .
Sofî digerî çav li serî zoq,
Derket ji wî xanî .
Go ka we ji tekyê re çi anî
Şêxê we dizanî .
Kalo beziya dest û piyan ,go:
Qurban çi bikim ez ?
Malê me ne bû, va ye me anî
Her bi tenê pez .
Dermale bir û pişta xwe da wan
Wî sofiyê rî pan .
Man her sê li wê ; tevlî kerê reş
Bê xwarin û bê nan .
Kalo keniya gote kurê xwe :
Çawa ye tu îşev ?
Êşa min giran e, nîne derman ,
Dijwar li ser hev .
Qurban tu ne tirse ji te re şêx
Wê çêkî nivişté .
Destên me li dawa wî ye en tev,
Dê biçne bihuştê .
Îşev di xewê şêx ji te re dê
Dermanekî bênî .
Qutb e, hinera wî mezin e pir ;
Raze tu dibênî .
Ew şev bi ken û şahî û hêvî
Bûrî û li wan çû .
Ta leşkerê ronahî bi derket,
Dinya hemî zer bû .

Pîrê keniya deyn li nexweş kir :
Çawa ye kurê min ?
Jan e, kezeba min girtiye dayê ,
Pir jar e dilê min .
Ka şêx te ne dî,bo te çi anî,
Xewna xwe bibêje .
Êşa me wekî her şev e,pêtir
Dijwar û dirêj e .
Reşbeleke zû sibehê sofî
Da destê kur û bav .
Go şêx gotiye her ev ê derman
Vê deyne di nav av .
Ava wê li laşê nexweşê xwe,
Her şev birşênin .
Şêx dijminê derdê me ye her dem
Hana xwe werênin .
Vî nanî, cehî bo xwe bibin mal
Derman û teberik .
Îdî nexweşî na kevî nav we
Carek ko here zik .
Salê qe nebî tiştekî bo şêx
Çawa bî, tu bênî .
Her pêlekê carek ko tu bê vir,
Şêxê xwe bibênî .
Kalo giriya ji ser heta pê ,
Wek çûqliyê daran .
Destê me li dawa wî ye ,qurban!
Bo derdê me Luqman .
Sofî keniya bi paş de da rê,
Wî kuç li xwe bada .
Xurşîdê nexweş çavê xwe dan hev
Naçare wî can da .
Qêrîn û girî nal û hewar e .
Hawîr civiyan kes .
Kur çû û beran çû bi tenê man
Şêx sax bî, bes e bes !

CEGERXWÎN (Sewra Azadî )

Ey weten meftûn y tom u şewetim bîr kewtewe
Wext y bendyî u esaret pê be tewq u kotewe ,
Min le zikr u fikr y to xafil ne bûm wa tenegeyt,
Hepsî u tê heldan u zîlet toy le bîr birdotewe .
Bew xuwaye y bê şerîk u tak u tanya u bêkes e,
Eşq y to corê le dilma agiry kirdotewe ,
Agirek y wa hezar sal awy birjênîte ser ,
Qet gir u kilpe u bilese y ta ebed nekujetewe.
Bas y mehzûnî u kesasî y xot me ke tuxwa weten.
Çunke bew base birîn u zamekem ekûlêtewe ,
Şert e şert y piyawetî bê ger xuwa destim bida ,
Duşminit petkem weku seg bîxeme jêr pêtewe .

B Ê K E S (Bi zarî sorî)

.............

Ordû,ordû şkandin
Hezar çenber qetandin
Mîna birûsk û ewran
Li her cî,li her deran
Diçirise..dide deng
Mîna dawet diçe ceng
Sînoran diçir r rîne
Ordiyan didir r rîne
Gava jê re bû meraq ,
Bê perwa dajo Iraq..
Dide ser dilê ...
Diçe bakûrê Kurdan..
Dibe tîr, dibe Kevan;
Xwe dirêj dike [redacted]
Dilê wan bi tirs û êş;
Bi qalûna xwe digrin ,
Dikevin taya mirin .

BE DERBEDERÎ

Be derbederî,yan le malî xom
Le xakî ereb le Êran û Rom

Kok û poşte bim,rût û recal bim
Koşkim de qat bêt,wêranemal bim.

Danîşim li ser textî xunkarî
Ya le kolanan bikem hejarî .

Azad ûm serbest, şadan û xendan,
Ya zencîr le mil le sûcî zindan

.................................

Be kurdî ejîm,be kurdî emrim ,
Be kurdî edem wezamî qebr im .

Be kurdî dîsan zindû ebimewe ,
Lew dinyaş bo kurd têheleçimewe .

H E J A R(Bi zarê sorî)

Ey biraderê Ecem !
Ixwan : Ereb-el-eşem !
Ey demokrat Turk qardaş !
Birader...Ixwan...Yoldaş ...
Em , heval û cîran in ;
Dujmin : Amerîkan in ...
Ingilîz in , In..gi..lîz ,
Zinhar , jê re , me bin lîz !

Q E D R Î C A N
( Ş e r ê Azadî )

Şerê Azadî

...............

Xwînxwarên axir zeman
Sêwelekên Truman ,
Seîd , Qasim û Basî
Tev li zaninê asî ,
Guh nedan
Tarîx, dîrok û destan ,
Guhartinên van salan ,
Şiyarî û yekîtî ,
Jêhatî
Bûna Kurdan .
Nûrî Seîdê pîlanger
Bi mîsaq î bi peyman,
Bi kirîna nokeran,
Bi nermî, gah bi sûtan ,
Bi kuştin û bi zîndan
Bi hîle û bi hiner ,
Çil sal timam, ser bi ser
Dilxweş kirin îngîlîz,
Nefta me ya wek dengîz ,
Ji bi bire bi qamçî .
Dan van kesên bê sincî ,
Em bi xwe xistin bin dest ,
Reben
Pêxwas
Û birçî .

Ç Î R O K N I V Î S

Bi Dil Her Kes Gunehkar e.

Ji tîrê her du ebrûyan me dil her qîr û eman e ,
Ji ber wan tîpê zilfên reş dilê min tev kul û jan e .

Bi topên jermenê çava me dil her dem birîndar e .
Bi dîlî , ma di bendê de bi rengê Sirp û Yewman e .

Tu zanî dil birîndar e ji tangê zilfê reş tarî ,
Ji wan lêvên şekerbarîn dizanî maçe derman e .

Tu guh med gotinên dînan were da maseyê deynin .
Ji her rengî meyê fir kin, dirist kir pîrê meyxane .

Bihayê yek qedeh ava lebê le'la bidim carek ,
Bihuşt û agir û ezman , li cem dil çi erzan e.

Eger wek min evîndar î, kerem ke qehweya Kerbîs
Di locê de me na bînin ne Agop û ne Dikran e .

Evîndaran guneh nîne, wisa fermen kirî Zerdeşt ,
Bi dil her kes gunehkar e , bi dev her kes misilman e .

Di bajarê evînê bes Cegerxwîn şah û xunkar e ,
Evîndara bi dest ala li ser taca me hildane .

C E G E R X W Î N ( Dîwan - 1 )

Ji Biçûkan Re

Şêr û piling tev de çûn ,
Vî jê xwar û wî jê xwar ,
Yekî ji ê dî re got ,
Go em herin cem rovî ,
Ewê me li hev du bênî ,

Rastî serîk penîr bûn .
Her diwa li hev dane dar.
Her dû rabûn bûne cot .
Seydayê wehş û kovî .
Çavê mêrik derênî .

Her dû çûne cem rovî , Bûne derwêş û sofî .
Doza xwe jê re gotin , Dil û cergê wê sotin .
Rovî go de rabin zû , Ji mi'r bînin terazû .
Wan terazû anî ber , Rovî penîr danî ser .
Alîk pir û yek hindik , Yek ma giran yek sivik .
Lekmek ji ya giran bir , Ew ji a dî bû siviktir .
Geh ev xwar û geh ew xwar, Heta ko ma bon û dar .

CEGERXWÎN (Dîwan - 1)

## MEMO

Memo, şêwî bû...li ber dîwara ,
Bavê kalê wî ,
Di şerê Ûris de, bi tivink
Deng li topê kir..
sed mêr bela kir ,
di ber Osmanî
ew hate kuştin .
Kalê wî jî mêrxasek çê bû ,
Di şerê Yewnan,
li "Dumlupinar"
bi çar birîna
serê xwe danî nava axa sar .
Li "Dara Hênê",peyayên Kemal
Bav daleqandin .
Birakî wî di zikê dê de ,
tevî diya wî hat singû kirin .
Memo bê xwey , bê xwedan ,
Mezin bû hat hewlê...
Bê xwendin , bê jîndin ,
Bû nozde salî ,
Hukûmeta Turk wî şand Qorayê ,
xweyna wî firot,
bi duwanzde dolar ...
Memo GUHDERZ

## Şûrê ELO

Rojkê yekî qereçî Şûrê xwe yê kalankot
Anî bû gundê Elo Bazar dikir , difirot.
Elo jî wek gundiyan Şûr hilda lê mêze kir.
Derza di piştê ... ne dît , Bihayê wî zêde kir .
Dawî kerê reşê qut , Wî anî guhart bi şûr .
Bi dilgeşî dibir mal , Bi dar da kir bi rex tûr ,
Rewşa Elo di nav gund , Cewêlek û belengaz ;
Piştî ko bû xwedî şûr Pê dimeşî pir aflaz .
Vê yekê pir dom nek:kir , Cejna Newroz kete ber ;
Bi şûr û mertal lîstin , Elo şûrê xwe da der .
Dawşand mertala yekî ; Gelekî xurt dest bi dest ,
Cîngînek ecêb jê hat , Şûr di nîvî re şikest .
Gelek bi kul û keser , Wî nîvê şûr hilanî ;
Serdiber pê hate mal , Li ber argûn datanî .
Nîvê mayî di qewas ; Vegerand xiste kalan .
Avêt binê kulînê , Welê mabû du salan .
Carcar tanî bîra xwe , Dema bûbû xwedî şûr ;
Wî her la'net dixwendin ; Li çavên şeytanê kûr .

Rojkê li gundê rex wan ,
Jê re hatin vexwendin ;
Sibê piştî rohilat ,
Elo gordê xwe hilda
Yekî gotê :" ho Elo,
Te hilmiştin zend û bend ,
Kalan carna ditewe ,
Ji bo mirov ne bîne ;
Tu were guh bide min ;
Holê me çe dawetan
Elo kîma xwe nanî ,
Wekî jinan destvala ,
Digot :" Bira tu zanî ,
Şikestî bû di cejna
Lê na xwazim bê gotin ,
Wî ne şûr û ne mertal ,
Bi kêr na yê dizanim ,
Lê divê tu bawer bî ,
Min navê pê biçim şer
Dê hin caran bikarim
Goşt û birincê bixwum
Em xelkên yek gundî ne
Divê çûna dawetan
Dawî gundî dibûn yek
Hinekî nefstenik e ,
Bila here dawetan
Kesek birçî na mîne ,
Ji wê rojê bi şûn de ,
Ji bo doza zikê xwe ,
Nema karî wek berê
Aflaz aflaz bimeşe
Li ber kesên zimantûj

Him dawet û him sinet ;
Herçî kesên bi rûmet
Kar bû refê xwendiyan ,
Çû ket nava gundiyan ,
Bi vê gordê qurmiçî ,
Kil dibî ku de diçî ?
Xuyaye te nîne şûr ,
Jê re divê yekî kûr ,
Vî gordê pîs bavêje
Da kes qerfan na bêje."
Bê şûr biçe dawetê ;
Dûrî warê rûmetê .
Min şûr nîne di kalan ,
Berî vê bi salan .
Elo maye dsetvala ;
Di nav koma hevala ,
Bi vî gordî na be şer ,
Pê dixapîn gelek ker ,
Tol û dozan hilînim
Pê kerim nav xwendiyan ,
Têkevim nav şadiyan ,
Pejqan li min me xînin ,
Ji bo min pir me bînin."
Gotin :"Elo zîvar e ,
Bi kirê xwe ni kare ,
Bi vî gordê şikestî ,
Dê bighênê çend hestî ."
Her ew diçûn dawetan ,
Ketî bû bin minetan .
Di kalanan di nav gund ,
Bipeyive serdiber ;
Xwe datanîn wekî ker .

---

Eger em baş binêrin
Gelek Elo tê dîtin ;
Şûrê wan ê piştbiderz
Ji qada şer derketin
Bi navê gel daxivin
Xwe na din cihê bi tirs ,
Di çav wan de ku xebat ,
Ji bo bêne ûzerê
Veşartine gordê xwe
Bûne nokerên xelkê ,
Gava hinek têkoşer
Ji bo daxwazên Kurdan
Xwedî gordên şkestî
Dixwazin welatî bin ,
Gava xebat tê ber wan ,
Ji bo daxwazên neyar , ,
Bi xêrxwazên welat de ,
Rojê li ber derîkî
Her gavê ez dibhîsim ,
Xwedê bibit alîkar ,
Xortên hêja tê rabin ,
Heya êdî ne xapin

Îro di qada welat
Bûne nandozê xebat ,
Bi yek derban şikiyan ,
Li ber dujmin reviyan ,
Di quncikan sergiran ,
Wek qeşmerê pehlewan
Tenê bikin diredirr ...
Sermayê wan xap û vir ,
Di kalanên zîv û zêr ,
Doza wan bes bixwin têr,
Di reya gel biwestin ;
Li pêş neyar rawestin ,
Pê de dikin rewerew
Bi gotinên bê kirin ,
Zû dibizdin , dimirin
An çîçkekî destkewtin ,
Digurmijin , diewtin .
Dê biçêrin , bixwin nan ,
Dengê hûrpehûrpê wan ,
Bo vî gelê sitemkar ,
Brayên xwe bikin hişyar ,
Ew bi losên virkeran ,

Reya xebatê bigrin | Ji bizdok û qeçmeran ,
Qada welêt bimîne | Di destên xortên gelêr ,
Bo hildana vî barî , | Jê re divêtin camêr .

Osman SEBRÎ(Swêda ,15.12.1967)

Gelek şaîrên me yên hêja hene ko helbestên zor hêja nivîsandine . Lê evîna welêt dil û kezebên wan bi awakî wisa çewiltandiye ko pêtên vî agirî di nav rêzên helbestên wan de bilind dibin , der û dorê xwe dihelînin . Me wan ni karibû têxin nav vê nivîsarê , heye ko ewan rûpelên wê bikizirandina û xwendayên xwe jî ber bi gîrtîgehê ve biçandiya.

Li milê din , gelek nivîsar û zana yên kurd û yên zmanê kurdî hene. Lêbelê divê ji bo wan kitêb(nivîsar)ek din bête nivîsandin .Di nav çend mehan de ewê ev nivîsar dê bikeve çapê .

3 – STRANÊN NIJADÊ ME

Edlê

Edlê rabe sibe ye ,
Dengê dîkan qebe ye ,
Çax , çaxê min û te ye .
Çaxê nimêja te ye .
Hey lê..gidiyê Edlayê...
Bê sozê , Sozwindayê...
Malê dinyê hindik e ,
Qeleha gewra min na yê..
Sibe bû , dîkan ban kir ,
Cotkariyan nîr li pî kir ,
Rêka çkeftê b'nîvî kir ,
Sînga gewre spî kir .
Hey lê.. gidiyê ,Edlayê
Min sozek bi te re daye ,
Ez t'car na dim terkayê ,
Heta bi axa merzela ,
Heta bi kêlê kevirê ,
Bi çîngîna bêrê hesinî .
Mala Edlê li neqebê ,
Lê hat bakî xezebê ;
Kul li Edlê giran bû ,
Da ser derdê kezebê .
Mala Edlê li jor e ,
Dergusê lore lor e ,
Hêvî ma rebê jor e ,
Ez ê b'çeplê te bigrim
Bavêm welatê jor e .
Dê Edlê ...Rabe , rabe ,
Dilketî çare na be .
Kes li malê tu ne ye ,
Kêf , kêfa min û te ye .

Gulê

Ha gulê , gulê , gulê ...
Kevoka Qiti-bilê ,
Firyam , ketme paçilê ;
Çi paçilek b'xweydan e ,
Cotik memik tê dane ,

Qumrî

Qumrîkê ez gune me ,
Şivanê bavê te me ;
Aşiqê bejna te me ,
Evdalê çavê te me ,
Ez goriya serê te me ,
De yar , yar yar
De yar , yar yar .
Bê te xewka min na yê.
Qumrîkê ser bi zêr e ,
Sing dergehê bajêr e ,
Qumrîkê na dim mêr e .
De yar , yar yar .
De yar, yar yar ,
Bê te xewka min na yê .
Qumrîkê b'zêr helandî ,
Keçik' lawik revandî ,
Serê' l' bavê gerandî ,
De yar , yar yar ,
De yar , yar yar ,
Bê te sebra min na yê.
Qumrîkê ez gune me ,
Delalê ez gune me ,
Esmerê ez gune me ,
Ez şivanê bavê te me ,
Aşiqê bejna te me .
Evdalê çavê te me ,
Ez goriya serê te me .
De yar , yar yar ,
De yar , yar yar ,
Bê te xewka min na yê .

Girê Sîra

Girê sîra , bi sîr e ;
Lê lê , lê lê Meyro...
Gir xopanê , bi sîr e ,
Tolikvanê Meyro ...
Van siwara b'hîre b'hîr e ,
Xwestiyê Meyro wezîr e .

-1-Gord :Şûrê çkestî, bi kêr na yê , na kuje .

Serê menika hilda ne ,
Memik para xorta ne .

Girê sîra bi ce ye ;
Gir xopanê bi ce ye .
Van siwara b'heye hey e ,
Xwestiyê Meyro file ye .

---

Şerê Xalita

Delana, xweş Delana !
Pêçiya malê me şer e, paşiya malê me ferman a!
Şerê feqîrê Êzidiya, sofiyê Misilmana
Xweştir e ji şerê nêrî û berana !

Delana Başo, wa bi şitil !
Çend peyayê Mala Zoro li serê girê Qereçêrî (bûne gutil ,
Derbekê dane Hesarê cibo û Bimbaê Mîro , (Miço ê mala Şêx Îsa .
Ji mala bavê mi qelandin tovê bîst û pênc (mêrên rembiqetil .
Delana Başo li berê bendê !
Mertala destê Hesarê cibo giran e ,kete zendê.
Şerê feqîrê Êzidiya û sofiyê Misilmana
Xweştir e ji reqs û govendê !

Lê darê ! Delana !
Pêşiya malê me şer e, talî ferman a !
Pêşiya eşîrê Êzidxan çûye tila Botana .

Delana Başo bi qirkor e !
Hespê Bişarê Zoro di meydanê de bore bor e.
Derbekê dane li Hêsarê cibo,Bumbaê Mîro ,
Ji mala bavê min qelandin tovê bîst û pênc (şêxê serbipor e !

---

Koçerê

Kesera mêrê berê ,
Koçerê cer li mil kir,
Qesda kanîka gir kir .
Cer qul bû, taqî şil bûr
Dilê lawik bikul kir .
Koçer ji malê Mîra ,
Reş'kandin bendê şêra.
Ez te na dim b'tu eşîra ;
Koçer ji malê Bota .
Raş'kandin bendê cota .
De lê û lê,koçerê ,
Pozqulê, xizêm zerê ;
Kesera mêrê berê !

---

M E L K O

Melko xwestî dîwanê .
Sê fîncan qehwe danê.
Paşê, celad berdanê .
Melko go:"Ez Melko me!"
Şêro go :"Ez Melko me ,
Xweyê şwîrê bi co me ,
Kilê çavê Silto me !"

---

4— METHELOKÊN KURDÎ

Heta mirinê çav li kirinê . Yan mêrê baş be,yan bivir û das be,yan bimir ji xwe xelas be . Ji te hereket, ji Xwedê bereket . Yê ko dest dike dê û bav na ke . Dest hilanîn fereca xêrê ye . Bi xweziya dest nagihê baqa keziya . Fêda gavana siwarbûna kera ye . Ko te girt bermede, eger te berda, pey ne keve . Serê du beranan du beroşek de na ye kelandin. Mî bizin bi dizî gon dixwin, eşkere dizîn . Mirî ne melûn be,gor lê teng nabe .Kesî cera çêke,kare çembila pê ve bike . Yê tazî bû di kewarê de digot jina xwe :"Zirav birêse !" Pîrê bawer ne kir mêr bike,gava mêr kir dawe mehr û heştikan kir . Mirîşkê çav li betê kir, qûna we çirand . Didu bi hev re rast bin,ê sisiyan Xwedê ye. Qûbê spî giş ne ziyaret in. Me bêje Ereban :"Merheba!" wê rûne ser kurkê eba . Merşekî yekî ber awê çû , got :"Bila xêra dê û bavê min be." Weke malxweyê malê Silo be, wê xwarina kiflet sor çilo be . Gur bi du pariya na mire .Pîrê got :" Keça min me çe nav kurkan ! " Got:"Ya dê, ewa tu dibêjî qediya ye ." Piştbaranê ga cil dike . Yekî jina xwe berda bû,digotê:"Were bibe yara min." Heta hevraz ne keve ber te, qedrê berjêrî ni zanî . Gotin kerê : "Were em te bibin cenetê." Got:"Ma givzonik li wê derê heye ? " Gur daye hevrazê , ji birçîna ni kare bimeşe , dibêjin ;"Mîrato ! pir xwariye, ni kare bimeşe !" Dermanê xwestinê dan e. Malxweyê me Om e , xwelî li serê me kom e.Filan gund deh mal in, duwanzde rîspî ne . Şûr kalanê xwe na bire . Şahidê rovî dûvê rovî ye . Diza ji diza dizî, erd û esman lê derizî .Rovîkî berdayî ji şêrekî girêdayî çêtir e . Dinê li dinê , çavê gur li bizinê . Rih dibe bihost,dijmin na be dost . Şêr şêr e , çi jin e, çi mêr e ? Hezar dost kêm in,dijminek pir e .

Bira rê be, bira dûr be;bira buhûr be,bira kûr be;bira keç be,bira pîr be; bira avis be, bira derengî be . Ji şîr tirsiya pifkir dew .Giya li bin kevira na mire.Dêlik li baye, se ji Bexda ye.Hinek dixeniqin,hinek dixeriqin.Her tişt bi ziravî dişkehe, mirov bi sitûrî .Solker pêxwas in,cûmker bê kiras in.Zikê têr hay zikê birçî tune ye.Destê ne ê gez kirin,divê mirov ramîse. Şêrê pîs du cara şer dixwaze.Zikê bixwe sawarê,divê here hawarê.Mar ji pûngê nexweş bû,derê wî de heşîn bû.Bi gur re goşt dixwe, bi xwedî re şînê dikişîne.Rihet dibe dewsa xencera, sax na be dewsa xebera. Ferxên yeksalê radibin, hêkên hesinî dikin.Birîndar ,birîna xwe dizane . Ez hêdî diçim bela digihe min,ko zû diçim,ez digîjim belayê.Kalo ji bêkesî,pîrê ji bênefsî, her duwa li hev pirsî.Şêrekê birîndar di ber kîso ve diçû.Kîso go:"Ev rêya me teva ye."Şêr got:"Ez na mirim bi vê derbê,ezê bimirim bi vê kerbê ! " Çiqas mirov dimelise,her wê biqewize.Dilê tirsok sînga gewr na bîne.Serê birî,na yê kirî.Fira mirîşkê kadîn e.Dîzkê got: "Binê min zêrîn e."Heskê go:"Ma ez ji kur im ?"Hesp dibeze ,siwar pesna xwe dide .Mêra mêr dikuştin,Cibo ûr dişuştin.Agir girti bû mala yekî, yekî ser û pê li ber dikizirandin.Yek heye bi sed î, sed heye ne bi yek î. Sitûrî ji gayê cot re ne ma .Gavan ber bi mal e, jina gavan şixulkar e . Pezê ji keriyê xwe biqete, para guran e.Mêr ketiye kewarê, jin beziye hewarê .Dinya gullek e, bihnke , bide hevalê xwe.Rûnişt pêşê rakir riha. Kurmê darê ne ji darê be;zewalê darê nîne.Ji xelkê re kewgir e,ji xwe re kusîgir e.Eqil tacek zêrîn e,serê her kesî nîne. (D a w î H e y e)

---

## Çarînên X E Y A M

Veşartiyên pêşiyê ne tu dizanî û ne ez
Ev tîpa kewsele ne tu dixwînî,û ne ez
Gotina min û te di paş perdeyê de ne
Ko perde ket ne tu dimînî û ne ez .

Nivîna axê de raketiyan dibînin
Di bin erdê de veşartiyan dibînim
Çendan li deşta neyînê mêze dikim
Nehatiyan û çûyiyan dibînim .

Dinê ji jîna me a perîtî awirek e
Ceyhûn ji hêstirên me ên xwîn avek e
Dojeh ji cefayên me ên bêtişe çirîskek e
Bihuşt ji dema dilxweşiya me bihnek e .

Ewên ko dorhatiyên zanînê bûn
Û bi berhevkirina zanînê xetîrekên civatan
(bûn,
Me xwe aveti bû ber siha şehneşînê.

Ji wê şeva tarî rê derneêxistin
Çêrokek gotin û ketin xewê .

Bê vîna min ez anîme heyîmê
Jînê ji heyraniya min pê ve tiştek zeyde
(ne kir

Bi zorê çûn û me seh ne kir çi bû
Ji vê hatin û mayîn û çûyin miraz

Piyana tejî a rengê xwe girtî
Şkênandina wê serxweşek çawe babet dibîne
Hevqas ser û ran û kef û destên delal
Bi hevîna kê gihane hev bi erna kê şkestin.

Vexwarina şerabê û şabûnî ayîna min e
Destkişandina ji kufr û dîn,dînê min e

## DELALIYA DELALAN

Stêra biserhatiyên min,delaliya delalan!
Tu bihara ber dilê min î ;
Bextiyarî û xweşiya min ji te ye ;
Ji te ye siûd û serbilindahiya min.
Şîrîniya ramûsan,destpaşil û dilxweşiya
Ji bo te ye ! (min
Tên bîra te ew rojên bextiyariyê ;
Ronikahiya mala me û xweşî û
Hênikahiya ber êvarê ?
Stêra biserhatiyên min,delaliya delalan!

--§§--&&&&--§§

Ber êvarî, wadê tirêjên roavayî ,
Sor û zer dibin ! !
Mîna şewk û pêtiya tifikên
(dîwanxanan
Û xavikeke zeresor ,
Xwe ber rûyê dinyayê da bû ,
Di wê demê de sîng û berê te ,
Xena dilê min direvandin ..
Û dilê te ê xurt û nerm ,
Çiqas nîzikî min dibû û ez dihewandim,
Me ji dilketina xwe re distirand ,
Û dinehwirand .
Ber êvarî wadê tirêjên roavayî
(dibin sor û zer.

--&&&&&&&&----

Di êvarên germ de roj çiqas delal e ;
Dinya dibe fireh û pehin ,
Dil dibe xurt û bi rewa

Min ji bûka dinê re got qelenê te çi ye,
Go :dilê te ê şa qelenê min e .

Di çerxa dinêya bê binî de
Bi dilxweşî vexwe şerabê dem bi cewr e,
Ko nob giha te ax me ke
Ev piyanek e ko hemiyan re didin firkirin
bi dor .

Ji hatin û çûna me kar çi ye
Berê hêviya jîna me li kû ye
Di çerxa canî de çend mirovên pak
Şewitîn û ax bûn ma dû li kû ye ?

Gayek ezmanî de ye navê wî Perwîn
Yekî din di bin erdê de xwey nivîn
Wek kûrbînan çavê hişyariyê veke
Jêr û joran du gayan garanê keran bibîn.

Heyf strana ciwanî çikihaye
Ev bihara şahiyê êdî ne maye
Ew çûka cejna ko navê wî ciwanî bû
Hawar çawa hat û kengê firiyaye ?

Şerabê bide destê min dilê min tihn e,
Ev jîna bêbext direve wek bihn e
Rabe şahiya dil xewna şevan e
Rabe agirê ciwaniyê av e yek bihn e .

Gulrûyê piyan û şerbikê şerabêbigire
Pê lêva avê û mêrg û çîmenan bigere
Ev feleka bêbext zehf rûheyvan
Dike sed car şerbik û sed car piyan .

Em gî dilketî ne û şerabperest in
Di kavilî de rûniştime,serxweş û mest in,
Ji spehîtî û kirêtiyê wehm û xiyalan
(dest kişand;
Ji me hiş me xwaz,em gî şerab bi dest in.

Ev dinê ko çend roj bû pêgehê me
Ji xemê pê ve hîç ne bû destgehê me
Wey li me pirseke me jî hel ne bû
Çûn û hezar berî man di cergê me .

Eya ko bijartiya cihanî ji min re,
Delaltir î ji can û çavan ji min re,
Rûrojê ji canî şêrîntir hîç nîne
Tu sed car ji canî şêrîntir î ji min
re .

Dinê de berê dara rastiya kûr ne
giha
Lew di wê rê de henî ne rênezan
Her kesî destê xwe bi çiqlekî sist
girtiye,
Îro wek sibe sibe wek roja pêşin e
bizan

Min xwe li ser te de xwar dikir
(delaliya delalan
Û min bihna ciwanî û rindbûna
(te bihn dikir;
Navkerên destên min bû bûn
Di êvarên germ de roj çiqas delal e.
——&&&&&&——&&&&——

Şev dibû tarî,li ber me dibû bedem.
Û di reşika şevê de min reşahiya
(çavê te didît,
Û min bihna keçînî û çelengiya te
(bihn dikir ;
Navkefên destên min bû bûn dergûşa
(piyên te ;
Şev dibû tarî û li ber me dibû beden
——&&&&——&&&——&&&——
Wan dem û rojên bihurî ez tînim bîra
xwe
Demên ko min serê xwe da bû ser çoka
Û bi nêrîna çavê te ( te;
Dinya li min dibû bihar ,
Heşîn dibûn gul û dar .
Tu î şahî û şabûnî ,
Tu î xemrevîn û dilxweşî ;
Wan dem û rojên bihurî ez tînim bîra
——&&&&——&&—— xwe .
Me li ser dilketina xwe sond dixwar
Em sondayê hev bûn ...
O ! ew ramûsanên ji dil û can ! !
O ! ew nalînên kûr û dûr ...
——&&&——&&&——&&&——————
Gelo dilketina me a borî ,
Vedigere ciwaniya xwe a berê ?
Mîna roja ko diçe ber ava
Û li rohelatî hiltê
O ! Ew ramûsanên ji dil û can...
O ! Ew nalînên kûr û dûr .

Charles BAUDLAIRE
(Le Balcon )

STRANA MIRINÊ

Piyana jiyîna min hêj tejî û dagirtî şkiya
Emr û hestiyên min pê keserên giran heliya.
Hêstir û girîn, ax û zarîn ,
Ji derdê mirinê re ne tu derman in.
Siha mirinê bi ser serê min de tê ;
Saeta min a dawîn lêdide ;
Mirinê nêzikî li min kiriye ;
Xuya ye, ezê bibim mêvanê ax û qebrê,
Ma ez çi bikim ?
Tiştek li destê min ne maye...
An girîn , an stran û dilxweşî .
Ezê bistirêm !..
Mirin min dixapîne û dilorîne ;

Rûroj rabe û were ji bo xatirê me
Hel ke mişkilekî wek daxwaza dilê me
Şerbikeke şerabê bîne de em vexwin
Ji pêş dema ko şerbikan çêbikin ji axa me.

Wey ji wî dilî re ko tê de agir nîne
Ji bo delaleke rûroj ne dil ketî û dîn e,
Roja ko bêşerab te ji xwe borandî
Ev e rûja jînê a windatir bê jîn e .

Meyger kesera min bilidavaz bû
Serxweşiya min bêbend û bêgaz bû
Bi porên spî serxweş im ji şeraba te
Bihara dilê min ciwan û saz bû .

Tîra ecel re na heye siper
Hîç e lûleperiya zîv û zêr
Çenden li dinê re mêze dikim
Qencî qenc e hew mayî bêkêr .

Jînê de pesna şerabê lêvzîna min e
Xeynê şerabê tu tişt ne dilxwaza min e
Mela ko seydayê te hişexweş be
Seydayê te bizan feqehê min e .

Madam çûyîn bê guman e na bûn ji bo çi
Xaçerêya timayê de westabûn ji bo çi
Herwekî mayîn tune ne bû û na be
Bîkirina çûyînê û dilxweşbûn ji bo çi?

Avahiya meyxanê ji şerabvexwarina me ye
Xwîna du hezar toban li ser stoyê me ye
Ko min guneh ne kir rehmet ji bo çi
Rewşa rehmetê ji gunehkariya me ye .

Ez şerabê vedixwim ji çep û rast qîr û qal e,
Dibêjin ew dijminê dîn e me xwe betal e
Ko min seh kir şerab dijminê dîn e
Bi Xwedê ezê vexwim xwîna dijmin helal e .

Spêde ye rabe ho gewherê naz
Nerm nerm şerabê vexwe bi nay û saz
Ên di xewê de veşartî ne zanin
Ji ên borî kes venagere çûn bê awaz .

Duh ber meyxaneyê re derbaz bûm bê hiş û mest)
Û min pîrek serxweş dît misîn bi dest
Min ji pîr re got ma tu ji Xwedê şerm na kî
Go kerem ji Xwedê ye de here şerabê vexwe lo!

Piyana te de yaqûta rohn heye ho meyger!
Dilê min wek yaqûtê geş ke ho meyger !
Piyala tejî bide destê min ho meyger !
Da bi wê canê xwe vejînim ho meyger !

K.A.Bedir-Xan çarîne Xeyam,Seydayê Gerok jî her
du helbestên din wergerandine Kurmancî .

Ez bûm , cîranê mirinê ;
Dengê wê ê zîz û giran tê ;
Û dikeve guhê min ,
Gava saz dişkê ;
Teqîn jê tê ;
Mîna teqîna tifingekê .
Çira berî mirin û vemirandinê,
Bi çewk û lehba xurt dibiriqe,
Roj berî roavayî
Hin mezintir û pehintir dibe.
Bi tenê , em;însanê qels û reben
Li ber mirinê ,
Hîn feqîr û belengaztir dibin
Rojên xwe ên borî tînin bîra xwe,
Û wan dihejmêrin ;
Ax û ofa dikin û didin girî...
.................
Ji bona min
Ko tucara rehê xwe bera erdê ne da,
Çûyîn , bê girîn û zehmet e ;
Ezê herim...
Mîna pelekî sivik
Ko ba ji darê diweşîne...
Ezê herim bê ax û zarîn ;
Bê şîn û girîn .
Girîn û hêstir ji bo çi ?
Ezê herim !
Mîna ba û bablîsokê ,
Mîna av û ronahiyê...
Xwedê dilê min
Li ser sindiyana jiyînê danî ,
Û bi girane û zompên qehr û xweşiyê
Lê da .
Qedr û qîmeta saxiya min çi ye?
Dilê min ji dinyayê sar bûye ;
Lê ez qedrê jiyîna xwe hêj digirim
Heta ko bikarim
Li ser rêka hêja bimirim ;
Xwe bidim kuştin .
Şema tarî bi ser min de tê .
Ez mêvanê gor û turba me ;
Lê ezê bistirêm !..
Ko hêj dest û tiliyên min,
Ji darê tenbûra min sar ne bûne.
Ezê bistirêm !..
Berî mirinê
Ax û zarîn,şîn û girîn
Ji bona çi ?
Ezê bistirêm !
Ko hêj dest û tiliyên min
Ji darê tenbûra min sar ne bûne.
Ezê bistirêm !
Strana azahî û serbestiya welatê xwe
Û dengê stran û tenbûra min ,
Li çiya û zinara,li deşt û zozana,
Wê deng bide

LAMARTINE
(Le poète Mourant)